عشق را دیوانه شدن از غایت دوستی معنا کرده‌اند و بر مبنای سخن آنان عاشق کسی است که عقل خود را به دلیل افراط در محبت از دست داده باشد. به همین دلیل عاشق مجنون است، زیرا محبت در او چنان شعله کشیده که همه چیز را سوزانده و اکنون از او چیزی باقی نمانده جز معشوق و یاد او. تشبیه عشق به آتش و برشمردن صفت سوزاندگی برای او به همین دلیل است.³¹ با این تعریف، فردی که به مقام عاشقی حق نایل می‌شود، محبت خداوند یا یکی از مخلوقات، چنان او را فرامی‌گیرد که هر چیزی غیر از حق را در درون او می‌سوزاند و از میان می‌برد و او را برای معشوق یکتا می‌کند. او در این مقام، هیچ چیز جز خواست محبوب و معشوق را نمی‌بیند و جز معشوق بر غیر نظر ندارد، هر چه می‌کند برای او و در راه قرب و نزدیکی به اوست. چنین شخصی به دلیل از دست دادن عقل، منافع خود را نمی‌شناسد و تمام منفعت‌ها را در رضایت معشوق خلاصه می‌کند. طبیعی است که پایان چنین راهی، نیست شدن باشد.³²

در این وضعیت، عاشق گونه‌ای از توحید را تجربه می‌کند که با توحید عبادی از جهاتی متفاوت است. در توضیح باید گفت که هم غایت عبودیت توحید است و هم غایت عاشقی، اما جنس توحید در این دو با یکدیگر متفاوت است. در توحید عاشقانه، وجود عاشق از معشوق پرمی‌شود و بی آنکه اختیاری در کار باشد، تنها و تنها معشوق را می‌بیند و در اعمال و اوراد و اذکار خود تنها او را می‌جوید.³³ اما در توحید عابدانه، سالک با تکیه بر اختیار خود، در عبودیت خداوند مطلق می‌شود، زیرا همه شئون خود را در ملک او قرار می‌دهد و چون خداوند مالک مطلق بندگان است و مالکیت او مشوب با مالکیت غیر نیست، بندگی او نیز مطلق و بدون قید و شرط است و بنده جز عبودیت او از خود چیزی ندارد، لذا تنها باید او را پرستید: «ایاک نعبد و ایاک نستعین».³⁴ در اینجا تنها به آوردن نمونه‌هایی از شعر جزری بسنده می‌کنیم و در جایی دیگر تفصیلاً بدان خواهیم پرداخت.

جزری مانند پیشینیان خود عشق را سوزاننده می‌خواند.³⁵ عشق، آتشی است که او را کاملاً سوزانده و به خاکستر تبدیل کرده است.³⁶ و این خاکستر شدن بیانی دیگر از فناى عرفا و توحید عاشقانه است. همین سوختن، ویژگی دیگر عشق عرفانی را به ما نشان می‌دهد و آن پالایش روحی عاشق است. در حقیقت، در عشق عرفانی، سالک با زهد و ریاضت به پاکى درون نمیرسد، بلکه عشق چون صاعقه بر او فرود می‌آید و با سوختن، او را از غیر معشوق پاکیزه می‌کند. این اثر را «تعالی بخشی عشق» می‌نامیم، که یکی از ویژگی‌های عشق است که عرفا بدان بسیار علاقه‌مندند. عشق در وجود انسان مانند آتش، ناپاکی‌ها را از میان می‌برد و عاشق را تزکیه می‌کند. جزری متوجه این ویژگی عظیم عشق است و خدا را بدین جهت که او را با غم

العشق نار فی الصدر یحرق القلب (مقالات الکاملین، حاشیه اشعة اللمعات: ۲۳۱)؛ مولانا نیز می‌گوید: عشق آن شعله است که چون بر فروخت/ هر چه جز معشوق باقی جمله سوخت (مولوی: دفتر پنجم، در بیان آنکه ثواب عمل عاشق از حق است)

و به قول عین‌القضاة «چون آفتاب روی نمود ظلمت اگر خواهد و اگر نه بگریزد» (عین‌القضاة همدانی: نامه‌ها؛ ج ۲، ص ۶۰۳). عطار نیز می‌گوید: بعد از این وادی عشق آید پدید/ غرق آتش شد کسی کانه رسید// کس در این وادی بجز آتش مباد/ وانکه آتش نیست عیش خوش مباد// عاشق آن باشد که چون آتش بود/ گرم رو سوزنده و سرکش بود// عاقبت اندیش نبود یک زمان/ در کشد خوش خوش بر آتش صد جهان// لحظه‌ای نه کافری داند نه دین/ ذره‌ای نه شک شناسد نه یقین (عطار نیشابوری: منطلق الطیر: صص ۵۸۳-۶۸۳)

چونان زلیخا که در مقام عشق یوسف از سپندان تا به عود، نام جمله چیز یوسف کرده بود (جلال‌الدین مولوی: مثنوی: دفتر ششم، حکایت امر القیس)؛

(طباطبایی: میزان فی تفسیر القرآن: ج ۱، ص ۵۲)

ب ناری فیرفته‌ی سومتهم ژ فیرقی سهر چه تاپی دا/ خه‌ده‌نگا غه‌فله‌تی نوهم ژ به‌رقا لامیعانی دا (۷۲ دیوان)

بروسکا باطنی دا دل دپیتی سینه‌وی وهر بو/ کو دی بیتن ته‌بیتا دل د ناف وی نارو پیتی دا (۹۲)



• جمع‌بندی مباحث

- 1- جزری در مقام شاعری، به عنصر عشق بیش از زهد توجه دارد.
- 2- معشوق جزری هم آسمانی است و هم زمینی، چنان‌که گاه تشخیص ماهیت معشوق در شعر او بسیار دشوار است. در این زمینه او بسیار شبیه حافظ است و در مواردی زبان او نمادین می‌شود.
- 3- سبب توجه جزری به عشق زمینی، باور او به وحدت وجود و دیدن تمام عالم به عنوان تجلی کمالات خداست. بنابراین همه زیبایی‌های جهان اصیل و شایسته عشق ورزیدن‌اند.
- 4- او عشق زمینی را در طول عشق الهی می‌داند، لذا خانقاه و خرابات، هر دو محل ظهور زیبایی خداوندند؛ از این نظر، او به هیچ وجه مانند مولانا نیست و بیش از پیش به سعدی و حافظ شباهت دارد.
- 5- عشق محصول ادراک جمال محبوب از جانب عاشق است، و چون سراسر عالم تجلی جمال خداست، ادراک هر جمالی ادراک جمال اوست، و هر عشقی پرتو عشق اوست. جزری به این عشق فراگیر باور دارد.
- 6- فراگیری عشق باعث می‌شود با لایه‌هایی از عشق و طیفی از معشوق‌ها مواجه باشیم. در شعر جزری نیز چنین است و علاوه بر خداوند و زیبارویان، پیامبر و ممدوح نیز در مقام معشوق قرار گرفته‌اند.
- 7- فراگیری عشق باعث می‌شود که شاعر عشق را ویژه اهل ایمان نداند و آن را در منزلی بالاتر از کفر و ایمان بخواند.
- 8- فراگیری عشق و توجه به عشق زمینی باعث تمایل جزری به ادبیات قلندرانه شده است و او گاه به تابوهای جامعه دینی حمله می‌کند و امور مثبت را منفی و امور منفی را مثبت تلقی می‌کند. از این نظر، به سنایی، عطار و حافظ بسیار شباهت دارد و در شعر او گرایش‌های ملامتی آشکار است. ستایش پیر خرابات، سخن از زیبایی مغیچگان باده‌فروش، مباحثات به بدنامی خود، ستیز با ریا و نی و نای را مفتی خود خواندن برآمده از این گرایش است.
- 9- جزری به سبب نزدیک شدن شعرش به ادبیات قلندری و نیز توجه به ماهیت عاطفی عشق، آن را محصول عنایت و در تعارض با علم مدرسی دانسته، و اهل علم و صاحبان فتوا را که می‌پندارند همه چیز در دفتر و کتاب است و با مجاهدت و اجتهاد می‌توانند به معرفت حقیقی دست یابند، بر خطا می‌خواند.
- 10- در شعر او عشق (به سبب بی‌اعتنایی معشوق و قرین بودن با هجران) با رنج و محنت همراه است.
- 11- رنج و محنت عشق، توجه تام و تمام عاشق به معشوق و بریدن او از غیر معشوق (حتی از خود، مال و آبروی خود)، به تزکیه اخلاقی، یعنی دور شدن از رذایلی چون کبر و حسد و نفاق می‌انجامد.
- 21- توجه تام و تمام به معشوق باعث می‌شود که تمام ساحات وجودی عاشق



(اعم از باورها، احساسات و عواطف، عزم‌ها و اراده‌ها، و رفتارها و گفتارها) معطوف به یک امر (معشوق) شود و تنها یکی را بجوید و بخواهد. این همان دیوانه شدن از غایت دوستی، و غیرسوزی عشق است که نوعی از تجربه توحید را با خود به همراه دارد.

چین چین کرن زولفین سیا کهسک نه‌تله‌سی دیبا قبا/ ئیدی نیشان نابن خویا تیکهل کرن لازم صه‌با// من دی صه‌با دای س‌ه‌هر ماداری به‌دری کرد و کهر/ قه‌وس و قه‌زه‌ح ژئ هاته دهر دیسا ب زولفانرا ته‌با// ئیرو ژمه ل به‌درا ته‌مام عه‌نبهر فشان بن صه‌د سه‌لام/ ئه‌ی هو‌دهودی شیرین که‌لام اهلا و سه‌لا مرحبا// نه‌ی شه‌که‌را سپی ده‌ست و زه‌ند زانم مه‌جالا نامه خوند/ لیفان ته‌به‌سسوم کر ژ قه‌ند ماست کبان فی ربا (۱۲)

چین چین کرن زولفین سیا کهسک نه‌تله‌سی دیبا قه‌با/ ئیدی نیشان نابن خویا تیکهل کرن لازم صه‌با

من دی صه‌با دای س‌ه‌هر ماداری به‌دری کرد و کهر/ قه‌وس و قه‌زه‌ح ژئ هاته دهر دیسا ب زولفانرا ته‌با

ئیرو ژمه ل به‌درا تمام عه‌نبهر فشان بن صه‌د سه‌لام/ ئه‌ی هو‌دهودی شیرین کلام (اهلا و سه‌لا مرحبا)

صوفی خه‌لوه‌نشین بینه سو‌جود/ ه‌ردو بره‌ین ته‌نه می‌جرابی دوعا// عه‌رضی کی دی بکرم صورته‌ی حال/ کو توپی قیبله‌یی ئه‌ریاب دوعا (۱۴)

سه‌ری ژولفا ته‌ب کؤللاب دوعا/ هاته ده‌ستی مه‌ب جه‌للاب دوعا

صوفی خه‌لوه‌نشین بینه سو‌جود/ ه‌ردو بره‌ین ته‌نه می‌جرابی دوعا

عه‌رضی کی دی بکرم صورته‌ی حال/ کو توپی قیبله‌یی ئه‌ریاب دوعا

به‌رد و بره‌ین ته‌ب ئیخلاص و یه‌قین/ مه‌دبر سه‌جده‌ب ئاداب دوعا (۲۴)

ژ دوعای قه‌ده‌حه‌ک دهر ده‌سته/ ه‌هر سه‌ه‌هر مه‌ستی مه‌ی نابن دوعا

گوئی ئیق‌بال ژ گولزائی قه‌بول/ مه‌چی بو د شه‌که‌ر خابی دوعا

به‌رد و به‌ره‌ین ته‌ب ئیخلاص و یه‌قین/ مه‌دبر سه‌جده‌ب ئاداب دوعا

مه‌رشات ه‌یئ حوسنا ئه‌زه‌ل، چه‌نگال زولفان تاب دا/ دا عشق هل بت پئل

پئل، قه‌لبئ مه‌لئ ج‌للاب دا

حوسنا حه‌یب و لوتفی یار، ئافی‌ته‌دل عی‌شقا غه‌دار/ له‌وس‌ه‌لب کرژی

ئختیار، وئ حوسنئ ئه‌ه‌ف

ئی‌جاب دا من دی سه‌هر زولفی‌ن د مه‌ست، هاتن سه‌ما ئحرام به‌ست/ چوون

سه‌جده‌یا خالی ب قه‌ست، له‌و حاجبان محراب دا

مه‌ش‌ش‌طه‌ی حوسنا ئه‌زه‌ل چه‌نگال زولفان تاب دا/ دا عی‌شق‌هل بت پئل پئل‌ه‌لبئ مه‌

بی ج‌للاب دا

حوسنا حه‌یب و لوطفی یار ئافی‌ته‌دل عی‌شقا غه‌دار/ له‌وس‌ه‌لب کرژی ئی‌ختیار وئ

حوسنئ ئه‌ف ئی‌جاب دا

من دی سه‌ه‌هر زولفی‌ن د مه‌ست هاتن سه‌ما ئحرام به‌ست/ چوون سه‌جده‌یا خالی ب قه‌ست،



هی ژ نزان میرد بیرون / زانه ته م سى سال ئه سیرین / چه حفنیری پورسه که ئه میرین /
له و بره حم شه فیه یه

هیژ نزان میرد بیرون / زانت ئه م سى سال ئه سیرین / چه حفنیری پورسه که ئه میرین /
له و بره حم شه فیه یه

ئیسیمی ته یه مه کتوب د دیوانی قیده م دا/ حه رفه ک قه له می عیلمی بته قویمی ره قه م
دا

ئه شکال و خه طین دائره یی نوقطه یی عیلمن/ ئه ف نه قش و میثالین د خه یالاتی عه ده م
دا

میم مه طله عی شه مسه ئه حه د ئایینه صیفه ت کر/ لامیع ژ عه ره ب به رقی ل فه خخاری
عه جه م دا

ئیسسی ته یه مه کتوب د دیوانی قیده م دا/ حه رفه ک قه له می عیلمی بته قه ویعی ره قه م
دا

ئه شکال و خه طین دائره یی نوقطه یی عیلمن/ ئه ف نه قش م میثالین د خه یالاتی عه ده م دا
میم مه طله عی شه مسه ئه حه د ئایینه صیفه ت کر/ لامیع ژ عه ره ب به رقی ل فه خخاری عه جه م
دا

قه ست و داخوازا «مه لی» دائمی جا ژ جان و دل ئه فه/ خه ره به ندا خدمتی پیش ده ستی
دیدارا ته بی

قه ست و داخوازا «مه لی» دائیم ژ جان و دل ئه فه/ هه رد به ندا خدمتی پیش ده ستی
دیدارا ته بی

هه ردو بره یین ته نه میحرابی ج ئیمان و چ کو فر/ بود هو نابود یه کن ئع ف چه ئه واب و چه
عیقاب// وه ره نیشانی ده خوه بی په رده سه حه ر/ لی ژ خونی بکه په ره یز کو شه هیدان چه
حیساب (۸۴)

هه ردو بره یین ته نه میحرابی ج ئیمان و چ کو فر/ بود هو نابود کو یه کن ئه ف چه ئه واب و
چه عیقاب
وه ره نیشانی (نشانی) ده خوه بی په رده سه حه ر/ لی ژ خونی بکه په ره یز کو شه هیدان چه
حیساب

ب حوسنا خو ئیلاهی کی بسه م و هه بیه تی دینی/ نوجوم و که وکه بی لامیع ژ بالا تین ب
به ژنیدا// بخالین وه رد و نه سیرینان ژ قودره ت کشاندی لی/ ب ته رها نیرگزا عیلی سه حه رگا هان



نەسێم لێدا // کوتولی ئاستانی دور نهکی ئیدی ژ ده‌رگاهی / ژبا خوی فی رجوناکین د بابی لوطف و ره‌حمیدا (۹۳)

ب حۆسنا خو ئیلاهی کی ب سه‌هم و هه‌یه‌ته‌ی دێی / نو‌جوم و کو‌که‌بن لامیع ژبالا تین ب به‌ژنیدا

بخالین وهر د و نه‌سرينان ژ قۆدره‌ت خه‌ت کشاندي لئ / ب ته‌رحا نیرگزا عیلى سه‌حه‌رگاهاڤ نەسێم لێدا

کو‌تۆلی ئاستانی دور نه‌کی ئیدی ژ ده‌رگاهی / ژبا خوی فی رجوناکین د بابی لوطف و ره‌حمیدا

دچه‌رخى وه‌ک نو‌جوم ديم دور سه‌ما هاتنقىرانا يه‌ک / هه‌یىفا به‌ده‌ر بو‌ئهو سورپه‌رى من دى دره‌قصیدا //

ب قورناني ب ئایاتی ئەگه‌ر پیری خه‌راباتی / بیژت سه‌جده‌ بن لاتى موریدی وی دبن قاتی

مرید ار‌بی‌بصر نبود ز فرمانش بدر نبود / که سالک بی‌خبر نبود ز راه و رسم منزل‌ها (ص ۵)

ب قۆرنانی ب ئایاتی ئەگه‌ر پیرى خه‌راباتی / بیژت سه‌جده‌ بن لاتى موریدی وی دبن قاتی مرید ار‌بی‌بصر نبود ز فرمانش بدر نبود / که سالک بی‌خبر نبود ز راه و رسم منزل‌ها

ب قورناني ب ئایاتی ئەگه‌ر پیری خه‌راباتی / بیژت سه‌جده‌ بن لاتى موریدی وی دبن قاتی (۵)

مرید ار‌بی‌بصر نبود ز فرمانش بدر نبود / که سالک بی‌خبر نبود ز راه و رسم منزل‌ها (ص ۵)

ب قۆرنانی ب ئایاتی ئەگه‌ر پیرى خه‌راباتی / بیژت سه‌جده‌ بن لاتى موریدی وی دبن قاتی مرید ار‌بی‌بصر نبود ز فرمانش بدر نبود / که سالک بی‌خبر نبود ز راه و رسم منزل‌ها

مه‌را ژ ئه‌وه‌هل چ بر خامی کشانده‌ ئاخیر ب به‌د نامی / ژ ره‌نگی سه‌عدی و جامی ژ شوهره‌ پی‌حه‌سین عامی

به‌ده‌نگ و بانگ و ئاوازی دی‌ژیت نه‌غمه‌یا سازى / نه‌ان کى ماند آن رازی کزو سازند محمل‌ها (ص ۷)

مه‌را ژ ئه‌وه‌هل چ بر خامی کشانده‌ ئاخیر ب به‌د نامی / ژ ره‌نگی سه‌عدی و جامی ژ شوهره‌ پی‌حه‌سین عامی

به‌ده‌نگ و بانگ و ئاوازی دی‌ژیت نه‌غمه‌یا سازى / نه‌ان کى ماند اون رازی کزو سازند محفل‌ها

لله‌ وهره‌ ساقى بدو جامان مه‌ جوان که / مو‌طریب به‌ده‌ فی را به‌ده‌ سیگار و شه‌بابی وهر‌گوه‌ به‌ده‌ نایى کو‌شیرین قه‌د د سه‌مایى / پور‌ه‌ل‌کرنه‌ فی فه‌صلی‌خیطابى



III. ULUSLARARASI MELAYÊ CİZÎRÎ SEMPOZYUMU

جامی نه شه کەر له ی بمه دت عهینی حرامه / فهتوا وه نوما حاشیه یا شه رها لوبابی مو فتی مه
نه ی و نایه و نه ی قو لی قه دیمه / باوره ته نه هن گو ه بده بهر چنگ و ربابی

(لله) وهره ساقی بده جامان مه جوان که/مؤ طریب بده فی را بده سیگه و شه بابن

وهر گو ه بده ناین کو شیرین قه د د سه ماین/پۆر هه ل کر نه ئی فه صلی خیطابن

جاما نه شه کەر له ب بمدت عهینی حرامه/فهتوا وه نوما حاشیه یا شه رها لوبابن

سه حهری خو ضری عینایه ت کو برین چه شمه یی دل / به جیهانی مه نه ظر دا کو جیهان
عهینی سه راب ب حو بابی
مه به مغرور وه هه سه رگه شته مه لا / باف بهر به ی هو ده سه رگه شته حو باب
وه یه هو ده و د ژ سه با بی ت و بزاین چیه حال / کولحالی مه غه ربان نه سوئیس و نه
جهواب

سه حهری خو ضری عینایه ت کو بهرین چه شمه یی دل/ب جیهانی مه نه ظه ردا کو جیهان
عهینی سه راب

300 ب حو بابی مه به مه غرور وه هه سه رگه شته مه لا/باف بهر که فتی یه وی به ی هو ده سه رگه شته
حو باب

وه یه هو د هو د ژ سه با بی ت و بزاین چیه حال/کولحالی مه غه ربان نه سوئال و نه جهواب

دهستی قودره ت کو هلا فیت ژ به ژنا ته نیقاب/ب جه مالا جه به روتی مه نه مان په رده
و حیجاب//ل گولین ته ی ته رو نازک کو سه حهر گرتی خونا ف/د نه باریق قنینان ژ حه سه د
صوه تی گولاب//عهینی کافوری یه مه شره ب مه ژ حوسنا ته یه صاف/له ف ژ عیشقاته د دل
دامه فه بو عیلمی عو باب//مه ژ سه رچه شمه یی حه یوان قه ده حه ک صافی فه خوار/ناگه می
له ذذته ت و ذه و قا مه ب صه د جلدی کتاب (۵۴-۴۴)
دهستی قودره ت کو هلا فیت ژ به ژنا ته نیقاب/ب جه مالا جه به روتی مه نه مان په رده و

حیجاب

ل گولین ته ی ته رو نازک کو سه حهر گرتی خونا ف/د نه باریق و قنینان ژ حه سه د صوه تی گولاب
عهینی کافوری یه مه شره ب مر ژ حوسنا ته یه صاف/له ف ژ عیشقاته د دل دامه فه بو عیلمی
عو باب

ل که لیبی ئاستانی خو ه نه پرسی قه ط حه یی جاره ک/گه لو نائینه بیری ئه م دفی
نیچیر و راوی دا/دزانه شه سواری من غه زاله ک وی دفتر اکی/بجایی صهیدی ئه ز بوما دوی
فتر اک و به ندیدا//چ هه ددی صه د هزار جان بن د فتر اکا حه بیبی من/کو صه د جه مشید و



سەحەرگە عەندەلیب مەستن ژ بێنا وەرد و بشکوژان
شۆبەئ توتاگ و گووینان دنالین ئەم د فەرقدیدا

لە کەلێ ئاستانێ خوە نەپرسی قەط حەبیب جارەک
گەلو نائینە بیرئ ئەم دەقێ نیچیر و راوئ دا

دزانم شەهسەوارئ من غەزالەک وئ دفترائ
بەجای صەیدئ نەز بۆما دوئ فتراک و بەندید

دزانی رود و عود ئەووەل چ دافین سورود ئەووەل/ کە عشق آسان نمود اول ولی افتاد
مشکلها (ص ۲)

کو کاتێب دێئ جەدوول کت شکەستە خەط مۆسەلسەل کت/ ژ یەک حەرفان
مۆفەصەل کت کێه ئێ مۆشکێ حەل کەت
دزانی رود و عود ئەووەل چ دافین سورود ئەووەل/ کە عشق آسان نمود اول ولی افتاد مشکلیا

قولزمی عیشقی ژ بای خو موخالیف دەمە کی/ دەمە ماماتی عەجایی مەل سەر دەستی غیراب
قولزۆمی عیشقی ژ بای خو موخالیف دەمە کی/ دەمە ماماتی عەجایی مەل سەر دەستی
غیراب

حەبیبی بی خەتا کو شتم ب دەربا فیرقەتی ئاخەر/ ژوی روژی دزانی من کو یار ئەو تیر ل
جەر گیدا// گەلو دیسا ببینم ئەز چرای وەصلەتی هەل بت/ بسۆرم شۆبەئ پەروانی د بەر روی
نور و شەوقی دا// ب دەربی کەو کەبا صوبجی ل مەشرق زوهره طالیع بت/ زوحەل دوربت ب
شەش بورجان و وندا بت د غەربیدا ... (ص ۳)
حەبیبی بی خەتا کو شتم ب دەربا فیرقەتی ئاخەر/ ژوئ روژی دزانی من کو یار ئەو تیر ل
جەرگیدا

گەلو دیسا ببینم ئەز چرای وەصلەتی هەل بت/ بسۆرم شۆبەئ پەروانی د بەر روی نور و شەوقی دا
ب دەربێ کەو کەبا صوبجی ل مەشرق زوهره طالیع بت/ زوحەل دوربت ب شەش بورجان و وندا
بت د غەربیدا

ب ناری فیرقەتی سوھتەم ژ فەرقی سەر حەتایی دا/ خەدەنگا خەفلەتی نوھتم ژ بەرقا
لامیعاتی دا (۷۲ دیوان)

ب ناری فیرقەتی سوھتەم ژ فەرقی سەر حەتایی دا/ خەدەنگا خەفلەتی نوھتم ژ بەرقا لامیعاتی دا



III. ULUSLARARASI MELAYÊ CİZÎRÎ SEMPOZYUMU

خه دهنگا فیرقه تی ره عده دلی ئەو غه فله تی لی دهت/دیژم وەر جه بهل بت ئەو بکه ربت وی دگاڤی
دا

هه چی فیرقه ت نه دی هیجران نه بی من داغ و که ی لینه/ژبل دهر بی دهیجرانی فیراقا روح و جان
کین دا

بروسکا باطنی دا دل دپیتی سینه وی وهر بو/کو دی بیتن ته بیتا دل د ناف وی نارو پیتی
دا (۹۲)

بروسکا باطنی دا دل دپیتی سینه وی وهر بو/کو دی بیتن ته بیتا دل د ناف وی نارو پیتی دا
ژئولفی شوپه تی زولفی مه دام له و بی قه رارم ئەز/که جانی من عه زیز ئیرو چوو دل وی دئولفی
دا

ژ مه حبوب دور کرم چه رخی فله ک وی پر هه لاقیتم/نزانم دی له کو دهت ده تی ده وران و
چه رخیدا

میننه ت ژ خودایی کو به عه بدی خو مه لای/نیکسیری غمی عیشق نه دینار و درهم دا
(ص ۲۱)

میننه ت ژ خودایی کو ب عه به دی خو مه لای/نیکسیری غمی عیشق نه دینار و درهم دا



Helbesta Hîkemî û Melayê Cizîrî: “Kes Bî Dada Me Nepîrsît” Wekî Numûne

M. Zahir Ertekin*

*Bi dînarê dinê zinhar da yarê xwe tu nefroşî
Kesê Yûsuf firotî wî di 'alem da xesaret kir*

Puxte

Hikmet peyveke erebî ye û bîngeha xwe jî Qurana Pîroz werdigire. Di hedîsên Pêxember de jî amaje û îşaret bi hikmetê hatiye kirin. Ji sedsala 18hem û vir ve, bi wergerên berhemên feylesofên yewnanî, felsefe jî wekî hikmet hatiye neqîlkirin, pe-jirandin û bi vî awayî bergeha hikmetê firehtir bû. Di nava bi-hurîna demê de, di nav jiyanê de, di gelek qadan de hikmet wekî tevgerêke mentiqî, bi îsabet û zanakarî derdikeve pêşberî me. Çawa ku hikmetê di gelek qadan de şax vedaye, ji ber ku kana gotina lihevhatî û birêkûpêk e, edebiyatê jî xwe jî vê qadê azade nedîtiye û jî hikmetê sûd wergirtiye. Bi vî awayî em dikarin bibê-jin ku ekoleke bi navê ekola helbesta hîkemî çê bûye. Bêguman kurdî jî di nav de, hemû edebiyatên klasîk û heta yên nûjen jî, ji vê hikmetê bê par nemane.

303

Hikmet; îfade û vegotinên wecîz û zanînawer e. Herwiha, hikmet jî tecrûbeyî jiyanê sûd werdigire û wan ezmûnan bi ruhê jiyanê dinikilîne nav rûpelan. Bi gelemperî helbestên hîkemî, helbet li gorî serdem, merc û civakan, rênîşander in. Ev helbestên hîkemî jî qelemên edîbên pêşbîn û hosteyên gotinê diniquitin ser rûpelên jiyanê. Çi pexşan be çi helbest be, gotinên hikmeta-mîz, jî duh ber bi îro û jî îro ber bi sibê ve rewane ne. Ji ber ku helbesta hîkemî ne tenê bangî serdem û sedsala xwe dike, loma jî diherike, mayînde ye û jî ber vê yekê jî hîkemî ye. Eger helbest

* Prof. Dr., Mardin Artuklu Üniversitesi, Edebiyat Fakültesi, Kürt Dili ve Edebiyatı Bölümü. ORCID: 0000-0003-3519-9892 | zahirertekin@hotmail.com



bê me'rifet û bê hikmet be, misoger wê zûbizû di nava demê de bihele û di nava rûpelên dîrokê de wê winda bibe.

Edebiyata kurdî ji aliyê hîkemiya ve qadeke beyar e. Ango di vê qadê de heta niha xebatên rêkûpêk nehatine kirin. Li gorî xwendinên me yên lokal û bisînor, me dîtiye ku hemû şair, edîp û nivîskarên klasîk ên kurdan, hem carûbaran ji bo bêhnvedanekê, hem ji bo ku xwendekar bêhna xwe berde, cih dane helbestên hîkemî. Hin caran wan êdî hew îdare kirine û tecrûbeyên xwe rijandine nava dîwanên xwe. Bi vî awayî tu dîwaneke kurdî tune ye ku helbestên hîkemî di hundirê wê de nehatibe rareşandin. Di van helbestan de her xwendevan, bi awayekî, xwe di hundirê helbestê de dibîne û li gorî xwe şiroveyan dike. Ji ber ku ev hîkemiya, bi helbestkî hatine gotin, jiberkirina wan hêsan e û ji ber ahenga wan a tekûz jî zêdetir di hişê xwendekaran de dimînin.

Me di vê xebatê de berê xwe daye numuneyên helbestên hîkemî yên ji Dîwana Melayê Cizîrî de. Armanca ev e ku em bikaribin teoriyekê daynin ji bo vê mijara berfireh û li ser vî esasî berê xwe bidin helbestên Mela. Bê guman hemû helbestên Melayê Cizîrî yên hîkemî nikarin bikevin bin gotareke bi vî rengî sînordar. Loma jî em ê qîma xwe tenê bi hin numûneyan bînin. Em ê di nav helbesta hîkemî de dabeşiyekê bikin û ji bo her binbeşeke hîkemî em ê çend malikên nimûne ji Dîwana Mela bidin û di dawiyê de jî em ê helbesta "Kes Bi Dada Me Nepirsit..." a Mela jî bi şiroveyeke hîkemî û bi berfirehî şerh bikin.

Peyvên Sereke: Hikmet, Edebiyata Kurdî ya Klasîk, Felsefe, Melayê Cizîrî, Dîwan.

Destpêk

Ji ber ku di xwe de gelek wateyan dihevine, pênasikirina têgeha "hikmetê" karekî hêsan nîne. Herwiha têgeha "hikmetê" di nava dem û zemanan de wateyên cuda li xwe kirine. Gelek zana û aliman, di berhemên xwe de pênasayên ciyawaz kirine. Ji pênasikirina wê wêdetir mirov taybetiyên wê binirxîne wê baştir be.



Bi awayeki giştî, “hikmet” dikare wekî nihêrînên biîsabet ên hemû qadên jîyanê bê qebûlîkirin. Ji tecrûbeyan sûdwergrîtin û li gor wan azmûnan tevgerên di cih de ne. Hikmet di xwe de pratîka jîyanê dihevwîne. Herwiha, hikmet bi çavekî gelemper nihêrîna li eşya, bûyer û kirinan e. Di vê nihêrînê de kûrahiyek heye.

“Hikmet” û “hukum” ji heman kokê derdiçin. Hukum ji rabûna li dijber zulmê ye. Eger hakimekî ‘adil hebe wê biryareke ‘adîlane bide û ‘edaletê pêk bîne, li ber zulmê rabe. Hikmet ji dikare wekî manî‘ê cehaleta eqlî were dîtin. Îslamê, mirovahî ji rêşasiyê, ji cahîliyê derxistiye û ber bi ronahiyê ve aniye. Ev ji bi hikmetê hatiye pêkanîn. Karê ku hatiye kirin hekîmane ye, ‘adîlane ye, ‘irfanane ye û şîretperwerane ye. Bi vî awayî jîyan li gor şert û mercên fitrî, heqîqî û kamilane hatiye pêşniyazkirin.

Taybetmendiya sereke ya helbesta hîkemî ew e ku bi zimanekî herikbar û bi awayekî hunerî rastiye jîyanê, têkiliyên mirovî bi Xwedê re, bi siruştê re û bi civakê re radixe ber çavan. Di van helbestan de, helbestvan bi rêya metafor, teşbîh û îstîareyan ramanên xwe yên kûr pêşkêş dike. Ji aliyê naverokê ve, helbesta hîkemî dikare li ser mijarên mîna fanîbûna jîyanê, giringiya exlaqê xweş, dostanî, rêzgirtina li pêşberî zanînê, evîna îlahî û gelek mijarên din bisekine. Ev mijar bi awayekî dike ku helbestên hîkemî ne tenê ji bo demekê, lê ji bo hemû deman derbasdar bin.

Gotinên pêşîyan, di nava gelan de wekî cureyên ‘ewilîn ên hikmetê tên qebûlîkirin. Tradîsyona gotinên pêşîyan di nav hemû gelan de heye. Herwiha, di nav kurdan de jî gotinên pêşîyan pir zêde ne. Bi dehan berhevkarên kurd yên vê qadê, bi deh hezaran gotin berhev kirine û bi dehan pirtûk di vê qadê de hatine çapkirin. Em bi dilekî rehet dikarin bibêjin ku kurdî, ji vî aliyê ve gelek dewlemend e. Ev tradîsyon di nav ‘ereb, çînî, hindî, tirk, fars û îbraniyan de jî li pêş e. Loma em dikarin bibêjin ku hikmet malê gelên rojhilatî ye. Di kurdî de gotinên pêşîyan serdanpê bi hikmetê dagirtî ne. Di hin gotinên pêşîyan de rasterast peyva hikmetê derbas dibe, lê bi gelemperî bêtî ku peyva hikmetê di wan de derbas bibe, hikmet ji wan diniquete. Bo numune: “Bêdengî zêr e, tevî şeref û namusa pê re”, “Pîreka fedyok bi gundekî, zilamê fedyok bi kundekî”, “Aqil taca zêrîn e, li serê herkesî nîn e”, “Sê ehmeq hene li dinê, yê miha xwe bide bi bizinê, yê hevraz divex-



wê tûtînê, yê mala xwe bibe cem mala bavê jinê."

Di hin gotinên/şî'rên hîkemî de sergirtinek, nepeniyek, razek heye. Gava ku mirov berê xwe dide mijarê, behsê, dîmenê yan çîroka gotî, armanca qesdkirî rasterast nayê famkirin. Ji bo ku mebest baş were fêmkirin lêkolînek lazim e. Hin caran lêkolîn jî kar nake, lewra raz û sirrên nihênî ne. Xweda perdeyê dikêşe ser hin tişt û bûyeran, her kes nikare jê fêm bike. Divê Xwedê vekirina deriyê wan razan bike nesîb yan na hikmeta wan, sirrî û rumûzî ye, perde kişandiye ser wan. Ev jî xusûsiyeteke hikmetê ye. Bo nimûne Ehmedê Xanî di Mem û Zîna xwe de wiha gotiye:

Ez mame di hîkmeta Xudê da
Kurmanci di dewleta dinê da

Aya bi çi wechî mane mehrûm
Bîlcumle ji bo çi bûne mehkûm

Di van herdu malikên Mem û Zînê de Xanî li ser paşdemayîna mîletê kurd xwe gelekî westandiye û di encamê de hikmeta di vî karî de fêm nekiriye û li vê tînegihîştina xwe mikur tê. Yan jî herwekî ku zane lê xwe li nezaniyê datîne. Xuya ye ku şa'iran jî jî tînegihîştina hin razên Xwedayî şaş û metal mane û van fikrên xwe di berhemên xwe de bi cih kirine. Dîsa di malikeke din a Mem û Zînê de Xanî wiha dibêje:

Şolin hene, zahîren xerab in
Fê'ilin hene, sûreten sewab in

Yek 'edl e, li sûretê cefayê
Yek qehr e, di kiswetê wefayê

Lê perdekeşê rumûzê hîkmet
Bê sirr nekir ew kunûzî qîsmet

Yanî hin kar hene ku ji aliyê şiklî ve xerab dixuyên lê di hundirê wan de xêr heye û hin tevger û kar jî hene ji aliyê şiklî ve baş dixuyên lê di eslê xwe de xerab in. Loma hin caran 'edalet di şiklê cefa û elemê de û hin caran jî di qehr di kiswetê wefayê de xwe dide der. Loma jî gelek caran mirov hikmeta wan razan di serî de tînegihê. Xanî vê hikmeta sergirtî ji ayeteke Qur'anê werdigire ku dibêje; "Digel ku bo hewe zehmet e jî, herb li ser we hate ferzkirinê. Lewra di heqqê we de hin tişt hene bi xêr in lê dîsa jî li xweşa we naçin û hin tişt jî li gorî dilê we ne lê di wan de tu xêr nîne. Tene Xweda dizane, hûn nizanin." Di vê ayetê de



behsa hikmetên herbê têtê kirin. Ji aliyê zahirî ve herb xirabkirin, xisar, talan û mirin e lê ji aliyekî din ve xweparastin, teblîxa heqiyê, dad û rizgarî ye. Çendîn ku ji aliyê şiklî ve li xweşa mirovan neçe jî di encamê de hikmetên veşartî, mehsûlên bixêr hene.

Edebiyata kurdî, bi dîroka xwe ya kevnar û dewlemend, gelek cureyên edebî di nav xwe de dihevwîne ku yek ji wan jî edebiyata hikmetê ye. Hikmet, ku tê wateya zanîn, feraset û şehrezayiyê, di edebiyata kurdî de cihekî taybet digire. Helbestvanên kurdên klasîk, bi rêya berhem, helbest yan jî malikên xwe yên hîkemî, hem nîrxên exlaqî û civakî veguhastine, hem jî ramanên kûr ên felsefî û tesewwufî pêşkêş kirine. Di çarçoveya edebiyata kurdî ya klasîk de, helbesta hîkemî bi piranî li ser bingeha têgihên tesewwufî, exlaqî û civakî hatiye avakirin. Helbestvanên mîna Melayê Cizîrî, Ehmedê Xanî û Feqiyê Teyran di berhemên xwe de cih dane hikmetên kûr ku mirov dikare ji wan dersên jiyanê werbigire. Ev her sê şair bûne pêşeng ji bo helbesta hîkemî, lê bêguman şairê herî mezin ê vê qadê Melayê Cizîrî ye.

1. Hikmet

1.1. Hikmet Di Quran û Hedîsên Pêxember De

Hikmet di Quran û hedîsên Cenabê Pêxember de, mijareke berfireh e û ji bo wateya wê nexşeyeke ferewan heye. Di jiyana rojane de em hikmetê bi wateya “nîrxandina bûyeran bi awayekî baş û rast” bi kar tînin. Yanî dema ku em li bûyerekê, kirinekê dinêrin, ji bilî aliyê wê yê zahirî, em yê veşarî jî li ber çavan digirin. Herwiha, hikmet gotina xweş û çak e ya ku meriv ji neqenciye dûr dixê û herwiha hikmet, gurêzandina ji neçakî û nebaşîyan e jî. Di vî warî de Qurana pîroz giringtirîn kitêba hikmetê ye.

Di deh ciyên Quranê de, hikmet digel peyva kitêbê hatiye. Bi tevahî hikmet bist caran di Quranê de derbas dibe. Sê caran digel peyva “mulk”, carekê digel peyva “mewzî’e” û carekê jî bi peyva “xêr/xeyr” re hatiye bikaranîn. Terkîba “Hikmetun Balîxe” jî bo Quranê hatiye gotin. Li ser vê terkîbê gelek şiroveyên cuda hatine kirin. Bi gelemperî Quran serdanpê wekî kitêba hikmetê hatiye nasandin û pejirandin.



Hikmet di hedîsan de jî pir caran wekî wateyên ku di Quranê de hatine, derdikeve pêşberî me. Dîsa wekî ku di Quranê de jî hatibû, di hedîsan de jî hikmet bi gelek wateyên cihê hatiye. Bo nimûne: “Hikmet malê jidestçûyî/winda yê mumina ne, li ku bibîne hildide/divê hilde” li vir em dibînin ku hikmet di wateya ‘ilm, zanîn, gotina rast de hatiye bikaranîn. Herwiha, ev tiştên qedirbilind her li ku bin divê mirov bibîne û jê sûd werbigire. Bi vî awayî ji çandên cihêreng jî deriyê sûdwerigirtinê wekî prensîbekê derdikeve pêşberî me. Dîsa di hedîsekê de ji bo hikmetê wiha hatiye gotin: “Bêguman di hin helbestan de hikmet heye, hin helbest hikmet in.” Digel ku di Quranê de ji bo şî’ra cahiliyê em rexneyên tûj jî dibînin, di vê hedîsê de tê dîtin ku hikmet jî ketiye hundirê şî’rê.

1.2. Hikmet û Felsefe

308 Di cîhana îslamî de piştî ku karûbarên wergerê dest pê kirin, têgeha hikmetê jî reng û rûyê xwe guherand. Piştî wergerên feylesofên yewnanî têgeha hikmetê di wateya “felsefe, ‘ilmê felsefî û zanistên eqilî” de hate bikaranîn. Bi tesîra kevneşopa felsefeyê tekamula exlaq li ser çar hîmên bingehîn hate dabeşkirin. Hikmet, şeca’et, iffet û ‘edalet. Xuya ye ku hikmet di serî de hatiye zikirkirin û ji bo exlaqekî kamil nebenabe ye. Lewra tenê hikmet dikare di hemû kiryarên îradî de baş û nebaşan ji hev veqetîne.

Berhemên grekî yên felsefî dema hatin ‘erebîkirin, têgaha “phila-sophia” wekî “hezkirina hikmetê” hate tercumekirin. Bi vî awayî têgeha hikmetê wateyên felsefîk xiste hundirê xwe. Ye’qûb kurê Îshaq el Kindî ku di cîhana îslamî de wekî feylesofê yekem tê hesibandin, ji bo têgaha “phila-sophia” hin caran gotiye hikmet û carûbaran jî felsefe gotiye. Wî ji bo feylesofan, têgeha “hukema” bi kar aniye û wî ji bo asta herî bilind a felsefeyê jî “hikmeta hikmetan” bi kar aniye. Di cîhana îslamî de berî Kindî jî peyva felsefeyê bi rêya tercumeyê ketibû nav lîteratura îslamî. Bo nimûne Ibnu’l-Muqeffa’ (w. 142/759) ku hin ji beşên mentîqa Arîsto, ji farsî wergerandibû ‘erebî, hikmetê di wateya felsefeyê de bi kar tîne. Muqeffa herwiha di wergera berhema Kelîle û Dîmneyê de jî hikmetê bi peyva felsefeyê şirove dike. Dîsa hekîmê navdar ‘Elî kurê Rabben et-Taberî, navê berhema xwe ya tîbbê kiriye “Firdewsu’l-hikme”. Di vê berhemê de têge-



ha hikmetê hem ji bo tîbbê hem jî ji bo felsefeyê hatiye bikaranîn.

Xulase felsefe zanistêke analîtîk e, ramanekê analiz dike û xwe digihîne hin encaman. Hikmet jî xwe noqî 'ezmûnan dike û hemû hûrguliyan di konseptekê de dicivîne.

Felsefe bêtir xwe dispêre ramanên eqlî û piştî xwe dide zagonên mentiqî. Lê hikmet ji bûyerên sethî û serveyî wateyên kûr derdixe. Herwiha hikmet di vî karê xwe de hem xwe dispêre mîrasa çandî ya qedîm û hem jî îlhama xwe ji îstîdada şexsî werdigire.

Hikmet ji îlhamê jî baş sûd werdigire, lê felsefe ji mentiq û ramana rasyonel diwelide. Ji ber ku îlham bêtir bi dil ve girêdayî ye, hikmet bêtir piştî xwe dide dil. Felsefe jî bêtir nêzîkî eql e. Loma jî hikmet sentetîk e û piranî para gelên rojhilatî ye û felsefe analîtîk e û pitir bûye para gelên rojavayî. Ev herdu rewş li gorî siruştî karakterên miletan e jî. Di vî warê de Bediuzzeman dibêje: "Ronahiya wîdan bi 'ulumê dînî hasil dibe, nûra eqlî jî fennên medenî ne. Dema ku herdu bîr cem hev heqîqet tecellî dibe..." "Ango Bediuzzeman li vir behsa pêwîstiya îttîfaqiya hikmet û felsefeyê, rojhilat û rojava, dil û eql dike. Dîsa dibêje: "Remzeke qedera ezê ev e ku piraniya pêxemberan li rojhilat derketine û ekser hukema jî li rojava rabûne. Ev jî îşaret dike ku dîn û dil/qelb dikare gelên rojhilatî rake ser piyan, ne eql û felsefe." Di vir de jî eşkera dibe ku hikmet malê gelên rojhilatî ye û felsefe jî bêtir malê gelên rojavayî ye.

309

Di civakê de pratîka hikmetê xuya ye. Yanî hikmet di jiyana rojane de çalak e û mirov bi hêsanî ji pîvanên hikmetê dikare sûd werbigire û jiyana xwe li gorî qayîdeyên hikmetê biguherîne û bi rê ve bibe. Lê di felsefeyê de ev pratîk pir kêmtir e.

1.3. Hikmet û Şîret

Têkiliya di navbera hikmet û şîretê de gelek xurt e. Hikmet zanîna kûr û fahmkirina jiyane ye, lê şîret rêberiya pratîk e ku ji vî zanîne dizê. Hikmet wekî kaniya zanîne ye, şîret jî ava ku ji vî kaniyê diherike. Kesê ku xwedî hikmet e dikare şîretên baş bike, û şîretên heja jî ji hikmetê tên. Bi kurtasî, hikmet zanîna û feraseta



kûr e, şîret jî bikaranîna vê zanînê ye ji bo alîkariya kesên din. Têkiliya sereke ya di navbera hikmet û şîretê de ew e ku hikmet çavkaniya şîretê ye. Şîret, bêyî hikmetê, tenê dibe gotinên vala û bêbandor. Lê dema ku şîret ji hikmetê tê, hingê ew dibe xwedî bandor û wate. Bi gotineke din, hikmet bingeha şîretê ye û şîret jî encama hikmetê ye. Herwiha, hikmet û şîret di gelek waran de hevdu temam dikin.

Hikmet û şîret di hin gotinan de digihêjin hev. Hin şîretên bihikmet hene, lê her şîret bihikmet nîne. Bo numûne, dema bav ji kurê xwe re bêje: “Kurê min, di rojên zivistanê de, dema te serê xwe şûşt dernekeve derve.” Yan: “Dema ku tu trênbêla xwe di nava bajêr de dajoyî, bi suret najo.” Di van nimûyên şîretê de hikmet tune. Lewra şîret di jiyana rojane de, bi her awayî dika-re were kirin. Lê hin şîret jî hene ku hikmet di wan de hene. Bo nimûne, Ehmedê Xanî ji bo xwendekaran wiha dibêje:

Ger dê te meqsûdek hebî, lazim divê li bî bi lez
Xasma te me'bûdek hebî daim di emrê wî bibez

310 Di vê beytê de Xanî bi awayekî şîretamîz pîvaneke jiyânî û pîvaneke baweriyê bi hev re dide. Di malikekê de bi awayekî şîretî hikmeteke riya jiyânê şanî me dide.

1.4. Hikmet û Belaxet

Belaxet ji lêkera belexeyê peyda bûye. Wateya wê ya ferhengî “gihaştin” û “xwe gihandin” e. Di istilahê de gotina li gorî muqtezayê hal e. Yanî gotina di cih de, di wextê xwe de, bi pîvan, gotina rast û xweş e. Ev pênaseya belaxetê, bi vî awayî li hikmetê jî tê. Lewra di gotinên hîkemî de jî wecîzî, xweşî, rastî û gotina di cih de heye. Herwiha ev pênase bi sîstem, aheng û pergala gerdûnê re jî li hev dike. Lewra di gerdûnê de jî, ji ‘alema mikro heta ‘alema makro, pergaleke bêpayan, ferewan û dicihdabûn heye. Çawa ku di belaxetê de îsrafa gotinan tune, di gotinên hîkemî de jî tune.

Hikmet û belaxet, di kevneşopa edebiyata klasîk de du hêmanên giring in ku hev temam dikin. Hikmet, şehrezayiya kûr û zanîna heqîqetê îfade dike; belaxet jî hunera gotinê ye ku pêwîst dike ev şehrezayî bi awayekî bibandor, xweş û hunerî



were îfadekirin. Belaxet, ji bo hikmetê wekî depoyekê ye. Bîrdozên herî kûr û dersên jiyanê, tenê dema bi zimanekî belaxetî bêne parvekirin, dikarin bigihîjin girseyên fireh û bandoreke mayînde bihêlin. Ji ber vê yekê, şairên klasîk, ji bo ku berhemên bihikmet, bi awayekî herî bibandor ragihînin, hûrgiliyên hunera belaxetê bi kar anîne. Bandora gotineke bihikmet, rasterast bi awayê gotina wê ve girêdayî ye. Armanca sereke ya hunera belaxetê ew e ku, gotinê bi awayekî herî xweş û bibandor îfade bike. Di vê çarçoveyê de, gotineke bihikmet çiqas bi belaxetî bê îfadekirin, ewqas di bîrê de dimîne û bi bandor dibe.

Di edebiyata klasîk de, hikmet bi gelemperî bi îfadeyên wecîz tê pêşkêşkirin. Belaxet jî amûrek e ku wan îfadeyên wecîz dixemilîne, xweş dike û watedartir dike. Bo nimûne, gotineke bihikmet ku di beytan de hatiye gotin, dema ku bi hunerên belaxetê yên wekî teşbîh, îstiare, mecaz û kînayeyê tê dewlemendkirin, hem nîrxê wê yê estetîk zêde dibe hem jî wateya wê kûr dibe. Têkiliya di navbera hikmet û belaxetê de, wekî têkiliya naverok û şîklê jî dikare bê qebûl kirin. Hikmet naverokê temsîl dike, belaxet jî şîklê pêşkêşkirina wê naverokê ye. Lihevhatina herduyan, berhemên heja yên edebiyata klasîk derxistine holê. Bêguman di edebiyata kurdî ya klasîk de Melaye Cizîrî pêşdarê belaxeta kurdî ye jî.

2. Rêbaza Hîkemî di Edebiyatê de

Hikmet, li gorî taqeta însanî, zanîna heqîqet û mahiyeta heyberan e. Hikmet peydakirina heqîqetê bi riya 'ilm û eqlî ye. Hikmet di Quranê de, di gelek ayetan de, bi hin wateyên ji hev cuda derbas dibe. Hikmet piştî tefekkureke enfusî tête peydakirin. Kesê ku bixwaze xwe bigihîne vê meharetê, divê ji navê Xweda yê ku "Hekîm" e û sîfetên Xweda yên têkildarê hikmetê ne, dest pê bike. Lewra Xweda di gerdûnê de bi hikmetê her tişt afirandiye, jiyana berdewam jî her bi wê hikmetê didome. Wate, tu tişt tune ye ku hem nuwaze nehatibe afirandin û berdewam ev îstîqrara kemaliyetê tê da tunebe. Loma jî mînakên herî mezin û rasteqîne yên hikmetê ji destê Xweda derçûne û derdiçin. Lewra Xweda her roj her gav û dem di halê afirandineke bihikmet de ye. Vêca însan jî li gorî vê nêrînê dikare pencerekeye me'newî ji xwe re veke ku bi alikariya 'ilm û 'emelên xwe yên qenc, xwe



bigihîne hin astên hikmetê. Eger mirovek xwe bigihîne hikmetê, ango Xweda hikmetê nesîbê kesekî bike, wê demê ew kes dibe mezherê navê Xweda yê “hekîm” û wekî ku di ayeta Quranê de derbas dibe, ew kes dibe xwediyê gelek qencî û xêratan.

Di nava dem û zemanan de, di qadên curbicur ên jiyane de cureyên hikmetê derketine û her ku çûye ev cureyên hikmetê li hev zede bûne. Bo nimûne, hikmetên dînî, hikmetên exlaqî, hikmetên tîbbî, hikmetên ekonomiyê, hikmetên siyasî û wd. Edebiyata klasîk jî qadeke muhîm a hîkemî ye. Şairên berê, xwe jî helbestên hîkemî bê par nehiştine. Di edebiyata farsî de Se’dî, Şewketê Buxârî û Saibê Tebrizî; di edebiyata tirkî de Nabî, di edebiyata erebî de Mutenebbîh bûne pêşengên vê qadê. Di kurdî de jî vê tradîsyonê bi Baba Tahîrê ‘Uryan dest pê kiriye, Melayê Cizîrî lûtke ye, bi Feqî, Xanî û Bateyî berdewam bûye. Lê şairên me yên din jî xwe jî vê babetê mehrûm nekirine.

312 Di edebiyatê de rêbaza hîkemî, “wekî gotinên bihikmet ên ku pişt a xwe didin ramanê” hatiye pênasekirin. Şairên helbesta hîkemî, li gorî şertên civakî, çandî û siyasî yên serdema xwe rê li ber gel vekirine û piştî tesbîta kêşeyên civatê, bi hunera helbestê, rê nişan dane û çareserî pêşniyaz kirine. Helbesta hikmetê ew helbest e ku giraniyê dide hizîrîn û tefekkurê. Helbesta hîkemî dixwaze ku xwendevan bifikire, birame û şa’ir dixwaze ku xwendekarê xwe jî gelek aliyan ve hişyar bike û ronî bike. Bi van helbestan xwendekar xweşiyê, rindiyê, başiyê û qenciyê dinase. Şa’ir bi awayekî dîdaktîkî helbestên xwe dihûne. Hin jî helbestên hîkemî, şa’irnavend in. Ango şa’ir ‘ewil xwe şîret dike û berê xwe dide heqîqetê. Bi xwe re jî herwekî ku bêje: “ey xwendekar, eger we jî hewce hebe, guh bidinê.”

Di edebiyata kurdî ya klasîk de, raman xurt e û jê re tefekkur û tedebbur hatiye gotin. Hikmet jî encama vê tefekkurê ye. Li gorî vê nêrînê, di gerdûnê de tesaduf tune ye. Her tişt bi hikmet hatiye afirandin û her heyînek (çi biruh çi bêruh) xwedî erkeke cuda ye. Gerdûn jî roja ku hatiye afirandin ta îro, di hundirê xwe de gelek ‘ecêban dihevine. Însan jî jî ber ku xwedan şîyan û eql e, bi lêgerîn û lêkolînan, xwe digihîne encamên tefekkurî û hikmeta hebûn, bûyîn û kirinên gerdûnê. Ji ber ku Quran û Pêxemberê Xweda (s.x.l.) rêbertiyê dîkin, bi alîkariya van du hêzan, şa’iran xwe li pêlên deryayên gerdûnê dane û jî gerdûnê û jî afirandinê û jî aferîdeyan pirsîne. Di encama van xwendinan



de hikmeta eşya, hikmeta hebûnê û raza afirandinê keşif kirine, yan xwestine ku keşif bikin. Encamên ku bi destê wan ketine jî, li ser rûpelên kaxezan, wekî helbest ji me re hiştine. Ango ev sirrên xefî, bi helbestan anîne zimên û derdora xwe ronî kirine. Ji ber vê çendê wekî zanistên din di edebiyatê de jî ciyekî giring ê hikmetê heye. Di vî warî de şairan di dîwanên xwe de helbestên hîkemî nivîsîne. Helbestên 'ilmî, 'arifî û yên ku tê de raz û sirr veşartî ne û yên ku bi hindik gotinan û wateyên pir kûr di xwe de hewandine bûne mijar ji helbestên hîkemî re. Helbesta hîkemî xwendevan dide fikirandin, ramanê geş dike. Helbesta hîkemî rê li ber xwendevan vedike û şîretan dike. Lewra di Qurana Pîroz de dema di sûretê Luqman de dibêje "Me hikmet da Luqman..." peyre nesîheta şukrê dike.

Bêguman her şairek kurê serdema xwe ye. Di serdema xwe de perwerde bûye û bi kêşeyên civaka xwe re rû bi rû maye. Civaka ku şair xwedî kiriye, xwediyê helbesta wî şairî ye jî. Yanî helbesta şairekî, felsefeya jiyanê û ramana serdest a cîhana wê serdemê nîşan dide. Li ser vê esasê helbesta hîkemî jî ji civaka xwe dertê û rênîşanderê civaka xwe ye. Çawa ku edebiyat têkiliyeke xurt heye bi civakê re, wisa jî helbesta hîkemî jî ji derûniya vê têkiliyê diwelide. Bo nimûne exlaq stûnek e ji bo civakekê. Loma jî ev xusûsiyet di helbesta hîkemî de ciyekî mezin werdigire.

3. Cûreyên Şî'ra Hîkemî bi Numûneyên ji Şî'rên Melayê Cizîrî

Hikmet di hundirê xwe de wateyên berfireh werdigire. Sirr û razên tenegehiştî yan ên ku bi zehmetî tene famkirin, herwiha bûyerên ku ji layê însanan ve pir bi hêsanî nayên famkirin di nava wê de hene. Ji vê perspektîfê ve di helbesta Melayê Cizîrî de hikmet numayan dibe.

Helbesta Melayê Cizîrî helbesteke nepenî ye. Di wê de raz û sirrên xefî zêde ne. Mela wehya xwe ya şîirî bi rêya 'eqlî û dilî re bi ser nefsê de berdide, ziman û hêza wî dikete wê teraziya hizr û peyvên xwe pê dikêşit û dipîvit.



3.1. Şî'ra Şîretê

Helbesta şîretê ya hîkemî, cureyekî giring a edebiyata kurdî ye ku bi armanca pêşkêşkirina şîret, pend û amojgariyên jiyanê tê nivîsîn. Ev helbest, zanîn û tecrûbeyên jiyanê bi awayekî hunerî û bandorker pêşkêşî xwendevanan dike. Helbesta şîretê ya hîkemî bi piranî behsa mijarên exlaqî û civakî dike. Di van helbestan de hewlek heye ku rê nîşanî mirovan bide û wan ji kiryarên nebaş dûr bixe. Mijarên mîna rêzgirtina li hemberî mezin û 'aliman, dûrketina ji derewan û xapandinê, giringiya rastgoyî û dîlpakiyê, û rêzgirtina li hemberî nîrxên civakî di van helbestan de cihekî giring digirin. Di helbesta şîretê ya hîkemî de, behsa têkiliyên mirovan ên bi Xwedê re jî tê kirin. Helbestvan şîretê li mirovan dike ku ew Xwedê ji bir nekin, îbadetên xwe bi cih bînin û li gorî fermanên Xwedê bijîn. Ev alî, bi taybetî di helbestên helbestvanên sofî de tê dîtin. Helbesta şîretê ya hîkemî herwiha behsa fanîbûna jiyanê û giringiya amadebûna ji bo jiyana piştî mirinê jî dike. Ev cure helbest di nav dîwana Mela de di gelek malikan de rû dide. Bo numûne:

314

Dil bişo tu ji vê nifaqê ku bidit sîne beraqê
Bi sefa hemrehê erbabê dil û ehlê sefa be

Ev malik derbarê paqijiya dil û hevaltiya rast de ye. Ev beyt giringiya paqijkirina dil ji durûtî û riyakariyê û pêwîstiya hevaltiya bi kesên xwedî îrfan re destnîşan dike.

Dil, emanet, da bi naehlan nedî
Lê bi naehlan me da gewher 'ebes

Da di seyra 'îşqê dil bê dilber neçî
Lê dîbit seyra te bêdilber 'ebes

Ev malik hişyarî dide da ku dilê xwe nedin kesên neehil, çinku ew gewherê bê qîmet dikin. Herwiha şîret dike ku di rêya evînê de bêtî dildar her tişt bê kêr e û xebata bêtî armançê winda ye. Bêguman ji Dîwana Mela malikên şîretamîz gelek in, ev mijar bi tena serê xwe jî dibe gotareke berfireh.

3.2. Şî'ra Rexneyê ya Hîkemî

Şî'ra rexneyê ya hîkemî, cureyekî edebî ye ku di nav xwe de hem rexne, hem jî hikmetê (şîret, pend û zanîna kûr) dihevine



û bi armanca rexnekirina hin cureyên mirovan, tevger û nêrînan tê nivîsandin. Armanca sereke ya vî cureyê helbestê ew e ku rêya rast, hikmet û nêrîneke aqilane pêşkêşî xwîner bike. Ev cure helbeste, bi taybetî di edebiyata kurdî û rojhilatî de cihekî girîng digire. Taybetmendiyên sereke yên vê helbestê ev in; Ev şî'r re-wşên civakî, siyasî yan jî exlaqî rexne dike û kêmasiyên wan derdixe holê. Di heman demê de, ev şî'r şîret û pendên giranbiha pêşkêş dike ku ji bo jiyaneke baş û bi exlaq rê nîşanî mirovan dide. Helbestvan di vî cureyê de, bi rexneya rasterast û berawirdiyan, xwîneran dide fikirîn, neyîniyên di halên mirovî de nîşan dide, û armanc dike ku ji wan ders bîne girtin û bigihîjin hikmetê, ango agahiya rast, têgihîştina rast û exlaqekî bilind. Di vê şî'rê de gelek caran bi rêya metafor, îstîare û sembolan mijar tê vegotin û bandora wê zêdetir dibe. Armanca vê şî'rê ne tenê rexnekirin e, lêbelê rêberiya mirov ber bi rastî, exlaq û başiyê ve ye. Bêguman Melayê Cizîrî yek ji nûnerên herî giring ê vê helbestê ye. Derbarê dadgehkirin û nirxandina rastî de Mela wiha dibêje;

Min di baxê gulfiroşan dî 'eceb resmek xerîb
Xariteb'an gul di dest in gulperistan xari bes

315

Camid çi ket bi husnê ku wan nezer li xwar e
Xerteb'etên di ebleh çi nêrgîz û çi kerbeş

Kor e xwe nasipêrit carek bi des[t] delîlan
Ebleh çi ket tewafê nabînitin Berê Reş

Vêzar dibit ji qencan ji remz û naz û xencan
Qedre gulan çi zanit kerbeş divêt kerê reş

Ev malik, bi rexnekirina hin tevger û nêrînên ehmeqî û bêzevqiyê, xwîneran teşwîq dike ku qîmeta rastî a tiştan fêm bikin û ji durûtî û rûxariyê dûr bikevin. Şîret dike da ku mirov rastiye bibîne û nîrxê tiştên hêja bizanibe. Ev malikên Mela yên li jor, di çarçoveya kevneşopa helbesta "hîkemî (hîndekarî) û rexneyî (tenkîdî)" de mînakên baş in. Helbestvan, bi rexnekirina hin cureyên mirovan, tevgeran û nêrînan, armanc dike ku rêya rast, hikmet û nêrîneke aqilane pêşkêşî xwîneran bike.

3.3. Şî'ra Tesewifî ya Hîkemî

Helbesta tesewifî ya hîkemî, şaxeke giring a edebiyata



III. ULUSLARARASI MELAYÊ CİZÎRÎ SEMPOZYUMU

kurdî ye ku hikmet û zanîna tesewifî di nav xwe de dihewîne. Ev cure helbest, têkiliya mirovan a bi Xwedê re, rêwîtiya menewî ya mirovan û rastiyên gerdûnî bi çavekî tesewifî dinirxîne û pêşkêş dike. Di helbesta hîkemî ya tesewifî de, helbestvan bi piranî behsa têgihên tesewifî yên mîna “wahdet-ul wucûd” (yekîtiya hebûnê), “fenafillah” (windabûn di Xwedê de), “seyr û sulûk” (rêwîtiya manewî) û “meqamat” (qonaxên manewî) dike. Ev têgih, bingeha ramanî ya helbesta hîkemî ya tesewifî pêk tînin û hewl dide ku van têgihan bi zimanekî edebî û hunerî pêşkêş bike. Bo nimûne, Melayê Cizîrî di Dîwana xwe de gelek caran behsa evîna îlahî dike û vê evînê wekî rêyeke gihaştina Xwedê dibîne. Di helbesta hîkemî ya tesewifî de, evîna îlahî cihekî taybet digire. Di vê çarçoveyê de, gelek caran evîna mecazî (evîna mirovî) wek pireke ber bi evîna heqîqî (evîna îlahî) ve tê bikaranîn. Herwiha, di helbesta hîkemî ya tesewifî de, behsa giringiya terbiyekirina nefse, giringiya rêber/murşîd/pîr jî tê kirin. Dîwana Mela mişt bi van mijaran dagirtiye. Bêguman gelek helbest û gelek malik dikare li vir bîn komkirin, lê ev derî sînore gotara me ye. Loma em ê çend malikan wekî nimûne bidin û derbasî binbeşeke din bibin. Bo nimune:

316

‘Aşîq er carek ji bala lê bedit berqa mecaz
Dê li nik sahibdilan hetta ebed bit serfiraz

Keşfê esrara sifatan bêmehebbet nabitin
Sûretê esma divêtin da biken jê fehim raz

Lami’a husn û cemalê dê ji ‘ilmê bête ‘eyn
‘Îşq da jê hilbitin kî dî heqîqet bêmecaz

3.4. Şî’ra Razî û Sirrî ya Hîkemî

Şî’ra razî û sirrî ya hîkemî, cureyekî taybet a helbesta hîkemî ye ku bi taybetî li ser raz, sirr û veşartiyên gerdûnî, îlahî û derûnî disekine. Ev cure helbest, hewl dide ku perdeyê ji ser rastiyên veşartî rake û xwendevan ber bi têgihiştineke kûrtir a hebûnê ve bibe. Di helbesta razî û sirrî ya hîkemî de, helbestvan bi piranî behsa razên hebûnê, sirra afirandinê û veşartiyên têkiliya mirovan a bi Xwedê re dike. Ev mijar, bi awayekî hunerî û bi zimanekî sembolîk tînin pêşkêşkirin, ji ber ku ew bi piranî mijarên razî ne loma jî bi zimanê asayî nayên îfadekirin. Melayê Cizîrî



di Dîwana xwe de gelek caran behsa razên îlahî kirine û hewl daye ku van razan bi rêya metafor, teşbîh û sembolên taybet pêşkêş bike. Wi di gelek helbestên xwe de behsa sirra «wahdet-ul wucûdê» (yekîtiya hebûnê) kiriye û ev sirr wekî razeke mezin a hebûnê dîtiye. Di helbesta razî û sirrî ya hîkemî de, têgihên wekî «sirr», «raz», «xeyb» (nediyar), «batin» (hundirîn) û «zahir» (derveyî) cihekî giring digirin. Herwiha, di helbesta razî û sirrî ya hîkemî de, behsa tecrûbeyên manewî û derûnî yên taybet jî tê kirin. Helbestvan, tecrûbeyên xwe yên manewî, wekî keşf, îlham û şuhûd (dîtina bi çavê dil), bi awayekî hunerî pêşkêş dike. Bo nimûne:

Tu j'Melayê Bohtî pors esrarê 'îşqê ew dibêt
Vê mu'emmayê çi zanin sed mela û muste'îd

Keşfê esrara sifatan bêmehebbet nabitin
Sûretê esma divêtin da biken jê fehim raz

Helbesta razî û sirrî ya hîkemî, bi taybetî di nav edebiyata tesewîfî ya kurdî de cihekî giring digire. Ev cure helbest, hewl dide ku mirov ber bi naskirina razên hebûnê û sirra afirandinê ve bibe û bi vî awayî têgihîştineke kûrtir a jiyanê pêşkêş bike. Ev cure helbest, di edebiyata kurdî de cihekî giring digire û ji bo têgihîştina ramanên kûr ên felsefî û tesewîfî yên kurdî jî çavkaniyeke hêja ye.

317

Naverokên helbestên razî û sirrî kûr û ezoterîk in. Di malikên li jêr de, Mela behsa wan kesan dike ku dixwazin heqîqetê bi rêya qiyas (analogî) û zanîna rûxarî fêhm bikin. Ew dibêje ku Şêxê Sen'anê, tevî ku bi çîroka xwe ya evînî ve naskirî ye, "mey nenoşî xelet" (şerab xelet venexwar), yanî di rêya xwe de xeletî nekir, ji ber ku tecellaya heqîqetê dît. Ev malik wê yekê teqez dike ku gihîştina heqîqetê bi dîtina tecellayê pêk tê, ne bi raman û qiyasan. Ji bo têgihîştina razên evîna îlahî, pêwîstî bi tecrûbeya rasteqîn heye, ne bi texmîn û xeletîyan.

Mey nenoşî Şêxê Sen'anê xelet
Ew neçû nêv Ermenistanê xelet

Mislê Mûsa wî tecellaya te dî
Ê tu dî kanî xeta kanî xelet



Wî nedî bejna te û danî qiyas
Hikmetê lew çûne burhanê xelet

Setweta Leylê yeqîn Mecnûn teband
Wer ne da naket beyabanê xelet

Wek Nîşanî neqş û nîşanek te dî
Ê ku nîşanek te dî kanê xelet

4. Şî'ra "Kes Bi Dada Me Nepirsit" û Şerha Wê ya Hîkemî

Divê beşê de em ê helbesteke Mela ji aliyê wateya wê ya hîkemî ve binirxînin. Lewra di Dîwanê de bi sedan malikên hîkemî hene, lê helbestên ku serdanpê ji hîkemiye dagirtî bin kêma in. Ev helbesta li jêr ku em ê şîrove bikin yek ji wan helbestên Melayê Cizîrî ye ku hîkmet ji hundurê wê dinuqute.

(1)

318

Kes bi dada me nepirsit, gilleh û dadi çî ket
Te nebit dadiresek, bêhûde firyadi çî ket

Di vê malikê de, Mela qala valahiya gilî û gazine bêsîyê dike ku haya wî ji wan nîne yan jî kesekî wisa tune ku wan bigihîne dadê. Hikmeta vê beytê ev e ku dadweriya rastîn, bêyî hebûna dadwerekî heq yan jî pergala ku dadê bi cih bîne, ne mimkin e. Feryad û gazine bêarmanc û bêyî ku kesek wan bibihîze yan jî bikaribe çareser bike, tenê heweseke bêencam e. Ev şîretek e ku di doza heqîqetê de, divê mirov li dadwerekî rastîn bigere, yê ku dikare heqîqetê bibîne û dadweriyê bike, weger na, daxwaza dadê vala dimîne.

(2)

Bi Şîrînê negehit destî, eger Rustemî bit
Dê bi bazûyê milan, şubhetê Firhadî çî ket

Mela di vê malikê de hêza fîzîkî bi hezkirin û eşqa heqîqî re dide ber hev. Rustem, sembola hêza bêhempa ya bedenî ye. Lêbelê, heke destê wî negihîje Şîrînê, angê heke armanca wî ya dil nedestkeftî be, hêza milên wî çawa dikare bi Ferhad re bibe mînak? Ferhad, tevî ku bi hêza laşî ne wekî Rustem bû, bi eşqeke kûr û îradeyeke bêdawî çiya koland. Hikmeta vir ev e ku di rêya



heqîqetê û armancên mezin de, hêza bedenî yan jî dewlemendi-
yên dinyayî ne bes in. Ya giring, eşq, cehd, îrade û fedakarî ye ku
dikare bi ser zoriyên mezin bikeve û bigihîje armancên bilind ên
ruhî û menewî.

(3)

Fa'ilek lazim e da fi'l û eser peyda bibit
Ger tu heddadi nebî kûreyê heddadi çi ket

Ev malik giringiya “faîl” anga ya kirdeyê (kesê ku kar dike)
di pêkanîna her karekî de destnîşan dike. Ji bo ku karek (fi'l) û
bandorek (eser) çêbibe, pêwîst e kesek hebe ku wê bike. Wekî
mînak, heke tu ne hesinkarek (heddad) bî, kûreya hesinkariyê
(kûreyê heddadiyê) çiqasî germ be jî û amade be jî, nikare tiştekî
hilberîne. Hikmeta li vir ev e ku potansiyel û amûr bi serê xwe
têrê nakin; divê kesekî jêhatî û xwedî îrade hebe ku wan bi kar
bîne. Di rêya zanîn û hikmetê de jî, amûrên zanînê bi serê xwe ne
bes in; divê kesekî xwedî îrade û jêhatî hebe ku wan bi kar bîne
û bigihîje encamê.

(4)

Mumkinêk dê hebitin, da ku teleb hasil bit
Seyd û nêçîr ku nebin, tûleyê seyyadi çi ket

Mela di vê malikê de qala pêwîstiya hebûna “mimkin”ê
anga tiştekî dike ku dikare bê xwestin yan bi dest bikeve. Ji bo ku
daxwazek (teleb) pêk were, divê tiştek hebe ku bê xwestin. Wekî
mînak, heke nêçîr (seyd û nêçîr) tunebe, tûleyê (kûçikê nêçîrê)
nêçîrvan (seyyad) çiqasî zîrek be jî, wê çi karî bike? Hikmeta vir
ev e ku di rêya giyanî de jî, divê armanceke heqîqî û gihiştî hebe
ku mirov li pey wê biçe. Ger armanc ne diyar be yan jî ne mum-
kin be, her cure hewldan vala ye.

(5)

Her gil û seng dibitin zêr bi tedbîrê hekîm?
Qabiliyyet ku nebit, hikmetê ustadi çi ket

Ev malik, sînorên zanîn û hikmetê destnîşan dike. Mela dip-
irse: “Her ax û kevir bi tedbîra (plana/zanîna) hekîm (zanayekî)
dibin zêr?” Bersiva hîkemî ev e: “Qabiliyet (şiyana hundirîn) ku
nebe, hikmeta (zanîna) hostayî (ustadi) wê bi kêrî çi bê?” Ev tê vê
wateyê ku herçiqas mamoste û rêberê menewî (wekî hekîm yan



ustad) xwedî zanîn û jêhatîbûneke mezin be jî, eger ê ku tê hînkirin (ax yan kevir/xwendekar) xwedî şîyan û jêhatîbûna guherînê nebe, wê zanîn bi serê xwe têrê neke. Hin tişt, ji ber cewhera xwe, nikarin bîn guhertin. Hikmeta li vir ev e ku ji bo pêşveçûna ruhî, ne tenê zanîna rêber, lê di heman demê de qabiliyeta xwendekar jî pir giring e.

(6)

Kan bi gewher çî bikît, gewher eger paki nebit
Ku besîret te nebit, sîretê ecdadi çî ket

Di vê malikê de, Mela qala giringiya cewherê (esil) û paqîjiya hundirîn dike. Kan (maden) çiqasî dewlemend be jî, eger gewhera (cawherê) wê pak û qîmetdar nebe, bi kêr nayê. Siruşt derve bi serê xwe ne giring e, ya giring paqîjiya hundirîn a cewher e. Risteya duyem vê ramanê berfireh dike: “Ku besîreta (dîtina hundirîn, feraset) te nebe, sîreta (kevneşop, taybetmendiya) bav û kalan (ecdad) bi kêrî çî tê?” Ev şîretek e ku rastiya mirov ne ji paşxaneyê wî yan jî ji kevneşopên bav û kalan tê, lê ji dîtina wî ya hundirîn û feraseta wî ya kûr tê. Bêyî besîretê, kevneşop û paşxane vala dimînin.

(7)

Zêr û zîwer dikirin celbê qulûban? haşa
Husn û sir zati nebit, qametê meyyadi çî ket?

Mela di vê malikê de nîrxên dinyayî rexne dike. Ew dipirse: “Gelo zêr û zîwer (zêrîn û xeml) dilan celbê dikin bi bal xwe ve?” Bi peyva “haşa” (ne-ne, Xwedê neke) bersiva vê pirsê dide, destnîşan dike ku ev raman şaş e. Hikmeta li vir ev e ku dilên mirovan ne ji hêla dewlemendî û xemlên derveyî ve têne kişandin, lê ji hêla bedewiya rastîn (husn) û sira (razê) cewherî (zati) ve têne kişandin. Heger bedewiya hundirîn û razêke kûr tunebe, bedewiya laşî (qametê meyyadî) bi kêrî çî tê? Ev şîret dike ku mirov divê li bedewiya hundirîn û rastiye bigere.

(8)

‘Aşîqê mestê bi ‘îşqê, niye hacet bi meyyê
Waridê warid û ehwalî bi ewradî çî ket

Ev malik giringiya hal û rewşa ruhî ya bilind diyar dike. Kesê ku bi eşqa (hezkirina) rastîn/heqîqî serxweş bûye û mest



bûye, ne hewceyî meyê ye ku wî mest bike. Eşqa wî bi serê xwe têra wî dike. Hikmeta vê malikê ev e ku dema mirov gihîştiye re-
wêşke menewî ya bilind, mîna dîtina “warid” (îlhamên xwedayî)
û “ehwal” (halên ruhanî), ew êdî ne hewceyî ewrad (dûa, zîkrên
rûtîn) e. Çimkî ew ji hundir ve bi Xwedê ve girêdayî ye û ji rêya
rasterast feyzê digire. Ev rexneyek e li ser îbadetên rûtîn ên bêgi-
yan û giringiya tecrûbeyî giyanî ya kûr tîne zimên.

(9)

Te xered vêkktina yek weliyek murşîdi bit
Salikê talibê îrşadê, bi Bexdadi çi ket?

Di vê malikê de, Mela qala giringiya armanca rastîn a di rêya
menewî de dike. Heke armanca te ew e ku tu bigihîjî welîyekî
murşîd (rêberê giyanî yê heqîqî), wê demê salik (rêwiyê rêya
heqîqetê/Xweda) yê ku li îrşadê (rêberiyê) digere, bi Bexdadê
(bajarekî navdar ê zanîn û cihê ‘aliman) çi kar dike? Hikmeta
vir ev e ku di rêya tekamul a menewî/ruhî de, cihê erdnigariyê
yan jî navûdengê cihê zanînê ne giring e. Ya giring, peydakiri-
na rêberê rastîn e ku dikare dil û giyanê te rêber bike. Riya
heqîqetê ne bi gihîştina cihan, lê bi gihîştina kesên rastîn ve têkil-
dar e. Hikmet ev e ku rêber di jiyana rojane de jî û di ya ji bo ax-
retê de jî û ji bo merheleyên tesewîfê jî pêwîst e. Bê rêber xeterên
rêyên jiyane gelek in.

321

(10)

Cehd û se’y û telebi bêeserek safî nehin
Tu nebî perdenişîn, çaker û qewwadi çi ket

Mela di vê malikê de giringiya hewldanên bibandor diyar
dike. Cehd (xebat), se’y (hewldan) û teleb (daxwaz) bêtî en-
camekê (bêeser) nikarin paqij û rast (safî) bin. Hewldanên ku tu
encamekê nadin, bê qîmet in. Di risteya duyem de vê ramanê kûr
dike Mela: Heger tu bi xwe “perdenişîn” (kesekî ku bi tena serê
xwe di nepenîtiyê de ji Xwedê re îbadet dike, kesekî ku ne hew-
ceyî navbeynkariyê ye. Wateya perdenişîn; ewê ku li ciyê xewle û
biperde rûniştî, ehlê iffet û ismetê, munzewî ango di du hucreyî
xwe de bi dîr ji cîhaniyan e.) nebî, ango heke tu nikaribî bi xwe
bigihîjî armanca xwe ya menewî/ruhî, wê demê “çaker” (xizmet-
kar) û “qewwad” (navbeynkar, pêxember) çi kar dikin? Hikmeta
li vir ev e ku di rêya tekamul a menewî/ruhî de, hewldana kesane
û niyeta rastîn pir giring e. Heke mirov bi xwe ji hundir ve ne



amade be, navbeynkariya derve nikare wî bigihîne armanca wî.

(11)

Çi eser dê li berê xare biket qetreyê ab
Qelemê ma bi du-sê qetreyê zehha dê çi ket

Di vê malikê de, Mela qala bêserûberiya hewldanên bêkêr dike. Dilopek av (qetreyê ab) dikare çi bandorekê (eser) li ber kevirê hişk (xare) bike? Tişteki ne mimkin e. Wekhevî bi vê mînakê re, “qelemê me” (qelema helbestvan) bi du-sê dilopên zuha çi kar dike? Hikmeta li vir ev e ku ji bo ku karên mezin bên kirin yan jî astengiyên mezin bên derbaskirin, pêwîstî bi amûrên têr û hewldanên mezin heye. Hewldanên biçûk yan jî amûrên kêrî nîkarin encamên mezin bidin. Ev şîret dike ku ji bo gihîştina armancên mezin, divê mirov bi têra xwe amade be û hewl bide.

(12)

Dê ji Heq cazîbeyek dil bigirit wer ne Mela
Ji ezel ger tu hidayet nebit, îrşadi çi ket

322 Malika dawî, encama hemî hikmetên berê ye û rastiyeke kûr a esasên rêya menewî eşkere dike. Mela dibêje: “Dil ji Xwedê (Heq) cazîbeyekê (kişandinekê) digire, wekî din, Mela...” Heger ji ezel (berî her tiştî) Xwedê tu hidayet (rêberî) neke, wê demê îrşad (rêberiya mirovên din) çi kar dike? Hikmeta li vir ev e ku bingeha her pêşveçûna giyanî, bi xwe cazîbeyê Xwedê û hîdayeta Wî ye. Eger Xwedê bi xwe dilê mirov ber bi rastiye ve nekişîne û rêberiya wî neke, wê demê her cure rêberiya derve û hewldanên mirovan bê encam dimînin. Ev destnîşan dike ku her tişt bi qeder û qismeta Xwedê ve girêdayî ye û hidayet ji Wî tê. Di vê beyta dawî de helbestvan, giringiya ‘înayet û hîdayeta îlahî ya di rêya tesewwufê de destnîşan dike. Herçend ku xebat û cehdên ‘evdî giring bin jî, ya ku temamker e, cezbeya Heq û hîdayeta Wî ye. Bêyî vê cezbe û hîdayetê, ne îrşada murşîd û ne jî xebata salîk dikare encamekê bide. Helbestvan li vir, heqîqeta rêwîtiya manewî diyar dike ku heta bi dawî jî li ser ‘înayeta îlahî ava dibe. Ev beyta dawî, di heman demê de îtîrafa helbestvan a aciziya xwe û hewcedariya mutleq a ‘înayeta îlahî ye. Helbestvanê ku di seranserê helbestê de evîna îlahî, me‘rîfet û heqîqet terennûm kiriye, di nefesa dawî de dîsa behsa ‘ecza ‘evdî û destpêka ‘înayeta Heq dike û kelama xwe temam dike.



Encam

Di vê xebatê de, me helbesta hîkemî, bi giştî ya edebiyata kurdî, bi taybetî ya Melayê Cizîrî, bi awayekî berfireh û analîtîk nirxand. Hikmet, wekî zanîna kûr û têgihîştina rastiyên jiyanê, di edebiyata kurdî ya klasîk de cihêkî giring digire. Me dît ku têgeha hikmetê ji Quran û hedîsan dest pê kiriye û bi demê re di qadên curbicur de (wekî felsefe, edebiyat, exlaq) hatiye bikaranîn. Di vê çarçoveyê de me qada helbesta hîkemî dabeşî çar beşên sereke kir: şî'ra şîretê, şî'ra rexneyê ya hîkemî, şî'ra tesewîfî ya hîkemî û şî'ra razî û sirrî ya hîkemî. Melayê Cizîrî, bi helbestên xwe yên hîkemî, ne ku tenê nirxên exlaqî û civakî pêşkêş kirine, herwiha wî, ramanên kûr ên felsefî û tesewîfî jî bi zimanekî hunerî vegotine. Hat dîtin ku Mela di her çar cureyên helbesta hîkemî de jî hosteyekî mezin e û helbestên wî di van qadan de wekî nimûneyên bijare ne.

Helbesta “Kes Bi Dada Me Nepirsit” mîna keke baş e ji bo têgihîştina hizra hîkemî ya Melayê Cizîrî. Di vê helbestê de, mijarên mîna hebûna/tunebûna dadweriyê, giringiya armancên ruhî, pêwîstiya rêberiyê û bandora tecrubeyên giyanî bi awayekî hêja hatine vegotin. Her malik xwedî hikmeteke taybet e ku mirov dikare ji wan dersên jiyanê bigire. Di encamê de, dikare bê gotin ku helbesta kurdî ya hîkemî, bi taybetî ya Melayê Cizîrî, çavkaniyeke giring e ji bo têgihîştina ramanên kûr ên felsefî, exlaqî, û tesewîfî. Helbestên kurdî yên hîkemî, ne tenê ji bo demekê, lê ji bo hemû deman derbasdar in û dikarin rêberiyê bikin ji bo mirovên hemû serdeman. Bi kurtasî, ev gotar nîşan dide ku edebiyata kurdî ya klasîk, bi taybetî helbestên Melayê Cizîrî, xezîneyeke dewlemend a hikmetê ye ku hêjayî lêkolînên berfirehtir e. Ev xezîne, dikare ji bo nifşên nû bibe çavkaniyeke giring a zanîn, şehrezayî û rêberiyê.

Çavkanî

Akgül, Halil. “Tema Ê Hêmanên Felsefî Di ‘Ey Av Ê Av’a Feqiyê Teyran De.” *The Journal of Mesopotamian Studies*, no. Özel Sayı (October 9, 2023): 160–72. <https://doi.org/10.35859/jms.2023.1262796>.



Doski, Tehsîn İbrahîm. “Eşqa heqîqî û mecazî di navbera Melayê Cizîrî û Feqiyê Teyran de”. Di Kitêba Feqiyê Teyran de, edîtor: M. Jiyan & M. X. Sadînî. 2012.

Emin, Ahmet. “Arap Edebiyatında Hikmet”. Wergêr: Zeynep Arkan. Sakarya Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Dergisi, 14(26), (Aralık 2012): 213-17. <https://doi.org/10.17335/suifd.72051>.

Gazali, İmam-i İhya. Wergêr M. Çağrıcı. Weşanên DİB, 2020.

Kutluer, İlhan. “Hikmet.” In DİA, 1997. <https://islamansiklopedisi.org.tr/hikmet#1>.

Nursî, Saîd. Mesnevi-i Nuriye. Weşanên Yeni Asya, 2013.

Remo, Mihyeddînê Mihemedê. Gotinên Pêşiyên Kurdan, Bi Zimanê Gundan. Weşanên Nûbihar, 2023.

Salahî, Mehmet. Kamus-ı Osmani C.1. Edîtor: A. Birinci. Weşanên Yazma Eserler Kurumu, 2019.

324

Çavkaniyên Dînî

Quran, Sûretê Beqere, 2:216, 2:269.

Quran, Sûretê Şuara, 26:224-227.

Quran, Sûretê Rehman, 55.

Quran, Sûretê Mülk, 67:3-4.

Quran, Sûretê Lokman, 31:12.

Buxarî, “Edeb”, 90.

İbn Mace, «Zuhd», 15; «Edeb», 41.

Tirmizî, “İlim”, 19; “Edeb”, 69.



D1 Nêrîna Melayê Cizîrî da 'Aşîq û Me'şûq û Reqîb Ayhan Tek*

Destpêk:

Nerît û hunera şa'irane û sêbareya 'eşqê

Di şî'ra klasîk da şarazabûna şa'iran peywendî digel pabendbûna wan ya ligel nerîtê ve diyar dibit. Anko şa'ir çend peyrew û pêygirê wê nerîtê bit hind digehîte asta bilind û alaya şî'ra xwe radikire ewcan. Wêca di nav edebiyateke ku qalib û qaideyên mehdud û diyarkirî da bo geheştina asteka bilind pêvîstî bi zanîneke kûr û motîvasyon û ilhameke qewî heye. Di vê çarçoveyê da mirov dişet bibêjît ku Melayê Cizîrî ne tenê di nav şî'ra Kurdî da belkî di nav şî'ra giştî ya Klasîk da şa'irekî hêhemta ye. Ji ber wê jî divêtin şî'r û hunera wî, ne tenê di nav estetîkeke teng ya bi navê "şî'ra Kurd" yan jî "edebiyata Kurdî" da bête terîfkirin. Loma ewî bi metna xwe ya kanonîk ve mîladek dana ku Mela bi dîwanekê hem kanoneke wesa ava kir ku serdema şî'ra Klasîk hat û çû û borî şa'irekî wekî wî nehat. Lê ji aliyê dî ve tesîra wî hêj jî berdewam e ku wî hema bêje temamê berhemên şa'irên piştî xwe yanî metnên edebiyatekê--bi qewlê Terry Eagleton--xesandine û qusandine. Anko çawa Eagleton ji bo civatên Bisirman dibêjît ku *Qur'an* asta herî bilind ya i'cazê ye û ji ber wê jî *Qur'anê* hemû metnên Bisirmanan di bin siya xwe da hêlane (Eagleton 1981: 67), mirov dişet heman otoriteya kanonîk li ser *Dîwana Melayê Cizîrî* jî bibêjît. Wêca ji bo ku qedrê vê dîwanê û hunera di wê berhemê da bête zanîn divê muqayese û xwendinên li dor *Dîwanê* digel hemkûfê wê bêne kirin. Anko têgeheştina *Dîwanê* ancax bi muqayese û xwendinên digel metnên kanonîk ve mumkin e. Çunku Melayê Cizîrî di burc û şaneşîneke wesa da wan meseleyan vedibêjît ku ji bo famkirina te'rîfa 'eşqa Melayî û mahiyeta tîpên 'aşîq, me'şûq û reqîban

* Doç, Dr.; Zanîngeha Mûş Alparslanê, Beşa Ziman û Edebiyata Kurdî.



divêt kanon û çanda şî'ra Klasîk baş bête zanîn. Bi taybet jî gava mirov li ser wan hersê tîpan di *Dîwanê* da kûr dibît, mirov pitir bi şeh-per û baskê sifet-Huma û 'Enqawar yêt hunera Mela dihesît. Jixwe bi't-tabi'î metnên piştî Mela, bivê-nevê, çar-naçar di bin siya wî û berhema wî da mane. Herwekî ew dibêjit: *Bal û perên sifet-Huma saye li cebhetê numa* (Melayê Cizîrî 2012: 116).

* * *

Di wê edebiyatê da ya ku Mela pabendê wê ye, qalib, awa, sekl û muhtewa, hemî têkda xizmeta pênaseya rû û bejna yarekê diken. Di vê reqs û semaya vegotinê da mezmûn jî mîtolojî jî referansên dînî jî amûr in da ku ew bedewî û cindîtiya yarê diyar bibît. Wêca bi taybet di xezelên Melayê Cizîrî da 'eşqeke li dor sêbareyê peyda dibît ku ew jî meseleyeke kanonîk e. Di wê prîzmaya sê alî da li dor merkeza 'eşqê, gava 'aşîq dikevîte dafika me'sûqê, li ber wan tîpeke dî peyda dibît ku ew jî reqîb e. Wêca em berê xwe bidenê ka Mela wan tîpan çawa vedibêjît.

1. 'Aşîq

Di şî'ra Klasîk da herçend zêdetir wesfên yarê/dilberê li ber guhên me bikevin jî zêdetir em hay li dengê 'aşîqî dibin. Zor caran dengê şa'ir û 'aşîqî têkelêk dibin û şa'ir bi xwe jî di sûretê 'aşîqî da bang diket. Ji ber hindê jî li dor êşa fîraq û hicranê û li ser êrîşên yara hem xwûnrêj û hem mihriban em bi nalînê 'aşîqî dihesin.

Melayê Cizîrî di xezelên xwe da gelek caran xwe di kirasê 'aşîqekî da bibînit jî hin caran jî ew bi xwe te'rîfa 'aşîqî diket ku ka 'aşîq kî ye û divêt 'aşîq yêke çawa bit. Wekî gelek babetan Mela di nav kontekstên dariştî da vê yekê bi usûleke ji estetîkê têr-vexwarî izah diket. Loma jî te'rîfa 'aşîq û me'sûqan di yek qalibî da diket ku Mela wan di heman neynûkê da di yek sûretî da dibînit. Mela di yekîtiyê da 'aşîq û me'sûqî di ayîneya Heq da dibînit ku ew herdu, rûyê yekdîger in û di semaya yekîtiyê da ji yek Zati ne. Me'nayên wan cuda bin jî 'aşîq û me'sûq yekwucûd in. Digel wê Mela elbet di 'eşqê da jî otorîte ye ku wî bi çavê xwe, bi çesmê dilê xwe 'eşq dîtiye ku dişet hem 'eşqê hem jî 'aşîq û yarê te'rîf biket:



Me'nayê 'işqê bêm çi ye lew min bi çeşmê dil diye
'Eksa cemalek safî ye lami' di mir'ata me da
Husn û mehebbet zatek in **me'sûq** û **'aşiq** latek in
Lê sûret û mir'atek in her yek di me'nayê xwe da

Ger **dilber** û wer **'aşiq** in 'arif di qeyda sadiq in
Ayîneyê nûra Heq in cih cih di wan da cilwe da

'Aşiq ew e dilber ew e zahir ew e mezher ew e
Rûha rûhi we gewher ew e her şahidek durdane da

(Melayê Cizîrî 2012: 12).

Bi vî şiklî Mela geh bi gotina "Heq aşiqê zatê xwe bû" geh jî bi yekitiya 'eşqê da yek-zatbûna 'aşiq û mehbûbê vedibêjît ku têkiliya 'eşqa di *Dîwanê* da seranser li ser yekêtiyê ava bûye. Loma di te'rîfa 'aşiq û me'sûqê da cudahiyeke nîne, eger hebit ew jî cudahiyeke 'arizî ye ku esil yek e lê tenê sifetên wan cuda ne:

Me'sûq û 'aşiq herdu lat meczûbi yek dî bin sifat
Hîna ku bû yek îltîfat be'dek sifatan hisse da

(Melayê Cizîrî 2012: 22). (327)

Mela dibêjît "aşiq û me'sûqan ji meya Saqîyê 'eşqê hev re mey mêtîne." Herwisa *'Aşiq û me'sûq yek bûn şem' û hem perwane bû* (Melayê Cizîrî 2012: 164) ku Mela kontakta wan bi mezmûnên meşhûr ve pesend diket. Wekî dî ew muwafiq e li gel tradîsyona vê şî'rê ku di *Dîwana Mela* da jî 'aşiq li ber êşkenceyan e ku ew li hember pîşekariya yarê anko li ber nazê yarê herdem di nav sebr û niyazê da ye.

Mela di nav nerîta şî'ra Klasîk da 'aşiqê mewcûd yê klîşe tekrar kiribît jî wî têkiliya 'aşiq û mehbûb û 'eşqê ji nû ve saz kiriye. Ev tekra-re elbet bi estetîka şî'ra wî ve hatiye vegotin. Helbet Mela car car wekî pîrê 'eşqê; 'eşqê û wesfên 'aşiqan bi xwe te'rîf diket: *'aşiq divêt dil sade bît, xaka rêya yarê xwe bit* (198): *lew dil yek e dê eşq jî yek bit* (98).

Mela çawa ku ji bo yareke îdeal wesfên dilberê didet herwisa gava te'rîfa 'aşiqî diket bi sebr û siyaneta xwe ya li ser 'eşqê, xwe jî îdealîze diket ku di *Dîwanê* da çend caran îbareya "şubhet me" yan jî "şubhet Melê" hatiye.



2. Me'sûq (Dilber, Yar, Hebîb, Şahid...)

Dîwana Melayê Cizîrî ji gelek aliyan ve metneke balkêş û serkeftî ye. Yek tiştê balkêş jî ew e ku Melayê Cizîrî şiyaye ku wesfên yarê têr û tijî vebêjit ku ew wesf ji aliyekê ve hema bêje xulaseya vê tradisyona şî'rê û kakilê edebiyata Klasîk e. Di şî'ra Mela da yar serdarê xuban e, di semaya eşqê da horr û perî li dor wê cema dibin ku Mela konteksteke wesa ya ruhanî/mele-kutî çêdike ku di şî'ra wî da diyar dibît ku yar asimanî û pîroz e ku ew ne insan û beşer e. Lê gava Mela yarê bi wesfên insanan ve jî vedibêjit û wê nêzîkê insanan dike, wê care jî yar li burc û şaneşînên bilind da seyr û temaşayê dike. Anko ew siltan û şe-hîşah e. Rûyê wê yara şahid anko berhema pîroz (wek *Qur'an* û *Erjengê*), wekî kaxezên kitêbên pîroz in, xetên wê jî herwekî wan xettê kitêbê ne ku Mela wê exleb dişibînite xettê Reyhanî yê hûr. Dîsa yar ji aliyekê ve bê rehm û merhemet bit jî evene ji wesfên yarbûnê ne. Lewra yara ku Mela behsê jê dike, şah û padşah û siltan e. Ber wê çendê jî lutf û kerem û 'eta jî xesm û şûr û qetl û ferman jî her karûkiryarê yarê ne.

328

Mela di têkiliya sêbareyî da hin caran vegêraneke wesa dike ku yar li hember reqîbî piştewaniya 'aşîqî dike, lê hin caran jî ji telbîsa reqîbî 'aşîqê xwe di nav ezabê da dihêlit. Yar çawa ku di şî'ra Klasîk da wekî siltaneke ku devê wê girtî yanî zêde-ne-axiv tête vegotin, di *Dîwanê* da jî devê yarê wekî herfa mîmê biçûk e anko fermanan zêdetir bêdeng yan jî bi awiran didet. Herwisa xemze û gîrnijîna yarê yan jî vexwandina Mela ji aliyê wê ve exleb di fêslê biharê da ye. Mela wê yekê di beytên di konteksta biharê/newrozê da gelek xweş vedibêjit. Ji ber wê jî di xezelên Mela da yara ku ew behsê jê dike hin caran ji klîşeyan derdikevît û li ser uslûba Mela dikevîte kiraseke dîtir. Anko Mela çawa di şa'irtiyê da hosta û xwedan hêz e, di 'eşqê da jî gelek caran qaliban dişkênît ku yar 'aşîqê xwe vedixwunit. Di metnên dî da exleb 'aşîq melankolîk in û di malîhulyayê da xerb bûne. Herçend ew yek di profîla wî 'aşîqê di *Dîwanê* da jî bête dîtin ew her tim ne we ye. Yanî li şûna profîla 'aşîqekî lînear, profîla yekî dînamîk tête dîtin. Lewra 'aşîqê di *Dîwanê* da gelek caran jî bi ços û xuroş û mesrûr e ku bi min eve taybetiyeke girîng ya şî'ra Mela ye. Ji aliyê dî ve xaleke dî ya girîng ew e ku yar bi xwe jî ne yareke yek-rewîş e ku tenê li ser bayekê bit. Ji ber ku yara di *Dîwana Mela* da yareke çalak e ew herwisa yareke xwedan-karakter e jî. Ji ber wê jî Mela bi hostatî tîpan vediguhêzîte karakteran.



Ji ber wê herçend hin caran hebîb 'aşiqê xwe biêşînit jî hin caran jî wî mesrûr û sermestê wusletê diket. Çinku di dîdgeha Mela da ruh çalak e, yar jî herwesa çalak û dînamîk e. Digel wê yekê, di *Dîwanê* da 'aşiq—herwekî sofîyeke di nav xewf û recayê da xerq bûyî—geh mesrûr e geh rencûr e:

Şox û şepala leb ji qend ew nazika wey qenc û rend
Wê dil ji dil da der, vexwend, îro yeqîn Fexfûr e dil

Dil er ji te mesrûr bitin me dê ji Melê destûr bitin
Dê ket cehan pur nûr bitin lê daîma rencûr e dil (126)

Xala dûmahikê ya girîng di *Dîwanê* da wekî di metnên dî yên kanonîk da jî diborît, yar di esasê xwe ne jin e. Herçend retorîk û sifetên tene bikarînan di serê me xwûneran da îmaja wucûda jinekê çêbiket jî li gor qaideyên vê edebiyatê cinsiyeta hebîbê androjen e yanî ya xwedan-cot-cinsiyet e yan jî bê-cinsiyet e. Anko 'eşqa ku Mela behsê jê diket derveyî wucûda fizîkî ye. Bi taybet jî ew di xezelên bi redîfa "xet" da baş tete dîtin ku ev gengeşîye, mijara gotareke dî ye.¹

3. Reqîb

Dîwana Mela ji hin xalan ve hem di nav berhemên Kurdî da hem jî di nav yên Faris û Tirkî da cuda dibît. Yek ji wan xalan ya girîng jî têkilîya 'aşiq û reqîb û dildarê ye. Ew tîp yanî reqîb, di *Dîwanê* da bi kiryarên yarê şeklê xwe digirît. Wekî metnên dî yên vê edebiyatê, di berhema Mela da jî reqîb li ser emrê yarê dişet hereket biket. Ji ber wê jî ew wek karakter zêdetir girêdayê yarê ye. Lê gelek caran jî yar bi hereketên wî yên tijî bi telbîsî û fesadî, tesîr çêdibît û ew xwe ji 'aşiqî dûr diêxît. Helbet divêt nehête jibîrkinî reqîb hem di mesnewiyên wekî *Mem û Zînê* da hem jî di xezelan da temam-kerên 'eşq û evînîyê ne ku erkê wan zêdetir kemilandina 'eşqê ye. Ji ber wê jî di çarçoveya giştî ya vê şî'rê da reqîb, di çarçoveya "muhafiz", "dergevan" û "parêzer" da tete dîtin ku "muraqebe" û "muraqib-bûn" hevwate ne. Lê Mela ev me'na ye—ku zêdetir di numûnên Farsî da hene—di helbestên xwe da bikarneînaye. Yanî reqîb tenê reqîb e ku mel'ûn û kirêt û xirab e:

1 Ji bo zêdetir agahiyên derheqê vê mijarê bnr.: (Tek 2023).



“Rûh û rewanê min hebîb, dîsa bi **telbîsa reqîb**
Rencîde kir miskîn-xerîb, terka dilê ehbab da (30)”

“Îşq derdek bêtebîb e lê mufa wesla hebîb e
Kuştime cewra reqîb e pur le’înê **rûsiya** ye

Mihnet û cewra hebîbî qehr û azara reqîbî
Heq tinê da min xerîbî lê şukur Baxwoy we daye (138)”

“Ma bi zehrê şekerînî mûçe dey hem xef bixwûnî
Da reqîbê mel’ûn nebînî pîr ‘eleyhil-le’ne ye (150)”

Tiştê ku em zêde di metnên dî da nabînin ew yek e ku Mela çawa ku di meseleya sîstema patronajê da yan jî di fexriyeyên xwe da şa’îrekî xwedanhêz e û jixwebawer e di meseleya reqîbî da jî klîşe û ezber şikandine ku ‘aşîqê di *Dîwana* wî da—ango wî—serê xwe li ber reqîbî neçemandiye, bereksê wê, zora reqîbî biriye. Ew yeke taybetiyeke cuda ya *Dîwana Mela* ye ku di vê gotarê da em zêdetir li ser vê meselê rawestin. Melayê Cizîrî ji aliyekê ve ‘aşîqê mehcûr bitin ji aliyekê ve jî mesrûr û şad e ku

330 yar gelek caran ji reqîbî zêdetir, xeberê wî diketin. Lewra yar seherê destê wî digirît û dibete seyranê li nav baxan ku bi wê ji ber hesûdî û zikreşiyê tayê mirinê tete reqîbî:

“Min go gelo dilber, reqîb feyde ji te qet wî heye
Sond xwar bi husna xwe dê wî fi’lê şeytan e xered (106)”

“Min go te divê ser ji reqîbî bibirim ez
Go min we ye zanim dibirî jê meqes î tu (170)”

“Destê me seher girt û birîn seyrê hebîbê
Filhal reqîbî ji hesed lerze û ta girt (58)”

“Paş-firqetê ji mihnetê ji zulmetê çûm hizretê
Wesla hebîb min bû nesîb mel’ûn reqîb mehcûr bû (166)”

Melayê Cizîrî, gelek balkêş e—di çar beytên ku me pêşiyê daneda—gazindeyan ji reqîbî diket ku reqîb di wan beytan da serdest e û Mela têk dibet. Lê digel wê di çar beytên dî—yên di çar beytên ku me pêşiyê dane—da jî Mela bi harîkariya yarê, reqîbî pûç diket.



Xaleka dî di hin destxetan da navê reqîb serşor û sernişîv hatiye nivîsîn ku herwekî kelîmeya şeytan, bi me'naya le'netî hatiye dîtin. Ji ber wê jî di nusxeya Harttman ya *Dîwanê* ya ku me di nav weşanên Wezaretê da weşandî numûneyeke balkêş ya derheq reqîbî da heye ku bo wê noteke hosa nivîsîbû: "Ji ber mucadeleye di navbera aşiq û reqîban de, şair peyva "reqîb" digel îbareyên me'naxirab bikartînin. Ji ber wê di vê destxetê da jî, kelîmeya "reqîb" serşor hatiye nivîsîn ku şair dixwazit ji reqîb re bibêje, "stûyê te bişkê", "çavên te birijin (Melayê Cizîrî 2012: 30)."

Encam

Dîwana Melayê Cizîrî tenê ji aliyê wesfên yarê ve jî metneke têt-estetîk e ku bi dehan mezmûn û îmajên ku em bişên ancax di metnên/lîteraturên cuda cuda da bibînin, em dişên di berhema Mela da bibînin. Loma jî gava kesek li ser *Dîwana Melayê Cizîrî* xwendinên pisporane biket, ew dişê bibîte hakimê gelek xalên edebiyata Klasîk. Lewra metnê Melayê Cizîrî metneke dariştî û gişt e ku zewq û estetîka edebiyata Klasîk bi taybet di babetê wesfên yarê da vedigêrît.

331

'Eşq di helbesta Mela da çalak e yanî muwafiq e li gel psîkolojî û derûniya insanî ku ew li ser yek bayi nîne. Anko yar çawa ku ruh û rewan e, 'eşq bi xwe jî rewan û coş e ku li ser qer-arekê nîne. Yar car destê Mela digirît wî dibete xelwetê car jî ji ber telbîsa reqîbî Mela neşê xwe nîşa yara xwe jî bidet. Ji wî alî ve ew dînamîzma di *Dîwanê* da zor seyr e ku nîşaneyê wê yekê diket ku *Dîwana* yek ji serçeşmeya şî'ra Klasîk e ku têkda bûye berhemeke kamil ku ji her alî ve bi zewqeke gişt ya estetîzekirî ku muxetabên xwe tetmîn diket. Ewe bi serê xwe zewqeke wesa didete mirovî ku mirov ji tenya çend beytên Mela dişê t'am û çê-jeke wesa werbigirît ku herwekî mirovî çend mesnewiyên evînî xwandibin.

Çavkanî

Melayê Cizîrî. (2012). *Dîwan*. Ankara: Kùltür ve Turizm Bakan-lığı Yayınları.



Eagleton, Terry. (1981). *Walter Benjamin or Towards a Revolutionary Criticism*. Verso, London. [neql ji: Yavuz, 2013: 65].

Yavuz, Hilmi. (2013). *Edebiyat ve Sanat Üzerine Yazılar*. İstanbul: Yapı Kredi Yayınları.

Tek, Ayhan. (2023). “Li dor Nerît û Kanonê Wesfên Dildarê di Xezelên Melayê Cizîrî de.” *Melanasî*. (Edîtor: Abdulhadi Timurtaş û yên din.) Wan: Peywend.



Dî Peywendîya 'İlm û Edebiyatê de Berhemên Ku Melayê Cizîrî Amaje Bî Wan Dike

Nurettin Ertekin*

Destpêk

Di navbera 'ilm û edebiyatê de têkiliyeke kûr û dûr heye. Di destpêka vê têkiliyê de 'ilm bi rêya edebiyatê xasma bi rêya edebiyata te'lîmî (Wêjeya Perwerdehî) derdikete holê û belav dibû. Titus Lucretius Carus, di sedsela yekem ya berya zayînê berhemeke menzûm bi navê *De Rerum Natura* nivîsandîye û di vê menzûmeyê de nêrînên Epikuros belav kiriye. *el-Elfiyye* ya Îbn Malik et-Taî (w. 672/1274) ku di warê rêzimana 'Erebî de ye, *Bostan* a Se'diyê Şîrazî (w. 691/1292) ku di warê sinc û exlaq de ye, *Nûbihara Biçûkan* û *'Eqîdename* ya Şêx Ehmedê Xanî (1651/1707) ku ya pêşî ferheng e û ya dawî di warê bîr û baweriyê de ye, berhemên wêjeya perwerdehiyê nin ku di wan de 'ilm bi rêya edebiyatê hatiye ziman.

333

Gelek şa'irên edebiyata klasîk di zanistên curbicur de 'alim û zana bûn. Dema em li jiyannemaya şa'iran dinihêrin em têdigi-hêjin ku kîjan şa'ir di kîjan zanist û 'ilmî de pêşkeftî bû. Bêguman ev pêşkeftîbûna di 'ilm û zanistan de karîgeriyeke mezin li hîş, fikr û ramanên şa'irî dikir. Pêşkeftîbûna şa'irî di zanistên ciyawaz de weke zanistên pizîşkî, stêrnasî, civaknasî, felsefe, zanistên dînî û wekî din, di şî'rê de bi bêje û têgihên 'ilmî rû dida. Ji ber vê mirov dikare bi asanî bibêje dema em bêje û têgihên zanistan ji nava edebiyata klasîk derxînin dê edebiyateke rijî bimîne.

Di vekolîna berhemên klasîk de pîrbûna bêje û têgihên zanistî bûye mijara xebatên zanistî û akademîk. Li ser dîwanên

* Dr., Hakkari Üniversitesi, Yazı İşleri Müdürü. e-posta: nurettin.ertekin@hotmail.com Orcid Number: <https://orcid.org/0000-0003-2744-0447>



şa'irên klasîk bi çendîn layan tehlîl dihên kirin ku layek jê jî ji layê bêje, têgih û ûnsûrên zanîstî ne. Berhemên derbarê şîroveya bêje, têgih, remz, mezmûn û mefhûmên edebiyata klasîk û ansîklopediyên di vî warî de jî ne kêr in. Herweha sedemên bikaranîna bêje û têgihên zanîstî jî bala lêkolîneran kişandiye ser xwe û di vî warî de xebat dihên dîtin.

Fuat Sezgin, di berhema xwe ya bi navê “İslam’da Bilim ve Teknik” de li ser vî mijarê rawestiya ye. Sezgin, di vî xebatê de di şî’ra ‘Erebî, Farsî û Ingilîzî de bikaranîna bêje û têgihên zanîstî bi berfirehî vekola ye. Sezgin, di heman berhemê de li ser belavbûna agahiyên zanîstî di ‘alema Îslamê de û li ser şeweya bikaranîna agahiyên zanîstî ji teref şa’iran jî sekinî ye. Em nêrînên sezgin dikarin weha xulase bikin. Şa’iran, bi saya têgihên zanîstî nêrînek modern û pêşketî bexşî şî’ra xwe kirine. Derbarê pêşveçûna zanistan de agahî dane xwendekarên xwe. Ev helwest, bi me dide zanîn ku şî’r, ne tenê îfadeyeke edebî ye, di heman demê de amûreke girîng e ji bo berbelavbûna agahiyên zanîstî.¹

334 Hesên Akreş, di xebeteke xwe de şa’irên ‘Ereb bi çî şeweyê têgihên zanîstî bi kar anîne vekola ye. Di vî xebatê ev encam hatiye bidestxistin: Şa’irên ‘Ereb, mijarên dînî û metafîzîkî pevgihandine û bi vî rengî di şî’rên xwe de vegotînek kûrtir û watedartir bi dest xistine. Ev şewê, hem îfadeyeke estetîk di şî’rê de derxistiye holê û hem jî bûye sedema ragihandina agahiyên dînî û zanîstî.²

Di şî’ra Farsî de têgihên zanîstî bi çî rengî di hizrên estetîk û fîlosofîk de cih girtine bûye mijara vekolînekê û nivîskar gihaştîye vî encamê. Şa’irên Farisa, di berhemên xwe de bi bikaranîna têgihên zanîstî zengîniya şî’ra xwe zêdekiri ne û bi serkeftî peyamên xwe yê fîlosofîk ragihandine. Ev terz, tevî zêdekirina kûrahiya estetîk û ronakbîriyê, têgihîştina xwendekaran derbarê tîkiliya navbera zanist û hunerê jî bi dest xisti ye.³

Melayê Cizîrî, yek ji şa’irê edebiyata Kurdî ya klasîk e ku şî’rên wî lebalêp dagirtîne bi bêje û têgihên zanîstî. Eger em bêje

1 Fuat Sezgin, *İslam’da Bilim ve Teknik*, Türkiye Bilimler Akademisi, Ankara 2015.

2 Hasan Akreş, *Kur’ân-ı Kerîm ve Fasih Arapça’daki Farsça Kelimeler*. İran Çalışmaları Dergisi, 8(1), 109-133, 2024. <https://doi.org/10.33201/irani-an.1474424>.

3 Abdullah, Demir. “İSNAD Atf Sistemi: Türkçe – İngilizce – Arapça – Farsça”. *Eskiyenî* 52 (Mart 2024), 1-8. <https://doi.org/10.37697/eskiyenî.1458782>.



û tégihên zanistên curbicur ji şî'rên Melayê Cizîrî derînin ewê di destê me de tiştêk nemîne. Melayê Cizîrî tevî bêje û tégihên zanistan navê hinek berhemên jî di şî'rên xwe de yan rasterast derbas dike yan bi hunerên edebî amaje bi wan dike. Di vê xebatê de em hewl didin ku berhemên di dîwana Melayê Cizîrî de amaje bi wan hatiye kirin binasînin. Di dîwana Melayê Cizîrî de du cure berhem dihên dîtîn. Berhemên semawî û berhemên zanistî. Di beşa yekem de em li ser berhemên semawî sekinin. Di beşa duyem de me berhemên zanistî vekoland.

3. Dî Dîwana Melayê Cizîrî De Berhemên Semawî

Di dîwana Melayê Cizîrî de ji berhemên semawî ku Qur'an, Tewrat, Zebûr û Încîl in bes em rastî navê Qur'anê dihên.⁴

3.1. Qur'ana Pîroz

Qur'an, hem bi navê xwe yê resen û hem jî bi navên xwe yên dîtir weke; *Qur'ana Mecîd*, *Fûrqan*, *Mushef* û *Kîtab* di dîwana Melayê Cizîrî de cih digire.

335

a- Qur'an

Qur'an, di yek malikeke dîwana Melayê Cizîrî de cih digire. Di vê malikê de Melayê Cizîrî ji bo gotina xwe qewîn bike bi Qur'anê son dixwe. Ev sondxwarin ji bo piştrastkirina hizra tesewufî ye.

Bi Qur'anê bi ayatê eger pîrê xerabatê
Bibêjit secde bin latê murîdên wî dibin qatê(MC 16-3)

4 Di vê xebatê da ji bo malikên mînak yên Melayê Cizîrî, nusxeya Nûbiharê ku ji ber nusxeya Doskî hatîye amadekirin hat hilbijartin. Malikên Melayê Cizîrî bi kurteya navê wî, piştê rûpelê dîwanê û piştê hejmara malikê hate nîşandayîn. Mînak; (MC 124-3). Melayê Cizîrî, Dîwan, Amadekar: Tehsîn Îbrahîm Doskî, Nûbihar, Stenbol 2019.

b- **Qur'âna Mecîd**

Mecîd, naveke ji navên Xweda ye di nava esmau'l-husna (navên Xweda yên herî xweşik) de. Qur'ana Mecîd dihê wateya ew Qur'ana xwedî şan û şeref.⁵ Melayê Cizîrî di ramanên xwe yên aşiqane de ji bo xweşikahiya me'şûqa xwe biîne ziman bi Qur'ana Mecîd sond dixwe.

Mishefa husn û cemalê sûreta xal û xetan
*Ma telewna xeyre herfi la we Qur'anin Mecîd*⁶ (MC 99-3)

c- **Fûrqa**

Fûrqa, dihê wateya jihevveqetandina heq û batil.⁷ Bi vî rengî ji bo hemû kelimên Îlahî Fûrqa hatiye gotin. Lewra em dibinin ku di Qur'ana Pîroz de Xweda hem ji bo Qur'anê û hem ji bo Tewratê bêjeya Fûrqa bi kar anîye.⁸

Di nava malikên Melayê Cizîrî de Fûrqa yek car derbas dibe. Di vê malikê de Melayê Cizîrî ji bo gotinên xwe piştrast bike bi heft ayetên Fûrqa sond dixwe.

Dibit bêjin wî sultanî
Li mehbûban tu xaqan î
Bi heft ayatê Furqanî
Were derbê li qeyser de (MC 193-4)

d- **Mushef**

Mushef, di ferhengan de dihê wateya ew sehîfeyên ku di nava bergekî de hatine komkirin. Weke têgih ji bo berhemên semawî navekî hevpar e.⁹ Di dîwana Melayê Cizîrî de di yek malikê de ew jî ji bo sond xwarinê cih digire.

5 Rağb, el-İsfehânî. Müfredât-Kur'an Kavramları Sözlüğü, Tercüme: Abdulbaki Güneş-Mehmet Yolcu, Çıra Yayınları, 3. Baskı, İstanbul 2012, r 990.

6 Ev nîv malik bi 'Erebîye. Wate: Ez bi Qur'ana Mecîd sond dixwum ku ji bilî herfa "na" me tiştek nexwendîye.

7 el-İsfehânî, Müfredât, r, 990.

8 Bnr: Qur'ana Pîroz, Beqere 185, Enbîya 48.

9 Muhememd Me'in, Ferhengê Me'in, Intişarati Adîna, Tehran 1381, b 2, r 1746.



Feyda 'ulûmê hikmet cama sedef ko gêra

Me j destê muxbeçan dît bi Mushef û bi ayet (MC 72-3)

e- Kîtab

Kîtab an weke bilivkirêna Kurdî Kitêb di dîwana Melayê Cizîrî de di pênc malikan de debas dibe. Ji bo hemû berhemên nivîskî re Kîtap dihe gotin. Di heman demê de Di Qur'ana Pîroz de ji bo hemû berhemên semawî re Kîtap hatiye gotin¹⁰ ku Qur'an jî yek jî yek ji berhemên semawî ye. Di dîwana Melâyê Cizîrî de bes di yek malikekê de weke navê Qur'anê em bêjeya Kîtabê dibinin. Di vê malikê de Melâyê Cizîrî di pesinandina zanebûna xwe de ji Kîtabê sûdê werdigire.

'Aşîqê mes'elewxahî were em muftiyê 'îşq î
Destekî sunnet e tê da di yekî nessê Kîtab e (MC 198-10)

4. Dî Dîwana Melayê Cizîrî De Berhemên Zanistî

337

Di dîwana Melâyê Cizîrî de em rastî navê 14 berhemên zanistî dihen. Li jêr emê li ser wan rawestin,

4.1. Gulşenî Raz

Gulşenî Raz, navê berhema Şêx Mehmûdê Şebusterî (1288-1318) ye û yek ji klasîkên tesewufê ye. Di vê berhemê de remz û îşaretên 'îrfanî bi nezm hatine şerh kirin. Berhem di sala 717ê koçî ku dihe beranberê sala 1317ê mîladî de hatiye nivîsîn. Gulşenî Raz, bersîva hinek pirsên bi nezm e. Berhem menzûm e û bi teşeya mesnewîyê hatiye nivîsîn. Hejmara malikên berhemê li gorî destxetan di navbera 958 û 1006 malikan da ye. Herweha di derbarê hejmara pirs û malikên pirsan jî cîyawazî tê dîtin. Li gorî destxetên berhemê û tezkîrenivîsan 15, 17, 19 an 36 pirs hatine kirin û hejmara malikên pirsan jî 16 an 17 nin.¹¹

10 Bnr: Qur'ana Pîroz, Meryem 30.

11 Şemsuddîn Muhammed el-Lâhîcî, *Mefâtîhu'l-i' câz fî Şerh-i Gulşen-i Râz*, (Tehqîq: M. Rîzâ Berzîger Xâlikî – Îffet Kerbâsî), Întîşaratê Zewwar, Çapê Duwwom, Tahrân 1374, Mûqeddîmeyê Muheqqiq, r penc. (3-89).



Di Gulşenî Raz de bersîva pirsên felsefî weke; hizirîn çi ye, ez kê me, pirsên tesewufî-‘irfanî weke; kê digihêje sirra wehdetê, gotina ene’l-heq çi ye, wîsal, mumkun, vacib, hudûs, qurb û bu’ d dihen çi wateyê, pirsên derbarê wateya remz û îşaretên tesewufî-‘irfanî weke; şerab, şem’, şahid, xerabatî bûyîn, but, zun-nar, tersa hatine bersîvdayîn. Li ser Gulşenî Raz bi zimanê Ingilîzî, Elmanî, Farsî, Tirkî û Urdûyî nêzî 50 şerhî hatine nivîsîn.¹²

Gulşenî Raz di dîwana Melayê Cizîrî de du caran derbas-dibe.

Perwane û bulbul bi dil in şu’leyê ‘îşqê
*Lê ger tu nezer dî bi xwe ew **Gulşenê Raz** in (MC 173/4)*
Bî şêran ra ku rimbaz im di remza qabê qewseynê
*Bî ‘eynê **Gulşenê Raz** im di babê Hikmetil’Eynê*
Mulazim hedretê lazim hicab raket ji mabeyne (MC 306/2)

4.2. Hîkmetu’l-‘Eyn

338 Hîkmetu’l- ‘Eyn, navê berhema Necmuddîn ‘Elî b. ‘Umer el-Katibî el-Qezwînî (w. 675/1277) ye. Hîkmetu’l- ‘Eyn, ji teref lêkolîneran ve muhîmtirîn berhema Qezwînî dihê hesibandin. Ev berhem bi ‘Erebî ye. Di berhemê de sê beşên sereke cih digirin ku; mentiq, tebî’et û îlahiyat e. Nivîskar di van beşan de nêrînên xwe yê felsefî û kelmî anîye ziman.¹³

Berhem ji ber ku kurt e û nivîskarî di berhemê de nêrînên xwe bi puxte anîye ziman têgihêştina wê zehmet e. Ji ber vê li ser Hîkmetu’l- ‘Eynê ji teref zanyarên girîng yê felsefeyê û kelmê çendîn şerh hatine nivîsîn. Çendîn kesan jî li ser vê berhemê haşî-ye û te’lîqat nivîsîne.¹⁴

Di dîwana Melayê Cizîrî de em di du malikan de navê Hîk-metu’l- ‘Eynê dibinin.

Bînê nûnên li ser sadan ko katib guşe lê badan
*Seraser qafi ta qafe rumûza **Hikmeti l-‘Eynê** (MC 292/3)*

12 el-Lâhicî, Mefâtîhu’l-i’ câz fî Şerh-i Gulşen-î Râz, Mûqeddîmeyê Muheqqiq, r şeş-heft. (3-89).

13 Necmuddîn ‘Elî b. ‘Umer el-Katibî el-Qezwînî, *Hikmetu’l- ‘Eyn*, (Şerh: Şemsuddîn Muhemmed b. Mubarekşah el-Bûxarî, Teshîh: Ce’fer Zahidî), Danişgahê Firdews, Firdews 1353, r 6-10.

14 el-Qezwînî, Hîkmetu’l- ‘Eyn, r 10-19.



Bi şêran ra ku rimbaz im
Bi 'eynê Gulşenê Raz im
Mulazim hedretê lazim
di remza qabê qewseynê
di babê Hikmetil'Eynê
hicab rakit ji mabeyne (MC 306/2)

4.3. Lubab an Şerha Lubab

Lubab, navê çendîn berhema ye ku hinek ji wan beriya Melayê Cizîrî û hinek ji wan piştî Melayê Cizîrî hatine nivîsîn.¹⁵ Di şerhên dîwana Melayê Cizîrî de şarihan ji bo Lubabê navê du berhema anîne ziman. Berhemek jê derbarê fiqhê de ye û nivîskarê wê Ebu'l Hesen Ehmed b. Muhememd el-Mehamilî eş-Şafi'î (978-79/1024) ye. Berhema din jî derbarê rêzimana 'Er-e'bî (Nehw) de ye û nivîskarê wê Muhemmed b. Muhemmed b. Ehmed Tacuddîn el-Îsferayînî (w. 1285-86) ye.¹⁶ Helbet behs kirina ji du berhemên mijarcuda li gorî meqamên gotinê ye di malikên Melayê Cizîrî de.

339

Li ser berhema el-Îsferayînî beriya Melayê Cizîrî şeş şerh hatine nivîsîn.¹⁷ Li ser berhema el-Mehamilî jî çendîn şerh hatine nivîsîn û herweha haşiyeyek ji teref Muhemmed b. Îbrahîm b. Yûsif el-Tazefî (w. 1563-64) bi navê Şerhu'l-Lubab hatiye nivîsîn.¹⁸

Di dîwana Melayê Cizîrî de Lubab di du malikan de cih kirtiye. Di malika jêrîn de amaje bi berhema el-Îsferayînî hatiye kirin. Lewra haşiyê bêtir li ser berhemên rêziman dihên nivîsîn.

Xet û xalên te bi mû mû ji me ra mes'elego yin

Me ji wan haşiyeyan sîne teji Şerhê Lubab e (MC 199/3)

15 Beriya Melayê Cizîrî bi navê Lubab di mijarên ciyawaz de ji 40'î zêdetir berhem hatine nivîsîn. Ji bo van berheman û nivîskarên wan bnr: Kâtip Çelebî, *Keşfu'z-zunûn 'en esâmî'l-kutûb ve'l-funûn*, Tehqîq: Ekmeleddîn Îhsanoğlu - Beşşar 'Ewwad Me'rûf, Muessesetu'l-Furqan, London, 2021, berg 6, r 153-162.

16 Celalettin Yöyler, Şîroveya Dîwana Melayê Cizîrî, Enstîtuya Kurdî Ya Stenbolê, Stenbol, 1992, r 637 û 771. ; Tehsîn Îbrahîm Doskî, Şerha Dîwana Melayê Cizîrî, Komelgaha Ferhengî ya Ehmedê Xanî, Dihok, 2020, berg 3, r 253, berg 4, r 161. ; Ehmed b. Mela Muhemmed el-Zivîngî, *el-'Uqdu'l-Cewherî, fi Şerhî Dîwanî el-Şeyxi'l-Cezerî*, Metbe'etî's-Sebah, Dimeşq, 1987, berg 2, r 518 û 648. ; Abdalbaki Turan, *Melâyê Cizîrî ve Divanı*, Nûbihar, İstanbul, 2010, r 5 û 409.

17 Ji bo van şerhên li ser Lubaba el-Îsferayînî bnr: Çelebî, *Keşfu'z-zunûn 'en esâmî'l-kutûb ve'l-funûn*, berg 6, r 160-161.

18 Çelebî, *Keşfu'z-zunûn 'en esâmî'l-kutûb ve'l-funûn*, berg 6, r 156-157.



Di vê malika jêrîn de jî amaje bi berhema el-Mehamilî hatiye kirin. Lewra di malikan de behs ji fetwayan dihê kirin ku fetwa ji bo mijarên fiqhî dihên dayin.

Fetwa we numa haşiyeya Şerha-lubabê
Muftî me ney û nay e û ney qewlê qedîm e (MC 247/8)

4.4. Keşşaf

Keşşaf, kurteya navê berhema Ebi'l- Qasim Carullah Mehmûd b. 'Umer ez-Zemexşerî (1075/1144) ye. Navê berhemê bi giştî "el-Keşşâf 'en heqa'îqî't-tenzîl ve 'uyûnî'l-eqavîl" e. Di zanista tefsîrê de berhemeke girîng e.

Ji serdema ku hatiye nivîsandin û vir de bala gelek mufessiran kişandiye û bûye çavkanî ji tefsîrên wan re. Tevî vê, ji teref hinek 'alimên ehlê sunnet ve ji ber ku cih daye hinek nêrînên mu'tezîliyan bi tund hatiye rexnekirin. Bi şerh, haşiyeyê, te'lîq, kurtkirin û xebatên dîtir li ser Keşşafê ji 50'ê zêdetir berhem hatine amadekirin,¹⁹ bêyî xebatên akademîk.

Melayê Cizîrî di dîwana xwe de sê caran amaje bi Keşşafa Zemexşerî dike.

Ayetê husnê mufessel ke ji Keşşafê cemal
'İlmê 'işqê bike tefsîr û ji defter meke behs (MC 77/7)
Ji reng ayîneya camê
Di remza kufr û Îslamê yeqîn fehma te Keşşaf e
Ji berqa nûrê ilhamê
te batin rewşen û saf e
direxşan qafî ta qaf e (MC 300/3)
Cemala nûrîn saf e
Bi herfên xwe Keşşaf e demîr diden me'nayê
Ha, mîm, 'eyn, sîn, qaf e
di wechê tecellayê
di remza wê mu'emmayê (MC 309/1)

¹⁹ Ali Özek, "el-Keşşâf", TDV İslâm Ansiklopedisi, <https://islamansiklopedisi.org.tr/el-kessaf> (03.11.2024).



4.5. Telxîs

Telxîs bêjeyeke 'Erebî ye û bi wateya beyankirin, ravekirin û kurtkirinê ye.²⁰ Beriya Melayê Cizîrî berhemên ku pêşnava wan bi telxîsê destpêdike di mijarên curbecur de ji 10 an zêdetir in.²¹ Ji nav van berheman ya herî meşhur û berbelav berhema Celalud-dîn Muhammed b. 'Ebdurrehman el-Qezwînî (w. 739/1338) ye. Ji ber ku li Dimeşqê xetîp bûye bêtir bi navê Xetîp el-Qezwînî dihê nasîn. Navê berhemê di hinek çapan de veke; Telxîsu'l-Mîftah,²² di hinek çapên wê de bi navê; Telxîsu'l-Miftah Fil Me'anî vel Beyan²³ û di hinek çapên de jî bi navê; Telxîsu'l-Miftah Fil Me'anî vel Beyan vel Bedî'²⁴ hatiye.

Li ser vê berhemê çendîn şerh û haşîye, bi navê Telxîsu't-Telxîs çendîn kurtaya wê û ji teref gelek kesan ve bi nezm hatiye nivîsîn.²⁵ Di eslê xwe de ev berhem kurteya beşa sêyem ya mîfathu'l-'Ulum a Ebû Ye'qûb Yusif es-Sekkakî (w. 626/1229) ye. Mijara berhemê zanista rewanbêjiyê ye. Di berhemê de hersê beşên rewanbêjiyê me'anî, beyan û bedî' cih girtiye.²⁶

Di dîwana Melayê Cizîrî de di yek malike de derbas dibe.
Da bibînî senema min tu bigîn xwe bide xet
Bike Telxîsi cewabê me ji vê Muxteserê (MC 266/1)

341

4.6. Muxteser

Muxteser di ferhengên de bi wateya kurtkirin, kêmkirin û gotinên kurt hatiye.²⁷ Bi pêşnava muxteserê gelek berhem hatine nivîsîn.²⁸ Ji van berheman sisê ji wan gelek meşhur û berbelav in. Yek jê Muxteseru'l-Qudûrî ye ku ji teref Ebu'l-Huseyn Ehmed b.

20 'Elî Ekber Dihxuda, *Loxetnameê Dihxuda*. Danişgahê Tehran, 1377, berg 5, r 6935.

21 Ji bo berhemên bi navên Telxîsê bnr: Çelebî, *Keşfu'z-zunûn 'en esâmî'l-kutûb ve'l-funûn*, berg 2, r 627-647.

22 'Ebdurrehman el-Qezwînî, *Telxîsu'l-Mîftah, Me'e Şerhihi'l-Cedîd Tenwîru'l-Misbah*, Mektebetu'l-Medîne, Keratşî-Pakîstan 1437.

23 Çelebî, *Keşfu'z-zunûn 'en esâmî'l-kutûb ve'l-funûn*, berg 2, r 632.

24 'Ebdurrehman el-Qezwînî, *Telxîsu'l-Miftah Fil Me'anî vel Beyan vel Bedî'*, el-Mektebetu'l-'Esriyye, Beyrut-Lubnan 1438.

25 Ji bo van berhemên bnr: Çelebî, *Keşfu'z-zunûn 'en esâmî'l-kutûb ve'l-funûn*, berg 2, r 633-644.

26 Îbn Ye'qûb el-Mexribî, *Mewahîbu'l-Fettah fî Şerhi Telxîsu'l-Mîftah*, Daru'l-Kutûbu'l-'Ilmiyye, Beyrût-Lubnan 1424, berg 1, r 13.

27 Dihxuda, *Loxetnameê Dihxuda*. Danişgahê Tehran, 1377, berg 13, r 20480.

28 Ji bo berhemên bi pêşnava muxteser yê beriya Melayê Cizîrî bnr: Çelebî, *Keşfu'z-zunûn 'en esâmî'l-kutûb ve'l-funûn*, berg 6, r 327-350.



Muhemmed el-Qûdîrî el-Bexdadî el- Henefî (w. 428/1037) hatiye nivîsîn. Ev berhem derbarê fiqha mezhebê henefî de ye. Berhema duyem bi navê Muxteseru'l-Mûzenî ye. Nivîskarê wê Îsma'îl b. Yehya el-Mûzênî eş-Şafî'î (w.264/878) ye. Ev berhem yek ji muhîmtirîn berhemên derbarê fiqha mezhebê şafî'î de ye. Berhema sêyem ya Se'deddîn b. 'Umer et-Teftazanî ye û bi navê el-Muxteser dihê nasîn. Teftazanî carekê berhema Xetîp el-Qezwînî ya bi navê Telxîsê şerh dike. Navê vê berhemê Mutewwel e. Cara duyem berhema xwe Mutewwelê kurt dike ev berhem bi navê el-Muxteser meşhur dibe û di medreseyan de dihê xwendin.²⁹ Ev berhem derbarê zanista rewanbêjîyê de ye. Bêtir bi navê Muxteseru'l-Me'anî hatiye çapkirin û dihê nasîn.

Di dîwana Melayê Cizîrî de em di du malikan de rastî bêjeya Muxteserê dihên.

Di i'caza beyanê da suxen ger bête insafê
*Dizanit **Muxteser** her kes Melê sihre'ibaret kir* (MC 105/2)

Da bibînî senema min tu bigîn xwe bide xet
*Bike Telxîs-i cewabê me ji vê **Muxteserê*** (MC 266/1)

342

4.7. Me'anî

Di çavkaniyan de bi navê Me'anî neh berhem dihên dîtin ku ev berhemana beriya Melayê Cizîrî hatine nivîsîn. Ji nava van berheman du berhem ji wan derdikevin pêş. Yek jê Mea'niyu'l-Quran e. Ê bi navê Mea'niyu'l-Quran ê çarde berhem hatine nivîsîn. Ji nava berhemên bi navê Mea'niyu'l-Quran du berhem zêde dihê nasîn. Yek jê ji teref Ebî 'Elî Muhemmed el-Mustenir ku bi Qutrûbê Nehwî dihê nasîn hatiye nivîsîn.³⁰ Mijara berhemê tefsir û muşkulên î'rabê ne. Berhema din bi navê Kitabu'l-Me'aniyu'l-Ekber e. Ev berhem, berhema Raxibê Isfehanî ye.³¹ Tiştê ku dihê famkirin ev berhem negihaye roja me.³²

Bi îşaret weke navê berhemekê bêjeya Me'anî di yek malikeke Melayê Cizîrî de dihê dîtin.

29 Çelebî, *Keşfu'z-zunûn 'en esâmî'l-kutûb ve'l-funûn*, berg 2, r 635.

30 Ebî 'Elî Muhemmed b. el-Mustenir Qutrûbî, *Me'aniyu'l-Quran we Tefsîrû Muşkilî Î'rabîhî*, Tehqîq: Muhemmed Leqrîz, Mektebetî Ruşd, Riyad 1441.

31 Çelebî, *Keşfu'z-zunûn 'en esâmî'l-kutûb ve'l-funûn*, berg 66, r 562.

32 Ömer Kara, «Râgîb el-İsfahânî», TDV İslâm Ansiklopedisi, <https://islamansiklopedisi.org.tr/ragib-el-isfahani#1> (13.11.2024).



Di 'işqê şeyxê sanî me, bi dil behrê Me'anî me
Li zî hicrin we zî qelbin şîfa'un fî îşaratî (MC 242/10)

4.8. 'Ubab

Du berhem bi navê 'Ubabê beriya Melayê Cizîrî hatine nivîsîn. Yek ji wan, berhema Hesên b. Muhemmed es-Sexanî (w. 650/125-1253) ye. Navê berhemê el-'Ubabu'z-Zaxir e. Mijara berhemê ferheng e. Ev berhem 20 berg e. Nivîskarê berhemê beriya ku berhema xwe biqedine rehmet dike. Bi vî şiklî berhem nivîsî. Berhema duyem ya Şihabuddîn ebu'l-'ebbas Ehmed îbnû'l-Ba'ûnî (w. 716/1316-1317) ye. navê berhemê el-'Ubab e. Berhem menzûm e û derbarê fiqha mezhebê şafî'î de hatiye nivîsîn.³³

'Ubab du caran di malikên Melayê Cizîrî de derbas dibe.

'Eynê kafûre bi meşreb me ji husna te ye saf
Lew ji 'işqa te di dil da me vebû 'ilmê 'Ubab (MC 52/3)

Nezera 'eynê 'inayet bi me da şahê wilayet
Ji 'inayet nezerê dil me teji 'ilmê 'Ubab e (MC 199/1)

343

4.9. Qanûn

Navê berhema îbnî sîna ye ku weke berhemeke kanonî di warê zanista pîzîşkiyê de hatiye qebûlîkirin.³⁴ Navê berhemê el-Qanûn fi't-Tibb e. el-Qanûn ji pênc berhema pêk hatiye. Berhema yekem el-kulliyat e. Di vê berhemê de Îbnî Sîna bi giştî li ser rêgezên pîzîşkiyê rawestiya ye. Di berhema duyem de li ser dermanan di sekine. Di berhema sêyem de li ser nexweşîya rawestiya ye. Di berhema çarem de behsa nexweşîyên ku ne girêdayê bi endamên laşî dike. Di berhema pêncem de nojdariya nexweşîyan anîye ziman.³⁵

Di dîwana Melayê Cizîrî de weke navê berhema Îbnî Sîna du caran dihê dîtin.

33 Çelebî, *Keşfu'z-zunûn 'en esâmî'l-kutûb ve'l-funûn*, berg 4, r 660-661.

34 Îbn Sîna, *el-Qanûn fi't-Tibb*, Tehqîq: Muhemmed Emîn ed-Dennawî, Daru'l-Kutûbu'l-Ilmiyye, Beyrût 1420, r 9-10.

35 Yehya Mehdûyî, *Fihristê Nusxehayê Musennifatê Îbnî Sîna*, Întîşaratê Danişgahê Tehran, Tehran 1333, r 189-195.



Dê ji wan le'lan şifayê dil bi Qanûn telbe kit
Da îşaret xweş bikin herçî kesê bîmar-i bit (MC 65/2)

Ne bi Qanûn ko îşaret bi şifayê bikirit
Ez hilaka xwe di 'îşqê bi necatê nadim (MC 167/6)

4.10. Şîfa

Navê berhemeke Îbnî Sîna ye. Ev berhem di warê mijarên felsefî de berfirehtirîn berhema Îbnî Sîna ye. Ev berhem çar beş e. Beşa yekem mentiq e. Ev beş ji neh binbeşan pêkhatiye. Beşa duyem îlahiyat e. Ev beş jî deh binbeş e. Beşa sêyem rîyadat e û çar binbeşên vê beşê henin. Beşa çarem heyet e û jî sêzdeh binbeşan pêk hatiyê.³⁶

Em navê vê berhemê di sê malikên Melayê Cizîrî de dibinin.

Dê ji wan le'lan Şifayê dil bi qanûn telbe kit
Da îşaret xweş bikin herçî kesê bîmar-i bit (MC 65/2)

Ne bi qanûn ko îşaret bi Şifayê bikirit
Ez hilaka xwe di 'îşqê bi necatê nadim (MC 167/6)

Di 'îşqê şeyxê sanî me, bi dil behrê me'anî me
Li zî hicrin we zî qelbin Şifaun fî îşaratî (MC 242/10)

4.11. Îşarat

Navê berhemê el-Îşarat we't-Tenbîhat e. Yek ji meşhûrtirîn berhemên Îbnî Sîna ye. Berhem du beş e. Beşa yekem mentiq û beşa din felsefe ye. Her beşek jî deh binbeşan ava bûne. Zimanê berhemê 'Erebî ye. Ev berhem yek ji muhimtirîn berhemên zanistên 'eqlî dihê hesabkirin.³⁷

36 Îbn Sîna, eş-Şîfa, Tesdîr: Taha Huseyin Başa, Wezareti'l-Me'arifu'l-Ûmûmiyye, Qahîre 1371, r 10-11. ; Yehya Mehdûyî, Fihristê Nusxehayê Musennifatê Îbnî Sîna, r 125-135.

37 Îbn Ebu'l-Hesen 'Elî bin Qadî el-Eşref Yûsif el-Qiftî, Kîtabû Îxbaru'l-'Ûlema bî Ehkamu'l-Hûkema, Metb'etî Se'adet, Misir 1326, s 270-277. ; Îbn Sîna, el-Îşarat we't-Tenbîhat: Me'e Şerhî Nesreddîn el-Tûsî, Tehqîq: Suleyman Dunya, Daru'l-Me'arif, Qahîre 1983, r 111-113.



Di dîwana Melayê Cizîrî de bi îşaret weke navê berhemê di sê malikan de derbas dibe.

Dê ji wan le'lan şifayê dil bi qanûn telbe kit
*Da **Îşaret** xweş bikin herçê kesê bîmar-i bit* (MC 65/2)

*Ne bi qanûn ko **Îşaret** bi şifayê bikirit*
Ez hilaka xwe di 'îşqê bi necatê nadim (MC 167/6)

Di 'îşqê şeyxê sanî me, bi dil behrê me'anî me
*Li zî hicrîn we zî qelbin şifa'un fî **Îşaratî*** (MC 242/10)

4.12. Necat

en-Necat, berhemeke dîtir ya Îbnî Sîna ye. Îbnî Sîna ev berhem di mijarên felsefeyê de ji bo agahiyan bide xwendevanan û kesên bi felsefeyê re peywendîdar in perwerde bike nivîsandiye. Îbnî Sîna di vê berhema xwe de beşên mentiq, tebi'iyyat û îlahiyyat ya berhema xwe ya Şîfayê bi kurtasî nivîsandiye. Beşa dawî ya hendeseyê ji teref şagirtî wî Cuzcanî ve hatiye nivîsîn.³⁸

345

en-Necat di yek malikek Melayê Cizîrî de derbas dibe.

Ne bi qanûn ko îşaret bi şifayê bikirit
*Ez hilaka xwe di 'îşqê bi **Necatê** nadim* (MC 167/6)

4.13. Kulliyatê Xemse

Kulliyatê Xemse hem têgiheke mentiqû felsefeyê ye û hem têgihek edebî ye. Ji layê mentiq û felesefeyê ve kulliyatê xemse; her kul (tişteki giştî) dema li gorî ferdên (perçeyên ku bi hevra gişt ava dikin) xwe were nixandî û têkiliya navbera kul û ferd li ber çava were girtin ji layê zatîbûnî û 'erdîbûnî pînc cure ye. New', Cins, 'Erdê 'Am û 'Erdê xas.³⁹ Ji van pînc cureyan re Kulliyatê Xemse hatiye gotin. Weke têgihekî edebî Kulliyatê Xemse, ji pînc mesnewiyên şa'îrekî re dihê gotin ku di dîroka edebiyatê de

38 Îbn Sîna, *en-Necat: Fi'l-Hikmeti'l-Mentiqiyye we'l-Tebi'iyye we'l-Îlahiyye*, Muhyiddîn Sebrî el-Kurdî, Mısır 1357, r 23. ; Yehya Mehdûyî, *Fihristê Nusxehayê Musennifatê Îbnî Sîna*, r 225-232.

39 Murteda Mutehherî, *Mecmû'ei Asar, İntişaratê Sedra*, Tehran 1381, b 5, r 58-59.



cara pêşî ji bo berhemên Nîzamiyê Gencewî (w. 611/1214) hatiye gotin.⁴⁰

Di dîwana Melayê Cizîrî de di yek malikê de em rastî kulliyatê xemse dibin. Melayê Cizîrî di mijareke mentiqî-felsefî de bi hunerên tenasub û îhamê peywendiyê di navbera Heft Heykel û Kulliyatê Xemse de ava dike.

*Katib di çerxê cedwelê
Kir haşîya Heft Heykelê
Xweş neqşî avêtê welê
Nêv Kulliyatî Xemse da (MC 48/7)*

4.14. Heft Heykel

Di nava xemseyên Nîzamiyê Gencewî de mesnewiyek bi navê Heft Peyker cih digire.⁴¹ Melayê Cizîrî navê vê berhemê bi Heft Heykel guheriye ye û bi hunera tenasubê di navbera vê berhemê û kulliyatê xemse de têkilî avakirîye. Heft heykel di yek

346 malikek Melayê Cizîrî de cih digire.

*Katib di çerxê cedwelê
Kir haşîya **Heft Heykelê**
Xweş neqşî avêtê welê
Nêv kulliyatî xemse da (MC 48/7)*

Encam

Di vê xebatê de em li ser navên berhemên ku di dîwana Melayê Cizîrî de derbasdibin sekinîn. Di dîwana Melayê Cizîrî de ji berhemên semawî navê Qur'ana Pîroz bi çend şeweyan derbasdibe. Melayê Cizîrî, Qur'ana Pîroz û navê wê yên dîtir bi taybet ji bo sond xwarinê bi kar anîbe jî di hestên xwe yên 'aşiqane û hizrên xwe yên 'arifane de aniye ziman.

Ji berhemên zanistî amaje bi navê 14 berheman hatiye kirin. Ev berhemên ku amaje bi wan hatine kirin berhemên zanistên ciyawaz in. Berhemên derbarê klasîkên tesewufê, mentiq, tebîet,

40 Tahsin Yazıcı, Cemal Kurnaz, "Hamse", TDV İslâm Ansiklopedisi, <https://islamansiklopedisi.org.tr/hamse--edebiyat> (24.01.2025).

41 Bnr: Nîzamiyê Gencewî, *Heft peyker*, Metbe'eî Armaxan, Tehran 1315.



îlahiyat, felsefe, kelam, fiqh, rêziman, tefsîr, rewanbêjî, pizişkî, riyadat, heyet, edebiyat û dîrokê amaje bi wan hatine kirin ku ev yek paşxaneyê zanîna Melayê Cizîrî jî nîşan dide. Di nava van berhemên ku navê wan derbas dibin hem berhemên menzûm û hem jî berhemên pexşan cih digirin.

Xala girîng ev e ku Melayê Cizîrî, sê caran navê Keşşafa Zemexşerî di malikên xwe de aniye ziman. Ev berhem ji teref gelek 'alimên ehlê sunnet ve hatiye rexnekirin. Ev yek nîşan dide ku Melayê Cizîrî xwedî cesareteke bêhempa ye û ji rexneyên ku hinek kes bibêjin ew li ser hizra mu'tezîliyan tevdikere netirsiya ye.

Çawa ku di şî'ra klasîk de bêje û têgihên zanistî ne tenê ji bo agahîdayinê dihên bi kar anîn, herweha di şî'ra Melayê Cizîrî de jî navê berheman ne tenê ji bo agahîdayinê, belkî bêtir ji bo vegotina hest, ramanên 'aşiqane, 'arifane û hîkemî hatine bi kar anîn. Ev yek nîşanger e ku Melayê Cizîrî zanist û huner bi awayekî hevpar ji bo çekirina wêjeyê bilind û bêhempa 'emilandiye.

Di edebiyata klasîk de bêje û têgihên zanistî ji bo gelek sedeman ji teref şa'iran ve di şî'rê de hatine 'emilandin. Ji van sedeman armancên weke estetîk, sembolîk, avakirina hunerên edebî dikare were hejmartin. Em dibînin ku Melayê Cizîrî di dîwana xwe de navê berheman bêtir bi mebesta çekirina hunerên edebî û avakirina wêneyên şî'rê bi kar îname. Herweha navên berheman bi hunerên edebî yên weke; îham, telmîh, tenasub, îşaret, teşbîh û metaforan kûrahiyek daye şî'ra wî û wateya malikên wî dewlemendtir kiriye. Bi vî rengî tevî zewqa edebî û estetîkî zanîn û hişmendiyek jî daye xwendekarên xwe.

Çavkanî

Akreş, Hasan. Kur'ân-ı Kerîm ve Fasih Arapça'daki Farsça Kelimeler. *İran Çalışmaları Dergisi*, 8(1), 109-133, 2024. <https://doi.org/10.33201/iranian.1474424>.

Çelebî, Kâtîp. *Keşfu'z-zunûn ʿen esâmî'l-kutûb ve'l-funûn*, Tehqîq: Ekmeleddîn Îhsanoğlu - Beşşar 'Ewwad Me'rûf, Muessese-tu'l-Furqan, London, 2021.



III. ULUSLARARASI MELAYÊ CİZÎRÎ SEMPOZYUMU

Demir, Abdullah. "İSNAD Atıf Sistemi: Türkçe – İngilizce – Arapça - Farsça". *Eskiyeni* 52 (Mart 2024), 1-8. <https://doi.org/10.37697/eskiyeni.1458782>.

Dihxuda, 'Elî Ekber. *Loxetnameê Dihxuda*, Danişgahê Tehran, 1377.

Doskî, Tehsîn Îbrahîm. *Şerha Dîwana Melayê Cizîrî*, Komelgaha Ferhengî ya Ehmedê Xanî, Dihok, 2020.

Ehmed b. Mela Muhammed el-Zivîngî. *el-'Uqdu'l-Cewherî, fî Şerhî Dîwanî el-Şeyxi'l-Cezerî*, Metbe'eti's-Sebah, Dimeşq, 1987.

el-İsfehanî, R. *Müfredât-Kur'an Kavramları Sözlüğü*, Tercüme: Abdulbaki Güneş-Mehmet Yolcu, Çıra Yayınları, 3. Baskı, İstanbul 2012.

el-Lâhicî, Şemsuddîn Muhammed. *Mefâtihu'l-i'câz fî Şerh-i Gulşen-î Râz*, (Tehqîq: M. Rızâ Berziger Xâlikî – 'İffet Kerbâsî), İntişaratê Zewwar, Çapê Duwwom, Tehran 1374.

348 el-Mexribî. İbn Ye'qûb. *Mewahîbu'l-Fettah fî Şerhî Telxîsu'l-Mîftah*, Daru'l-Kutûbu'l-'İlmiyye, Beyrût-Lubnan 1424.

el-Qezwînî, 'Ebdurrehman. *Telxîsu'l-Miftah Fil Me'anî vel Beyan vel Bedî*, el-Mektebetu'l-'Esriyye, Beyrut-Lubnan 1438.

el-Qezwînî, 'Ebdurrehman. *Telxîsu'l-Mîftah, Me'e Şerhihi'l-Cedîd Tenwîru'l-Misbah*, Mektebetu'l-Medîne, Keratşî-Pakîstan 1437.

el-Qezwînî, Necmuddîn 'Elî b. 'Umer el-Katibî. *Hikmetu'l-'Eyn*, Şerh: Şemsuddîn Muhammed b. Mubarekşah el-Bûxarî, Teshîh: Ce'fer Zahidî, Danişgahê Firdews, Firdews 1353.

el-Qiftî, İbn Ebu'l-Hesen 'Elî bin Qadî el-Eşref Yûsif. *Kîtabû İx-baru'l-'Ülema bî Ehkamu'l-Hûkema*, Metb'etî Se'adet, Misir 1326.

Gencewî, Nîzamî. *Heft peyker*, Metbe'eî Ermexan, Tehran 1315.

İbn Sîna. *el-İşarat we't-Tenbîhat: Me'e Şerhî Nesreddîn el-Tûsî*, Tehqîq: Suleyman Dunya, Daru'l-Me'arif, Qahîre 1983.

İbn Sîna. *el-Qanûn fî't-Tib*, Tehqîq: Muhammed Emîn ed-Den-



Îbn Sîna. *en-Necat: Fi'l-Hikmeti'l-Mentiqiyye we'l-Tebî'îyye we'l-Îlâhiyye*, Muhyiddîn Sebrî el-Kurdî, Mısır 1357.

Îbn Sîna. *eş-Şîfa*, Tesdîr: Taha Huseyin Başa, Wezareti'l-Me'arifu'l-'Umûmiyye, Qahîre 1371.

Kara, Ömer. "Râgıb el-İsfahânî", TDV İslâm Ansiklopedisi, <https://islamansiklopedisi.org.tr/ragib-el-isfahani#1> (13.11.2024).

Me'in, Muhememd. *Ferhengê Me'in*, Întîşarati Adîna, Tehran 1381.

Mehdûyî, Yehya. *Fîhrîstê Nusxehayê Musennifatê Îbnî Sîna*, Întîşaratê Danişgahê Tehran, Tehran 1333, r 189-195.

Melayê Cizîrî, *Dîwan*, Amadekar: Tehsîn Îbrahîm Doskî, Nûbihar, Stenbol 2019.

Mutehherî, Murteda. *Mecmû'eî Asar*, Întîşaratê Sedra, Tehran 1381. (349)

Özek, Ali. «el-Keşşâf», TDV İslâm Ansiklopedisi, <https://islamansiklopedisi.org.tr/el-kessaf> (03.11.2024).

Qutrûbî, Ebî 'Elî Muhemmed b. el-Mustenir. *Me'aniyu'l-Quran we Tefsîrû Muşkilî Î'rabîhî*, Tehqîq: Muhemmed Leqrîz, Mektebetî Ruşd, Riyad 1441.

Sezgin, Fuat. *İslam'da Bilim ve Teknik*, Türkiye Bilimler Akademisi, Ankara 2015.

Turan, Abdalbaki. *Melâyê Cizîrî ve Divanı*, Nûbihar, İstanbul, 2010.

Yazıcı, Tahsin & Kurnaz, Cemal. "Hamse", TDV İslâm Ansiklopedisi, <https://islamansiklopedisi.org.tr/hamse--edebiyat> (24.01.2025).

Yöyler, Celalettin. *Şîroveya Dîwana Melayê Cizîrî*, Enstîtuya Kurdî Ya Stenbolê, Stenbol, 1992





Nirxandinek Li Dor Nîqaşên Li Ser Kesayetiya Melayê Cizîrî: Şêx Yan Şair

Nevzat Eminoğlu*

Destpêk

Edebiyata klasîk bingeha edebiyat û çanda nivîskî ye di nav edebiyatên miletan de. Ev rastiya dîrokî û edebî ji bo Kurdan û edebiyata Kurdî jî carî ye. Lewra edebiyatên miletan a modern û nivîskî li ser hîmdarî û hêzdariya edebiyatên wan ên klasik zîl dide û şax vedide. Di vê çarçoveyê de heqîqeten meriv dikare bibêje ku eger edebiyateke qedîm û xurt a Kurdî tuneba dê îro behsa edebiyateke dewlemend a Kurdî nehatiba kirin. Her wiha ziman û edebiyata Kurdî bi îhtimaleke mezin dê li hemberî êrîş û pêlên înkâr û helandina vê sed sala dawî berxwe neda. Lewma lêkolîn û xebatên li ser edebiyata klasîk û nûnerên wê edebiyatê pir giring e. Divê em şair û edebiyatnasên xwe yê Kurd ên serdema klasik ji her alî ve binirxînin û lêbikolin. Di vê çarçoveyê de em diwazîn li ser nasnameya şairekî xwe yê girin ê serdema klasîk bisekinin.

351

Di derheq nasnameya zanyarî ya hin şairên bijarte yê Rojhilata navîn de problematîkek heye. Bi qasî ku tê xuyanê ev yek ji bo Melayê Cizîrî jî ku di xaçerêya îrfan û edebiyatê de cih digre, carî ye. Ev pirsgrîka wesifandî û navlêkirina zanyarî yan jî edebî ya li hin şairan ev e ku gelo şairên serdema klasîk bi kîjan nasnameya xwe ve bêne danasîn.

Di serdema klasik a heyama Îslamî de şair û edebiyatnasan têgehên sofîgeriyê û mefhum û remzên wan zêde bikaranîne. Le-

* Dr. Öğr. Üyesi, Zanîngeha Muş Alparslanê, Fakulteya Fen Edebiyatê, Beşa Ziman û Edebiyata Kurdî / Muş Alparslan Üniversitesi, Fen Edebiyat Fakültesi, Kürt Dili ve Edebiyatı Bölümü n.eminoglu@alparslan.edu.tr



wra ev yek wek çand û baweriyeke gelemperî û berbelav ya wê serdemê, ye. Zanîna wan ya tesewufê û bikaranîna wan a têgehên tesewufî, gelo wan dike “mutesewuf”, “şêx” yan “sofî”? Di vê derheqê de ji bo ku meriv ji tevlihevkirina nasnameya zanyarî yan jî edebî ya şairên wê serdemê xelas bibe, divê tesnîfeke kifşe bête kirin. Her wisa divê nirxandinên berfireh û berawirdî pêk bên.

Hin şair û edebiyatnasên serdema klasîk awayekî bi eyan û beyan di nav pergala tesewufê de ne, wek mutewewuf tên nasîn. Şair bi eşkere wek şêx yan xelîfe yan murîd yan postnişîn di nav sîstema tesewufê de ye, yanî bi vî rengî girêdaneke wî ya bi vê pergale heye. Lê hin şair û edebiyatnas jî hene ku şairiya wan li pêş tesewuftiya wan e û kar, rol, wezîfe û fealiyeteke wan a di nav pergala tesewuf û terîqet de tune.

Ev cure şair belê hakimê lîteratura tesewufê ne, mezmûnên tesewufî bikaranîne. Lewra bigre hemû şairên sedema klasîk hakimê lîteratûra tesewufê ne û têgehên tesewufî bikartînin. Va ye Melayê Cizîrî jî yek ji van şexsiyetan e ku li dor nasnameya wî ya zanyarî nîqaşên wek “gelo sofî ye yan şair e yan jî şêx e” derketine holê. Armanca me ya di vê xebatê de ew e ku em li ser nîqaşên li dor nasnameya zanyarî ya Mela bisekinin û di derheq nasnameya wî ya rastîn de ku ew xwe pê dide nasîn ji dîwana wî agahiyan parve bikin û binirxînin.

352

1. Nêrîneke Gelemperî Li Jiyana Melayê Cizîrî

Melayê Cizîrî şairekî Kurd ê sedsala 16an e. Navê Melayê Cizîrî yê rastîn Mela Ehmedê kurê Mela Muhemed e. Binyada malbata wî digihêje eşîra Botî ku eşîreke Kurdan a mezin û qedîm e. Li paytexta hukumeta Kurd a Cizîra Botan jiyaye û wek Cizîrî hatiye naskirin. Têkiliya wî bi mîrên Mîrektiya Cizîrê re heye. Ji medhiyeyên wî yên ji bo mîrê Cizîrê, tê fêmkirin ku ew şaire qesr û serayê ye (Resûl, 1990, 07).

Melayê Cizîrî wek şairekî Kurd ê çerxa navîn heman prototîp û termînoloji yê serdema xwe bi kar anîne ku piraniya şairên alema îslamê jî bi awayekî hevpar bi kar anîne. Yanî Cizîrî jî heman zimanê mecaz û alegorîk emilandiye. Lêbelê Cizîrî wek



yek ji wan nûnerê sedema rewnaq û kamil a edebiyata Kurdî ya klasîk, şeweyê xwe yê xas ava kiriye. Dîwana wî ya muretteb de meriv nimûneyên têr û tijî yên hizra estetîkê dibîne.

Di serdema Melayê Cizîrî de hukûmet û mîrektiyên Kurd xwedî desthiladariyeke xurt bûn. Lewma Cizîrî şairekî sedema muqtedîriya mîrên Kurdan e. Ev muqtedîrî wek xwebawerî, îftixar û pesindan di helbestên wî de jî xwe dide der. Cizîrî di helbestên xwe de bi gelemperî sê mexlesan bikartîne: “Mela/Melê”, “Ehmed” û “Nîşanî”.

Cizîrî wek şairekî sedema klasîk şopînerê mûktesebara zanyarî ya berî xwe ya bi sedsalên antîk û Îslamî ye. Di vê çarçoveyê jî gelek hûkema, ûrefa û ûdebayên berî xwe sûd wer-girtiye. wek mînak, Îbnî Sîna, Muhyeddînê Erebi, Hafîzê Şîrazî, Mewlana Celaleddînê Rûmî, Sedê Şîrazî û hwd. Îbnî Erebi di rêza pêşîn a wan zanyar û mutesewufan de tê ku di mijara estetîk û nêrîna ciwanî de bandoreke domdar li şair, sofî û arîfên serdema klasîk a Îslamî kiriye. Fîkr û nêrîna wî ya estetîk li ser hizra “wehdeta wucûd” ê ava buye (Bozkurt, 2016, 47).

353

Mela di beyteke helbesteke xwe da di meqamê fexriye û îftixarê de bi awayê telmîheke ser girtî, îşaret dike ku ew bi xwe şopînerê sadiq û pîspor yê Îbnî Erebi ye. Ji hêla yên eleqemend ve tê zanîn ku Erebi di alema Îslamê de û her wiha di nav ehlê tesewufê de wek “Şêxê Ekber” yanî “Pîrê herî Mezin” tê binav kirin. Ev yek rastiyeke eyan û eşkere ye ku di fikra Mela ya estetîk de û her wiha di nêrîna gelek edîb û sofî û hukemayên di Alema Îslamê de bandora Erebi heye (Palacios, 1979, 274).

Lewma Mela bi xwe jî behsa vê yekê dike. Mela di vê beyta xwe de bi qenaeta me îşaretî bi vî leqebê wî yê bi terkîba “Şêx” dike û dibêje ku:

Di îşqê Şêxê Sanî me bi dil behra meanî me
Lî zî hîcrîn we zî qelbîn şîfaûn fî îşaratî (Cizîrî, 2013, 144).

Tê xuyan ku Îbnî Erebi digel gelek hêlên ciwanîyê, xasma di hêlên wek cureyên eşq û ciwanîyê, sirra eqşê û hwd. de bandor li ser Cizîrî jî kiriye. Lewma Mela di helbestên xwe de behsa “şextiya wî ya di eşqê” de dike. Xeynî Îbnî Erebi kesayetên nûnerên hizra estîka îrfanî yên wek Beyazîdê Bîstamî, Aynul Qudatûl Hemedanî, Hellacê Mansûr, Ferîdudîn Ettar, Xezzalî, Mewlana,



Merûfê Kerxî, û hwd. jî hene.

2. Kesayetiya Edebî Ya Melayê Cizîrî

Melayê Cizîrî wek edebiyatnasekî Kurd ê sedema klasîk li ser bingeh û binaxeya şair û edîbên Kurd ên beriya xwe derketiye holê. Şairên Kurd ên wek Baba Tahirê Uryan (m. 1010), Eliyê Herîrî (m. 1540), Şêx Şemseddînê Exlatî (m. 1615) û hwd. ku beriya Mela wek bingehê edebî roleke zemînekî munbît pêk anîne. Her çiqas qeyd û wesîqeyên di derheq têkiliya Mela ya bi van şairan re vê gavê di dest me de tunebin jî, bi qenaeta me meriv dikare bibêje ku ev zemîn peywenda gihîştina şairên wek Cizîrî teşkîl dike.

Mela gava li gor realiteya intertekstualîteyê yanî di çarçoveya navbermetnanîyê de bê nirxandin, tê dîtin ku wek şopînerekî Hafîzê Şîrazî ye. Lewra di dîwana xwe de behsa wî dike û terbi li ser şîrên wî çêkiriye. Beşek ji wê terbiyê:

Newaya mitrib û çengê fixan avête xerçengê

Were saqî heta kengê neşoyî dil ji vê jengê

Heyta dil meya baqî binoşîn da bi muştîqî

Ela ya eyyûhe's-saqî edir ke'sen we nawilha (Cizîrî, 2013, 18).

Jixwe di sedema klasîk de şairên ne Faris - çi Kurd û çi jî Tirk - ji bo xwe wek hedef û armanc, derketina asta şairên Îranî destnîşan kirine (Macit, 2012: 11). Lewra şairên wan ên wek Hafîz, Sedî û hwd. di vê hêlê de duayen in, pîr in. Lê di sedema zêrîn a edebiyata Kurdî de şair û edîbên wek Cizîrî, Feqî û Xanî şêweyên xwe yên resen pêk tînin û bi şairên Îranî re dikevin nav pêşbazîyeke serkeftî. Lewma Cizîrî awha dibêje:

Ger lu'lûyê mensûrî ji nezmê tu dixwazî

Wer şî'rê Melê bîn te ji Şîrazî çi hacet (Cizîrî, 2013, 340).

Cizîrî di hêla dîwannûsiya muretteb û bikaranîna hunerên edebî û sazkirina weznên erûzê de ji bo Kurdiya Kurmancî kanon e di qada xwe de. Melayê Cizîrî wek şairekî edebiyata Kurdiya Kurmancî, temsîla dewrana zêrîn dike di sedema klasîk de. Ew li ser bingeha edebiyatnasên Kurdiya Kurmancî yên berî xwe, yên wek Eliyê Herîrî, Şukriyê Bidlîsî, Emîr Yaqûbê Zirkî û hw. derketiye holê û şopgerê wan e. Vê gavê tu qeydeke ku rasterast vê yekê destnîşan bike tune.



Bes hevrenîya zimanî, erdnîgarî, çandî û bawerî ya Mela û van şairên navborî îhtimal û encamên bi vî rengî tînin bîra meriv (Ertekîn/Doskî, 2019, 43-61). Lêbelê ji şîrên wî diyar dibe ku pêşbaziya wî bi şairên Îranî yê sereke re ye. Wan wek reqîb dibîne. Lewra asta edebî ya ku tê de ye xwebaweriyekê didiyê û xwe kêmtî şair û edîbên Faris û yê mîletên din nabîne.

Edebiyata Kurdî ya Klasîk edebiyateke bajarî ye. Jixwe edebiyata klasîk bi gelemperî jî edebiyateke bajarî ye. Lewra ev edebiyat li bajaran peyda bûye û reng vedaye (Saraç, 2012, 31). Li dor medreseyan bajarên paytext, li hawirdora qesr û serayên mîr û hukumdarên Kurd derketiye holê û belav bûye. Mela li bajarê Cizîrê di nav sîstema patronajê de wek şairekî qesra mîrê Cizîrê derdikeve pêş. Di dewra Mela de mîrekiya Cizîra Botan hukumeteke hêzdar û serbixwe ye. Refaha aborî û aramiya sîyasî heye. Lewma Mela şairê dewra muktedîr e. Ev rewş, wek xwebawerî û îftixar, di helbestên wî de jî xwe dide der.

3. Melayê Cizîrî, Şêx Yan Şair

Esas di derheq nasnameya edebî ya hin şairên bijarte yê Rojhilatî de problematîkek heye. Bi qasî ku tê xuyanê ev yek jî bo Mela jî carî ye. Ev pirsgerêka wesifandin û navlêkirina edebî ya li hin şairan ev e ku gelo şairên serdema klasîk bi kîjan nasnameya xwe ya edebî ve bêne danasîn. Lewra wek çand û baweriyê gelemperî û berbelav ya wê serdemê, zanîna wan ya tesewufê û bikaranîna wan a têgehên tesewufî, wan dike “Mutesewuf”, “Şêx” yan “Sofî”. Di vê derheqê de jî bo ku meriv ji tevlihevkirina nasnameya edebî ya şairên wê serdemê xelas bibe, divê tesnîfeke kifşe bê kirin.

Bi qenaeta me meriv dikare şairên serdema klasîk yê ku bi eyan û beyan di nav pergala tesewufê de ne, wek mutesewuf bide nasîn. Şair bi eşkere eger wek şêx yan xelîfe, yan murîd yan post-nîşîn di nav sîstema tesewufê de be, yanî bi vî rengî girêdaneke wî ya bi vê pergale hebe, ew çax ew şairekî şêx e yan sofî ye yan murîd e. Wek mînak, Şairê Kurd ê serdema klasîk Şêx Şemseddînê Exlatî, Şêx Ahmedê Feqîr û hwd. Lewra ev şair hinekên



III. ULUSLARARASI MELAYÊ CİZÎRÎ SEMPOZYUMU

wan xelîfe yanî nûnerên terîqetekî ne. Mesela Exlatî şêxê terîqa Suhrewerdî ye li Amêdiyê (Exlatî, 2015, 25). Ger meriv ji dervayî edebiyata Kurd mînak bide di vê derheqê de, mesela Mewlana Celaleddînê Rûmî. “Mewlana” ji xwe payeyekî tesewufê ye ku Rûmî postnişînê yan jî şêxê wê terîqê ye (Mevlana, 2006, 7).

Şairekî ku şairtiya wî li pêş tesewuftiya wî be û kar, rol, wezîfe û fealiyeteke wî ya di nav pergala tesewufê(terîqet) de tunebe, ew şair ne “mutesewuf” e, yanî ne “sofî” ye. Ew şair şair e, edîb e û edebiyatnas e. Mesela di edebiyata Kurdî ya klasîk de Eliyê Herîrî, Ahmedê Xanî, Feqiyê Teyran û hwd. Di edebiyata Rojhlat de jî wek mînak: Hafizê Şîrazî, Sadiyê Şîrazî, Fuzûlîyê Bexdadî, Baqî, û hwd. Ev şair belê hakimê lîteratura tesewufê ne, mezmûnên tesewufî bikaranîne, lê ne mutesewuf in.

Ev şexsiyet şair in, bi nasnameya xw ya şairtiyê tên zanîn. Yanî bikaranîna wan ya têgeh û mezmûmên tesewufî ne girîng e di vê mijarê de. Lewra bigre hemû şairên sedema klasîk hakimê lîteratûra tesewufê ne û têgehên tesewufî bikartînin. Va ye Mela yek ji van şairên şair e ku wek mexles jî “Mela” yan “Melê” bikartîne. Yanî Mela Mela ye, Mela şair e û hew (Dokî 2021, 25).

Mela di dîwana xwe de, gava behs tê ser behsê, di meqamê fexriyeyê de bi gotin û soxenê xwe yê sêhramîz, yanî bi şairtiya xwe îftixar dike û xwe pê dide nasîn, ne bi şêxtî û sofîtiya xwe. Lewra şartiyê wek nasnameya xwe ya sereke û rastîn derdixe pêş. Hetta şairtiya xwe jî ser şairtiya şairên ji gelên cînar re digre. Yanî şairtiya xwe jî ne wek şairtiyeke ji rêzê û elelade, bileks wek pîr û şah û sertacê şairan dibîne.

Lewma dibêje ku:

Pîrê şe’ar e di şî’rê we Melê şalifroş
Tu nîşan min mede Ferxî ku li nik min buye ferx
(Cizîrî, 2013, 276)

Yan jî

Di îqlîmê suxen xaqan rewanbêj û şekerrîz î
Nehin wek te di afaqan bi can ra emberamîz î
(Cizîrî, 2013, 156)



Yan jî

Di î'caza beyanê da su xen ger bête însafê
Dizanit muxteser her kes Melê sihr e îbaret kir

(Cizîrî, 2013, 290)

Îcar nivîskar û lêkolînerên ku haya wan ji vê nuans û pîvana girîng tunene yan jî ger ehlê tesewufê be û di alema xwe de şextiyê wek meqamê herî mezin dibîne, te hew dît ku Mela di qelema wî de bûye “Şêx” yan “Sûfî” û wek “Şêx Ahmedê Cezerî” yan jî Ehmedê Xanî di devê wî de buye “Şêx Ehmedê Xanî” û derketiye (Yiğit, 2021, 80); (Geçit, 2019, 30); (Öz, 2019, 45). Her wiha yekî di qada felsefeyê de xebitîbe û haya wî ji qada edebiyatê yan teknîka edebiyatê tunebe, te hew dît ku Cezerî yan Xanî di dest û devê wî de buye “Fîlozofê Kurdistanê” yan jî “Muelîmê Salis/Mamosteyê Sêyemîn” û hwd (Ayhan, 1996, 34); (Mem, 1997, 34); (Doru, 2016, 18).

Bi kurtasî derdikeve holê ku tesewuf di şîra klasîk de bi destê du cure şairên xwedî taybetiyên ciyawaz, bi awayên cuda tê ravekirin. Qismê ewil ew şair in ku tesewufê bîzzat dijîn yên wek Hellacê Mensûr (m. 922), Nesîmî (m. 1417), Exlatî (m. 1674) û her wekî din (hwd.) Şairên bi vî rengî, hêla wan ya mutesewufiyê derdikeve pêş. Hêla wan a şairiyê jî li paş dimîne, yanî di ber siya sofîgeriya wan de dimîne.

357

Qismê duduyan jî ew şair in ku ji muktesebat û destkeftiyên alema term, mecaz, menzûm, alegorî yên dewlemend ên tesewufê sûd werdigrin. Ev cure şair, xwedî terz û şêweyekê ne di şairî û hunera xwe de û her wiha nasnameya wan a şairiyê daîm li pêş e. Melayê Cizîrî jî yek ji van şairan e wek Hafîzê Şîrazî (m.1390), wek Fuzûliyê Bexdadî (m.1556), wek Nîzamîyê Gencewî (m.1209) û hwd.

Di berhemên ev cure şairan de şî'riyet û lîrîzm, yanî poetîka û coşîş, ciwankarî û huner wek wesfên edebî yê estetîk bi her awayî xwe didin der û her li ber çava ne. Tesewufê, gelek mecaz, îmaj û sembol bexşî berhemên van şairên grûba duduyan kirine. Van şairan ji term, biwêj û gotinên xwedî wateyên dewlemend û bi mecazê xemilandî yên tesewufê îstifade kirine. Jixwe şîra klasîk li ser wî zimanê tesewufî pêş ketiye û geş buye ku bi mecaz û îstiareyê ve honandî ye.



Paşxane û binaxeya vê şîrê, xwe disipêre zewqeke estetîk a payebilind a çanda medreseyê û heyata qesrê ku ji anane û tradîsona rengîn û aristokratîk behremend dibîtin. Lewra ev cure şair jî di rehleyê tadrîsateke dirêj a medrseyê re derbas dibin ku ev tehsîl û irfana tekyaya tesewufê pirî caran tên rex hev, carcaran jî dikeve nav hevûdu. Lewma berhemên van cure şairan jî bi remz û hêmanên tesewufî dagirtî û xemilîne. Lêbelê ev yek, wan şairên payebilind nake mutesewuf (Erkal, 2009, 89).

Bi qenaeta me, bêtalîhiyeke Mela ew e ku li vî welatê me piraniya kesên ku li ser Mela û dîwana wî dixebitin, ne edebiyatnas in. Lewma jî hêla kesayetiya Mela ya herî sereke û girîng ku hêla wî ya edebî ye, ew jî di tarîtiyê de dimîne. Em di wê qenaetê de ne ku ev xebatên me yên di vî warî de belkî çengek be û her wiha destpêkek be ji bo tijekirina valahiya vê qadê.

358 Di nav van çend sedsalên dawî yên modern de di fêmdariya estetîk a qedîm de qutbûnek qewimî û gelek guherîn çêbûn. Ev yek jî bû sebebê fêmnekirin û têngîhîştina fêmdariya ji helbesta klasik û her wiha jêdûrbûn û bîyanîbûna li berhemên van şairên klasik. Lewma nasnameya rastîn a hin şairên me yên klasik bi temamî dernekete holê û zelal nebû (Purcevadî, 1998, 218).

Xebatên di vê mijarê de jî xwedî wê helwest û nêzîktayiyê ne ku bi rêbazên xwe yên modern û rasyonel dixwazin mane û mefhum û razên di helbest û berhemên wê sedemê fêm bikin. Her wisa di wê qest û mebestê de ne ku piraniya şairên serdema klasik din av parantêza sofîgerî û şextiyê de mehkûm bikin û bihêlin. Şîroveyên li gor êkolên nû yên di derheq şairên me yên wek Melayê Cizîrî de, dibite perde û seddek di navbera me û şair de. Lewma lazim e ku em li ser hêla nasnameya rastîn a şairiya şairên me yên wek Mela bixebitin. Her wisa poetikaya wan şairan bi nêrîneke edebî binirxînin û derxînin holê.

Encam

Mela Ahmedê Cizîrî şairekî Kurd ê sedsala 16an e û di wan sedsalan de hukûmet û mîrekîtiyên Kurd xwedî desthiladariyeke xurt bûn. Têkiliya wî bi mîrên Mîrekîtiya Cizîrê re heye. Ji me-dhiyeyên wî yên ji bo mîrê Cizîrê tê fêmkirin ku ew şairê qesr û



serayê ye. Lewma ew wek şairekî serdema muqtedîr ya mîrên Kurdan tê nasîn û di vê atmosfera îlmî û siyasî de gihîştîye û berhem dane. Ev rewşa rewnaq a serdemê ya sîyasî û îlmî wek xwebawerî, îftixar û pesindan di helbestên wî de jî xwe dide der. Di şî'ra wî ya lîrîk û coşîş de hêmanên ruh ên wek îhtîşam, hesasiyet, xwebawerî û ciwanî derdikevin pêş.

Mela wek şopînerêkî nêrîna wehdeta wucûdê ya Îbnî Er-ebî, girêdayî bi metafîzîka sofîgeriyê ye. Rastiyên metafîzîk ên xeybî ji ber ku mucered û bê ser û ber in, nakevin bin hed û hudûdên maddî û şeklî. Lewma ji bo anîna wan a ziman, pêwistî bi zimanekî alegorîk heye. Li gor Mela alema mecazan a maddî, tecellîyeke cîhana heqîqetan e. Ji ber vê qasê ji vê hêlê ve heqîqet in. Lêbelê bi gelemperî kesret û piratiya mecazan, demî, xapînok û arizî ne. Lewma mecaz wek pire û wesayît in ku diçe ber bi vê heqîqetê. Her wiha heqîqeta mutleq bi vê wesîleyê ve tê fêmkirin û nasîn. Ji ber vê qasê li gor şair bêtî mecazan heqîqet nayê fêmkirin.

Bingeh û binaxeya ku Melayê Cizîrî naverok û nasnameya helbesta xwe li ser saz kiriye, xwe disêpere paşxaneya fikra dînî, edebî û tesewufî ya muşterek a serdema navîn. Lê li gor hêza xwe ya îfadeyê, hunermendî û hostatiya xwe ya şairane û qabiliyeta ziman û kariheya xwe ya edebî bi form û awayekî xweser dirêse, hildiberîne û pêk tîne. Qada zanistî ya estetîkê di dîroka fikrîyata Kurdî de li gor fikr û nêrîna klasîk ji hêla zanyar û mutesewufên Kurd ve him bi hizra hîkemî him jî bi nezera îrfanî di berhemên wan de cih girtiye. Di vî warî de navên wek Suhrewerdî, Aynul Qudatul Hemedanî, Şemseddînê Exlatî, Melayê Cizîrî û hwd. derdikevin pêş.

359

Bêguman kesayetiyên wek Melayê Cizîrî pir alî ne. Lê gava meriv li ser nasnameyên Melayê Cizîrî bisekine û wan bide berhev, nasnameya wî ya şairtîyê derdikeve pêş. Jixwe ew bi xwe jî bi vê nasnameya xwe îftixar dike û xwe bi wê dide nasîn.

Esas meriv dikare şairên serdema klasîk yên ku bi eyan û beyan di nav pergala tesewufê de ne, wek mutesewuf bide nasîn. Ev tiştêkî asayî ye. Şair bi êşkere eger wek şêx yan xelîfe, yan murîd yan postnişîn di nav sîstema tesewufê de be ew çax ew bivê nevê şairekî şêx e yan sofî ye yan murîd e. Meriv dikare di vê derbarê de şairên Kurd ên serdema klasîk Şêx Şemseddînê



III. ULUSLARARASI MELAYÊ CİZÎRÎ SEMPOZYUMU

Exlatî, Şêx Ahmedê Feqîr û hwd. wek mînak bihijmêre. jî ber ku ev cure şair hinekên wan xelîfe yanî nûnerên terîqetekî ne. Ev jî rastiyeke nasnameya wan e.

Hin şair û edebiyatnas jî hene ku ev şexsiyet şair in, bi nasnameya xwe ya şairtiyê tên zanîn. Her wisa jî bikaranîna wan ya têgeh û mezmûmên tesewufî ne girîng e di vê mijarê de. Ew bi nasnameya xwe ya şairtiyê derdikevin pêş. Lewra bigre hemû şairên sedema klasîk hakimê lîteratûra tesewufê ne û têgehên tesewufî bikartînin. Ev yek wek tradisyonekê berbelav e din av şairên wê serdemê de. Va ye Mela yek jî van şairên şair e ku wek mexles jî “Mela” yan “Melê” bikartîne. Ew berî her tiştî şair e, edebiyatnas e. Yanî Mela Mela ye, Mela şair e û hew.

Gava em li dîwana Melayê Cizîrî dinîhêrin, em dibînin ku Mela di dîwana xwe de, gava behs tê ser behsê, di meqamê fexriyeyê de bi gotin û soxenê xwe yên sêhramîz, bi şairtiya xwe îftixar dike û xwe pê dide nasîn. Ew bi gelemperî, ne bi şextî û sofîtiya xwe, lê bi helbestvaniya xwe peya dide xwe. Lewra ew wek şairekî me yê serdema klasîk şairtiyê wek nasnameya xwe ya sereke û rastîn derdixe pêş û dike serlewehaya nasnameya xwe. Di vê derheqê de pirî caran şairtiya xwe jî ser şairtiya şairên jî gelên cînar re digre. Her wiha şairtiya xwe jî ne wek şairtiyeke jî rêzê û elelade dibîne. Berevajî ew wê helbestvaniya xwe wek pîr û şah û sertacê şairan dibîne. Di vê biwarê de xwebawerî û hêminiyeke xurt û heqdar nîşan dide.

360

ÇAVKANÎ

Ayvazoğlu, Beşir. *Güller Kitabı*. (10. Baskı), İstanbul: Kapı Yayınları, 2008.

Bal, Metin. “Yargı Yetisinin Eleştirisinin Kant Felsefesindeki yeri”, Ankara Üniversitesi, Dil ve coğrafya Fakültesi, Araştırma Dergisi, Yıl: 2008, Sayı: 19, r. 83.

Bayar, Ali. Gözkdag, K. Subaşı, K. Uyanık, N. *Ferhenga Têgehên Felsefî*. Edîtor: Nesîm Doru, Amed: Weşanxaneya Lîs, 2019.

Bayraktar, Mehmet. *Yunus Emre ve Aşk Felsefesi*. İş Bankası Yayınları, Ankara: 2008.



Bodei, R. *Güzelin Biçimleri*. Ankara: Dost Kitapevi, 2008.

Bozkurt, Kenan. *Fuzûlî'de Güzellik Tasavvuru*. Malatya: İnönü Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü, Türk Dili ve Edebiyatı Ana Bilim Dalı, Esk Türt Edebiyatı, 2016.

Eminoğlu, Nevzat. "Nimûneyên Patronaja Edebî Di dîroka Edebiyata Kurdî de", *Kurd Bajar û Bajarbûn*, Wan: Weşanên Lorya, 2020.

Eminoğlu, Nevzat. "Yazılı Kürt Edebiyatının Zenginliği" *Kürd Araştırmaları Dergisi* 1234. Ciltler, *Kürd Araştırmaları Yayınları*, İstanbul, 2020.

Erkal, Abdulkadir. *17. Yüzyıl Divan Şiiri Poetikası*, (t.ç.)Teza Doktorayê ya Neweşiyayî, Atatürk Üniversitesi, Sosyal Bilimler Enstitüsü, Erzurum, 2016.

Ertekin, Nurettin. "Tewewuf Di Dîwana Melayê Cizîrî de", *Cizîrînasî Maqaleyên Biwara Şi'rên Melayê Cizîrî*, Editor: M. Zahir Ertekin, Weşanên Dara, 2021, Diyarbekir, r. 177.

361

Ertekin, M. Zahir. "Agirê 'Işqê di Perspektîfa Mela de", *Mukaddîme*, Sal: 2017, cîld: 8, (jimar: 1), (Melayê Cizîrî Özel Sayısı), r. 77-93.

Ertekin, M. Zahir, Tehsîn Îbrahîm Doskî. "Mela Mehmûd an jî Hemîdî: Şairê Berî Melayê Cizîrî û Yekem Mulemme'a Kurdî", *Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi*, 2020, Sal: 5, Hejmar: 9, r. 43-61.

Ebu'l-Ala Afîfî. *İslam'da Manevî Devrim*, İstanbul: Risale Yayınları, 2004.

Exlatî, Şêx Semsedîn. *Dîwana Şemsedînê Exlatî*, Stenbol: Weşanên Nûbihar, 2015.





Şê'irîyet û Bela'xet di Dîwana Melayê Cizîrî da

Perwîz Cîhanî *

*"Yareb çi turfe meywe ev renga mey dibexşît
Şê'ra me tê perîşan, nezma me tê muşetwewêş"*

Kurte

Şengist û xîmê toreya Kurdî li ser toreya folklorî û klasîk hatîye dananê. Çawa di toreya folklorî da teqîl, miqam, aheng û mûsîqa istiran û êîrrokê ji hevdu cuda dikin, di edebîyata klasîk da jî kêş, serwa, cuwankarîyên toreya û wêneyên xeyalî helbest û pexşanê ji hevdu vediqetînin. Tiştê ku can û rewanî didete şê'irê û ewê ji pexşan û nezmê cuda dike cuwankarîyên toreya û bi taybet wêneyên xeyalî û mûsîqaya peyvî û arîyîşên gotarî û wateya ne. Di dîwana Melayê Cizîrî da em rastî hemû cûr û celebên cuwankarîyan çî yê gotarî yanê lefzî û çî jî yê me'înewî yanê wateya dihen. Lê di dîwana Mela da wêneyên xeyalî, mûsîqa û ne'xmeya peyvî, teşbîh û isti'are û mecaz zortir bala mirovî li ser xwe da radikêşin. Mela bi afirandina wêneyên xeyalî û mûsîqaya peyvî canî didete kelimê û şê'irê tîkelî sê'hrê dike û mirovî di gel xwe dibe cîhaneke aşopî û manewî. Ji bilî cuwankarîyên toreya yê ku ta niha gelek kes li ser xebitîne, di dîwana Mela da em rastî hevbend yanê terkîbên balkêş yê zafî û wesfî dihen. Ta niha kes li ser vê pişka hunerê di dîwana Mela da nexebitîye. Cara yekem e ku ev mijara di dîwana Mela da di hête ber lêkolînê. Mela bi afirandina hevbendên teşbîhî û isti'arî îmajên pirr cuwan afirandîye. Terkîbên wekî: gulzara qebûlê, gula iqbalê, cur'eya hicrê û dehan hevbendên cuwanên di ku li



seranserî dîwanê da li ber çavan dikevin.

Peyvên sereke: şê'ir, cuwankarîyên toreyî, hevbendên teşbîhî, mûsîqa, teşbîh, isti'are,

Pêşekî

Edebîyat, yan toreya Kurdî ji du pişkên nivîskî û zarkî pêk tê. Di edebîyata zarkî/gelêrî da em rastî du şeweyên vegotina toreyê tên, ku pisporên gelêrî yên xudanê vê toreyê ji wana ra vegotinên devkî û dengkî dibêjin. Mebest ji devkî toreya pexşankî yan çîrrok e û mebest ji dengkî jî toreya ku bi miqam û aheng û mîlodî û bi dengê bilind tê gotinê, ku jê ra istiran, kilam û lawje û... dibêjin. Tiştên ku istiran û çîrrokê ji hevdu cuda dikin, rîtm û mîlodî û mûsîqî ye.

Li dû toreya gelêrî ra toreya me ya klasîk tê. Ev herdu celebên toreyê xîm û şengistên tore û zimanê Kurdî pêk tînin. Çawa di toreya gelêrî da du celeb û teşeyên toreyê hene, wisna di toreyas klasîk da jî em rastî du teşeyên toreyê tên. Toreya vehûnayî yan helbestkî û toreya nevehûnayî yan pexşankî. Çawa di toreyas gelêrî da aheng û miqam û teql û mîlodî û rîtm ku afrînerên mûsîqayê ne, istiran û çîrokan ji hevdu cuda dikin, di toreyas klasîk da jî ev afrînerên mûsîqayê ne, ku helbestê ji pexşanê vediqetînin.

Helbesta klasîk jî bixwe di nav xwe da dibe du cureyan: Şê'ir û Nezm.

Gelek caran sînorê şê'irê û nezmê pirr nêzîkî hev in, wisan ku gelek kes şê'irê û nezmê jêk cuda nakin. Tiştên ku van herduyan jêk cuda dike, poêtîka û rêtorîka yan jî bela'xet û cuwankarîyên toreyî yên wateyî û gotarî ne.

Di dîwana Melayê Cizîrî da em rastî herdu celebên şê'ir û nezmê tên. Em ê li ser wê babeta ku şê'irê û nezmê ji hevdu cuda dikin û jê ra cuwankarîyên toreyî, û bela'xet û rêtorîka tên gotinê rawestî.



Derwaze

Peyva şê'ir peyveke 'Erebî ye ku tê bi wateya zanîn û hest-pêkirinê.

Di Kurdî da gelek peyv yên wekî: helbest, hûnrawe, ho-zan ji bo şê'irê hatine terîşandinê, lê hîçyek ji wan peyvana bi serê xwe nikare wateya peyva şê'irê bigehîne. Di peyva şê'irê da şê'irîyet wate si'ûr, hest û soz yanê hestyarî û agadarî heye, ke ev wateyana di peyvên ku di Kurdî da jê ra hatine terîşandinê tune.

Şê'ir di wateya xwe da gotin yan nivîsînek e ku rêk û pêk e, xudanê wateyekê ye, bi kêş û rîtm e û xeyalafirîn e û wêneyên xeyalî tê da serdest in û bi cuwankariyên toreyî yên gotarî û wateyî hatine tewizandinê. Şa'ir bi rêka şê'irê bîr û hizr û hest û peyamên xwe radigehîne.

Mamostayê yekem zanayê bi nav û bangê Yûnanî Erestû/ Erestatalîs (348- 322 p.z.), li bara şê'irê da gotîye ku "şê'ir gotin yan nivîsînek e ku karî li hesta bihîster yan xwênerî bike û bilivîne." Yanê bihîster yan xwêner bi bihîstin yan xwandina wê şad yan xemgîn yan jî zendegirtî be. Bi gotineke dî şê'ir debê hestbizvîn be.

365

Nezm helbest yan hûnraweyek e ku cuwankariyên toreyî û rêtorîka yan tê da tune ye, yan jî eger hebe pirr kê m in.

Bi gotineke dî nezm nivîsîn yan gotineke ku rêk û pêk e û xudanê kêş û serwayê ye, lê hestbizvîn nîne û hest û xeyal û wêne tê da tune ye û yan jî pirr kê m e.

Bi kurtî tiştên ku nezmê û şê'irê ji hevdu cuda diken, xeyal û hest û cuwankariyên toreyî û mûsîqa ne.

Melayê cizîrî jî zor zananyane di çend cîyan da ji helbestên xwe yên nezm ra nezm û ji yên dî ra jî şê'ir, sê'hra 'helal, sê'hra gotinê û ê'cazê beyan gotîye.



Nimûne:

“Sed Çîn di xwe da girtîye zulfa te bi çîn
Şê’ra me di ‘heq lew çû heta Maçînê
Ev renga fesa’het ji beşer sê’hrê ‘helal
Ê’cazê beyan anîye ber tedwînê
Şê’ra te Mela sê’hrê şekerrîz e bi mu’ciz
Zanim ji lebe Le’l te ev lefz û eda girt
Di ê’caza beyanê da su xen ger bête insafê
Dizanit muxteser her kes Melê sê’hre ‘ibaret kir
Yareb çi turfe meywe ev renga mey dibexşît
Şê’ra me tê perîşan, nezma me tê muşewweş”

Lê Mela ji helbestên xwe yên ku ne şê’ir in ra bixwe nezm
gotîye:

Bo nimûne Mela di dawîya qesîdeya xwe ya;

“Ellah se’hergaha Ezel,
Zatî tecellaya xwe da
Nûra cemala lemyezel
Yelmûmê ‘eşqê şu’le da”

Dibêje:

“E’hsen ji vê Nezmê Mela
Eşkal û ewsafên cela
Lew dil bi wan bû mubtela
Cezbe û celale d’ sîne da”

Gava ku em bi hûrgilî li dîwana Melayê Cizîrî dinihêrrin,
em dibînin ku helbestên Mela ji bil çend liban ku Mela bixwe jî
ji wan ra nezm dibêje, xudanê şê’rîyeteke bilind û sê’hrawî ne.
Mîrov bi dîlnîyayî diakre bêje ku Mela bi şêweyeke hostayane
pişka zor a celebên cuwankarîyên toreyî di helbestên xwe da bi
kar birîye. Lê receya teşbîh, isti’are, mecaz, îmaj, teşxîs telmî’h
û terkîb/hevbendên izafî û wesfî di dîwana Mela da zortir bera
mîrovî li ser xwe da radikêşin.

Terkîbên wesfî û izafeyên teşbîhî mijarek e ku hem dikeve
nav pişka cuwankarî û cuwanînasîyê û hem jî mijareke rêzimanî
ye. ‘Kêm kesî ta niha li ser vê mijarê kar kirîye. Di rêzimana Kurdî
da navê ravekê ji hevbend/terkîbên izafî ra danîne, lê li ser cur û
celebên hevbendan kar nehatîye kirinê.



Di vê gotarê da emê pêş da çend nimûneyan ji cuwankariyên toreyî di dîwana Mela da bihînin û li dû ra li ser terkîban rawestin.

1. Poêtîka û Rêtorîka

Bela'xet zanista cuwankarî û cuwanînasîyê û rêka ragehandin û gotin û nivîsîn û rewnabêjî û xoşaxêvîyê ye. Bela'xet yan rêtorîka yek ji şengistên şê'irê ye ku dibe hegera cudakirin û veqenadina şê'irê ji nezmê û pexşanê. Bela'xet bixwe li ser sê şaxên: Me'anî, Beyan û Bedî'ê tête parvekirinê.

Me'anî zortir li ser şêwaz û çawanîya bi kar birina peyvan di hevok yan di malikên helbestê da radiweste.

Beyan jî karbirda peyvê ye di axiftin û nivîsînê da û ragehandina wateya peyvê bi şêweyên curr be curr e.

Bedî' xemilandin û tewizandina peyvê ye di cuwankarî û rewanbêjîyê di helbest û nezm û pexşanê da. Bedî' tewaşa toreyê ye. Tewaş jî debê dûr ji ifrat û tefrîtê be.

367

Zanista Bedî'ê dibe du paran: Bedî'a LEFZÎ /GOTARÎ û Bedî'a ME'NEWÎ /WATEYÎ. Ji Bedî'ê ra araiş jî hatîye gotinê. Lewra ku bi arîkarîya bedî'ê gotar yan nivîsar tête tewizandin û araişkirinê.

1.1. Arayişên Lefzî/ Gotarî

Huner/senetên ku di nivîs û axiftinê da cuwanîya lefzî diafirîne jê ra arayeyên lefzî dibêjin: yên wekî secî', cinas, tekrar, muwazene, tersî', tesdîr, qelb û yên dî, ku peyvên hevkeş û hevcins û hevdeng û hevtîp in. Di vê pişkê da curr û celeb û deng û rengên peyvan ji wateyên wan giringtir in. Çunkû ev deng û rengana mûsîqayeke hundurrânî didene gotar yan nivîsarê û dibin hegera ahengînbûna wan.

Herwisan afirandina mûsîqayê bi sazkirina serwayên hundurrânî jî pêk tê.



Em dibînin ku ev hunerên lefzî di pişka zor ji helbestên Melayî da hene, lê serwayên navxweyî û hundurrânî yek ji balkêştirîn pişkên araişên lefzî ne di dîwana Mela da. Di hindek ji helbestên Mela da her beyt yan malikek ji çar serwayan pêk tên û di hindekan da jî di yek nîvmalikê da çend serwa li dû hevdu ra rêz dibin û dibin hegera afirandina mûsîqyeke wisan ku bi-hîster dikare li ber wan semayê biket. Bo nimûne ev qesîdeya:

“Min dî se’her, şahê mecer, lebsî di ber, mexmûr bû
Ew dêmzerî, surr muşterî, ya reb perî ya ‘hûr bû
‘Hûrîweş e, şîrînmeş e, kakul reş e, xal ‘hebeş e
Xalên di qer, miska teter, nazikbeşer, kafûr bû
Ê’hram me best, eswed be qest, yar hate mest, ez çûme

dest

Cohtên ‘hebeş, tîr dan bi weş, ‘heca me xweş mebrûr bû”

Yan di qesîdeyeke dinê da bi rêzkirina serwayên hundurrânî weha mûsîqayê diafirîne:

“Yara me purr, nîşan û surr, sîma ji durr dêm kewkeb e
Ew lebşeker, nazikbeşer, cebhet se’her, kakul şeb e
Şeb kakul e, xal fulful e, çîn sunbul e, dava dil e
Mi j’ ‘xefletê, dî qibletê, wek mah di têysa ‘xeb’xeb e
Xal û xetê, şoxqametê, me j’ vê ketêb û destxetê
Herdem ji new, dil feyz e ew, ew ‘eşq û sew da mezheb e
Bergên gulê, ew miske lê, hûrhûr we lê, der’heq Melê
Bê perde û xoşme’de û yek we’de û pirr şefqe be”

368

2.1. Wacarayî/ Mûsîqayz tîpan

Ji bilî tersî’ û tecnîs û serwayên hundurrânî, anîn û çendbarekirina deng yan dengdêrekê jî mûsîqayeke taybetî didete şê’irê û dibe hegera cuwanîya wê û kartêkirinê li ser hestên bi-hîster yan xwînerî çê dike, ku ji wê hindê ra wacarayî, yan araişî kîteyan yan mûsîqa û ne’xmeya tîpan dibêjin. Em di dîwana Mela da rastî wacarayî yan hevahengîya tîpan jî tên ku bi şêweyeke hostayane û balkêş hatine araişkirinê.

Nimûne:

“Meşşateyê ‘husna ezel, çengalê zulfan tab da
Da ‘eşq hil bit pêl bi pêl qelbê me pê cellab da”



Di vê malikê da dengdêra "E" neh caran, dengdêra "A" neh caran û dengê "L " jî neh caran, neh û neh û neh dubare bûne û evê dubarekirinê mûsîqayeke taybetî daye şê'irê.

3.1. Arayîşên Me'newî/ Wateyî

Arayeyên ku cuwanîya wateyî di nivîs û axiftinê da diafirainin, ji wan ra jî arayeyên me'newî dibêjin, yên wekî teşbîh, isti'are, mubali'xe, mecaz, kinaye û yên din. Ev xemlînerên toreyî, ne bi deng û reng lê bi wateyê giringîyê didine gotar û nivîsarê. Di arayîşa me'newî da peywenda peyvan ya wateyî ye ku bera bihîster yan xwênerî li ser xwe da radikêşe û xwêner yan bihîsteran wadarî hizirîn û ramanê diket.

Pisporên qada cuwankarîyê bi dehan curr û celeb û nav û nasnav ji bo her yek ji van babetana çêkirine, ku înana navê wana bixwe dibe pirtûkeke serbixwe.

Em ê çend nimûneyan ji van cuwankarîyana ji dîwana Melayî destnîşan bikeyên:

369

Nimûne:

"Meşşateyê 'husna ezel,
çengalê zulfan tab da
Da 'eşq hil bit pêl bi pêl
qelbê me pê cellab da
Min dî se'her zulfên di mest,
hatim sema ê'hram best
Çûn secdeya xalê bi qest,
lew 'haciban mê'hrab da
Wan dest û zend û sa'idan,
mey dane şêx û zahidan
Mestî bi çeşmê şahidan,
ew nêrgiza sîrab da"

Di van sê malikana da ji bilî ne'xmeya dangan ku me li jorê dabaşa wê kir, çend caran isti'are û teşbîh, û bi wan ra jî tenasub, teşxîs, û telmî'h hatine.

Meşateyê 'husna ezel: isti'are ye ji kirdegarî ra. Çengalê zulfan: izafeya isti'arî ye, zulf bi çengalê asinîn yên di dikana goşt-



III. ULUSLARARASI MELAYÊ CÎZÎRÎ SEMPOZYUMU

firoşî da ku goştîroş cendekên ajelên serjêkirî pê va dadileqîne hatîye vekandinê. Mela dibêje xemlînerê roja ezelê serê zulfên dildarê wekî çengalan ba da, da ku dildar dilê me bi wan çengalana va daliqîne û dil her dem wabesteyî dildarê bibe. Teşbîh yan wekandîneke veşartî jî di vê malikê da heye, ew jî ew e ku Mela dilê xwe wekandîye cendekê ajelan ku goştîroş bi çengalî va dadiliqîne û mebestek veşartî ya dî jî di vê malikê da heye ku Mela dibêje dildara xwe te bi çengala zulfên xwe dilê min nêçîr kir û ew bi wan çengalanava daliqand û helwastî hîşt.

Eger em terkîba pêl bi pêlê ji bilî wateya wê ya rûvayî yanê hindik hindik û dem bi dem û gav bi gav û 'kêlî bi 'kêlî bi wateya pêlên deryayê şirove bikeyn, em ê bibînin ku dîsan mela evîn wekandîye deryayekê ku dem be dem û 'kêlî bi 'kêlî pêl li ser pêlan ra davêje û dilî ber bi çengala zulfan radikêşe.

Li dû ra Mela zulfên dildara xwe ku sermestane li ser sîng û berên wê di newesanê da nin, diwekîne mest û serxweşan ku li ser sîngê dildarê semayê dîkin û weke hacîyan ê'hram girêdane û dixwazin herrin berê reş ku xala li ser tefeşa dildarê ye ramûsin û birûyan jî diwekîne mê'hraba nivêjê û dergevanan ku destûra nivêjê di mê'hraba du ebrûyan da dane Melayî.

370

Peyva 'hacib jî du wateyî yê diafirîne, hem birû ye û hem jî dergewane.

Li dû ra dibêje:

“Wan dest û zend û sa'idan,
mey dane şêx û zahidan”

Eva jî telmî'h e ji serbihorîya Şêxê Sen'anê ra ku ji destê dildara xwe ya Gurcî cama meya evînê helnoşî.

“Mestî bi çeşmê şahidan,
ew nêrgiza sîrab da”

Di vê nîvmalikê da layekî isti'are û layê dî da jî teraduf heye. Nergis yan nêrgiz di edebîyata klasîk da isti'are ye ji çavan ra. Mela di vê nîvmalikê da dibêje: ewê nêrgiza terr û têrav wate çavên xweşkok, xweşkokî û cuwanî dane çavên hemû dildaran.

Ev hemû hunerên bela'xetê tenê di sê malikên helbestê da cî bûne. Ev e mistek ji xirarê, 'kevçîyek ji girarê û gulek ji gulzarê



bû.

Em dibînin ku hunerên cuwankarîyê ne, ku layekî da mûsîqayê diafirînin û layê dî da jî hesta xwêner dibizivînin û bi afirandina wêneyên xeyalî canî didene poêtîkayê û ewê ji nezmê û pexşanê cuda diken.

Mela di 'xezeleke xwe da dibêje:

"Nêrgizên şeng di mest in çep û rast
Saqîyan cam di dest in çep û rast"

Di vê malika helbestê da Mela herdû çevên dildara xwe diwekîne du nêrgizn şeng û mest û xumar û cam di dest û meygêrr ku şerraba evînê raberî Melayî diken.

Çawa me di bendên pêşîn da jî gotin, di toreya klasîk da mebest ji nêrgizan çav in û yek ji taybetmendîyên çavan mestî û xumarî ye. Mela di vê malikê da çendîn sifetan didete pal çavan. Mestî, xumarî û hej û livên çep û rast. Pêş da çavan diwekîne nêrgizan û li dû ra di mestî û xumarîyê da wana diwekîne camên meyê û meygêrrê.

371

Lê Mamostayê gorrbihîşt Mela Ehmedê Zivingî ev helbesta bi şaşî şirove kirîye û dinivîse ku nêrgiz bejna dildarê ye. Mixabin şirovekarên dîwana Melayî yên li dû Zivingî ra jî her ew hizra Zivingî dubare kirine û li helbestê hûr nebûne û nefikirîne ku di vê malikê da Mela dibêje nêrgizên mest wate nîşaneya pir-rjimarîyê li pal nêrgizan êxistîye, ew çav in ku ji yekê zêdetir in, ne bejin. Bejin yeke tenê ye û xumar û mest nîne û cama wê jî tune ye, cam ya çavan e.

2. Terkîbên izafî û wesfî

Di dîwana Mela da em gelek caran rastî hevbendên izafî û wesfî tên, ku her yekê bi serê xwe cuwanîyeke taybetî dane şê'irên Melê.

Hevbendên wesfî ew in ku ji nav û rengdêrekê pêk tên û hevbendên izafî jî ji du navan û yan jî nav û cînavekî pêk tên. Pisporan hevbendên izafî li ser çend pişk û celebên wekî izafeyên teşbîhî, istî'arî, iqtiranî, beyanî, bunuwet û ixtisasî par ve kirine.



Em di dîwana Mela da rastî hemû cur û celebên hevbendan tîn ku bi hostatî hatine xebitandinê. Lê ji bo ku mijar dirêjdadirrîyê neke, em ê tenê çend nimûneyan ji hevbendên istî'arî ji dîwana Melayî biînin.

Mel dibêje:

“Îsmê te ye mektûb di dîwanê qidem da
‘Herfek qelemê ‘ilmê bi teqwîmê reqem da”

Qelemê ‘ilmê hevbendek istî'arî ye ku tê da ‘ilm ku navekî me’newî ye weke navekî zatî hatîye bi kar birinê û wekî kesekî ku xudanê qelemê ye hatîye nasandinê. Yanê kirasê navên razber li navên şênber hatine kirinê.

Nimûneyên dî:

“Bi narê furqetê sohtim, ji ferqê ser heta pê da
Xedenga ‘xefletê nohtim ji berqa lami’a tê da
Kesê mê’hnet dî û furqet, vexwarî cur’eya hicrê
Girîyê wan tê bi ‘halê min di vê hicran û zecrê da
Bi dama mu’hbetê bend im, xedenga furqetê dil noht
Bi şubhî mur’xê nîmbismil, di hev wertêm di xûnê da
Gelo dîsan bibînim ez çirayê wesletê hil bit
Bisojim şubhî perwanê li ber wê nûr û şewqê da”

Di van malikana da hevbendên narê furqet, xedenga ‘xefletê, xedenga furqetê, cur’eya hicrê, dama mu’hbetê û çirayê wesletê hevbendên istî'arî ne ku tê da furqet, ‘xeflet, hicret, mu’hbet û weslet peyvên me’newî ne ku weke peyvên zatî hatine xebitandinê û bûne xudanê kesayetîyên zatî. Ev curre hevbendana bixwe bi serê xwe wêneyên xeyalî diafirînin û dema ku mirov li wan hûr dibe, mirov xwe di cîhaneke neasayî û aşopî da hest dike. Weslet dibe çirayek ronîder, furqet dibe agirekî sotîner û dibe xudanê tîr û xedengan, hicran dibe gulpeke meya tal, mu’hebet û evîn davik û tellikan vedidin û dibin rav’kerê dilan.

Nimûneyek dî:

Serê zulfa te bi kullabê du’a
Hate destê me bi cellabê du’a
Ji du’ayê qede’hek der dest e
Her se’her mestê meyê nabê du’a
Gulê iqbal ji gulzarê qebûl
Me çinîbû di şekerxwabê du’a



Di van malikana da jî dîsa Mela can daye du'ayê û ew kirîye xudanê kulabê û wekandîye cameke meyê, herwisan gula iqbalê, gulzara qebûlê û şekerxwaba du'yê jî ji wan hevbendên hunerîn e ku Mela bi kar birîye. Dema ku mirov lê hûr dibe, mirov dikare ji xwe bipirse, du'a çawa dibe camek ji meyê, çawa dikare bibe xudanê kullabê yan bibe cellab. Yan bext û iqbal bûye gulekê û pejirandina dildarê ji Mela ra bûye gulzarekê.

Nimûneyek dî:

“Dil ji min bir dilberek zîba qeba
Çehvxezal û pirr şepal û mehliqa
Nazidar e ew li textê dilberî
Dilruba ye, canfeza ye, ru'h şefa”

Hevbenda textê dilberî jî hevbendeke balkêş e. Melayî dilber na, dilberî wekandîye textekî padişahîyê ku dilbera wî li ser wî textî rûniştîye û şahane dilberîyê dike.

Xanî jî ji vê hevbenda Melayî wec wergirtîye û helbesta xwe ya textê dilberî nivîsîye.

“Îro li textê dilberî,
ya reb çi şîrînesmer e!
Jê nabitin min dil berî,
ew dilber e, yan dil ber e?”

373

Lê gelek kesên ku dîwana Xanî şirove kirine, li cîhê hevbenda textê dilberî da nivîsîne textê dilberê ku çu wateyê nadet.

Em di dîwana Mela da gelek caran rastî van hevbendên hunerî dihên. Hevbendên wekî:

Destê qudretê- qulzuma 'eşqê- Xizrê 'inayetê- tîpên 'xezebê- leşkerê qehrê- mulkê dilberî- ateşê 'eşqê- şahîne qezayê- deftera hidayetê- şaxê 'umrî- deryaya qîdemê- rendeşê 'eşqê- derbendê 'husnê- gewhera me'rifetê- 'eynê besaretê- dergehê lutfê- destê qezayê- xirqeyê zerqê- jenga zuhdê-

Nimûne gelek in û înana wan hemûyan dê bibe hegera dirêjî û tetwîla kelmê.



Encam

Bi giştî çawa ku di edebîyata folklorî da deng û aheng û kêş û serwa û mûsîqa istiran û çîrokê jêk cuda dikin, wisan jî di edebîyata klasîk da kêş û serwa û aheng û mûsîqa û cuwankariyên toreyî edebîyata hûnrawe û pexşanê jêk cuda dikin û tiştên ku şê'irîyetê diafirînin cuwankariyên toreyî yên gotarî/dengî û wateyî ne. Di dîwana Melayê Cizîrî da em rastî hemû curr û celebên cuwankariyê toreyê yên gotarî/dengî û wateyî tên. 'Kêm malikek helbestê di dîwana Mela da heye ku currek jî cuwankariyên toreyî tê da tunebe. Lê teşbîh, isti'are, telmî'h û dengarayî û wêneyên xeyalî jî yên dî zêdetir in. Gelek caran Mela bi afirandina wêneyên xeyalî xwênerên xwe dibe cîhana hizr û xeyalên semawî. Gelek helbestên Mela wisan mişt in jî mûsîqayê ku semayê li mirovî bar dikin. Ji bilî cuwankariyê toreyî yên ku ta niha gelek kesan lêkolîn li ser kirine, hebûna hevbendên izafî yên teşbîhî û isti'arî di Dîwana Melayî da ne, ku ta niha kesî li ser wê pişkê kar nekirîye. Me di vê kurtegotarê da avirrek daye wan hevbendan û dergehê lêkolîna li ser wan hevbendan vekirîye.

Jêder

Edebî sanatlar, Numan Külekçi, Akçağ yayınları, Ankara 2013

Edebî sanatlar Ansiklopedisi, Vadat Ali Tok, Konya 2011

بیان و معانی، دکتر سیروس شمیس، نشر میترا، تهران: ۹۳۱.

ریطوریکا، فن خطابه ارسطو، ترجمه دکتر پرخیده ی ملکی، نشر اقبال، ۱۷۳۱ تهران
صور خیال در شعر فارسی، دکتر محمدرضا شفیعی کدکنی، انتشارات آگاه ۵۷۳۱ تهران
موسیقی شعر، محمد رضا شفیعی کدکنی چاپ دوم ۸۶۳۱ تهران
هنر شاعری، بوطیقا، ترجمه و مقدمه و حواشی از فتح الله مجتبایی، بنگاه نشر اندیشه،
۷۳۳۱ تهران

فن شعر ارسطو، ترجمه دکتر عبدالحسین زرین کوب، بنگاه ترجمه و نشر کتاب، ۳۴۳۱ تهران
دیوانا مه لایئ جزیری، شهر حرا مامؤستا هه ژار، ئنتشاراتا سڕۆش ته هه ران ۱۶۳۱
دیوانا جگه رخوون، وه شانیئ ئافه ستا ئسته نبؤل ۳۰۰۲
لغتنامه دهخدا دیجیتال

بیان در شعر فارسی، دکتر بهروز ثروتیان، انتشارات برگ، چاپ اول، تهران، ۹۶۳۱
فنون بلاغت و صناعات ادبی، علامه جلال الدین همایی، نشر هما، ویرایش اول، چاپ
سی و یکم، شابک: ۶۰۱۷۱۶۴۶۹۸۷۹.

مقاله ارزیابی آرایه های حروفی در بدیع فارسی از دیدگاه زبان شناسی، آواشناسی و واج شناسی
حیدری، مرتضی



SEMPOZYUM RESİMLERİ

375













III. ULUSLARARASI MELAYÊ CİZÎRÎ SEMPOZYUMU







III. ULUSLARARASI MELAYÊ CİZÎRÎ SEMPOZYUMU



382







III. ULUSLARARASI MELAYÊ CİZÎRÎ SEMPOZYUMU







III. ULUSLARARASI MELAYÊ CİZÎRÎ SEMPOZYUMU















III. ULUSLARARASI MELAYÊ CİZÎRÎ SEMPOZYUMU



392





















